



K.T.

Zanîngeha Yuzuncu Yilê

Enstîtûya Zimanên Zindî

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Leyla KAPLAN

DI ÇÎROKÊN HÎZANÊ DA MOTÎFA DÊ

Teza Lîsansa Bilind

Şêwirmendê Tezê

Prof. Dr. Hasan ÇİÇEK

Wan – 2018

T.C.
Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Leyla KAPLAN



HİZAN MASALLARINDA ANNE MOTİFİ

Yüksek Lisans Tezi

Tez Danışmanı
Prof. Dr. Hasan ÇİÇEK

Van - 2018



T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Prof. Dr. Hasan ÇİÇEK danışmanlığında, Leyla KAPLAN tarafından hazırlanan “**Di Çirokên Hizanê da Motifa Dê**” adlı bu çalışma, 26/07/2018 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Prof. Dr. Hasan ÇİÇEK

İmza: 

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

İmza: 

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Ahmet BARDAK

İmza: 

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

Prof. Dr. Murat DEMİREL
Enstitü Müdürü


26/07/2018

BİLDİRİM
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Di Çîrokên Hîzanê da Motîfa Dê” adlı tezin tamamı kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim Öğretim yönetmenliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

Tezim sadece Yüzüncü Yıl Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

Tezimin yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

KURTE
TEZA LÎSANSÂ BILIND
DI ÇÎROKÊN HÎZANÊ DA MOTÎFA DÊ

LEYLA KAPLAN

Şêwirmend: Prof. Dr. Hasan ÇİÇEK

2018, 144 rûpel

Çîrok, di wêjeya gelêrî ya devkî da di nav cureyên herî belavbûyî da ye. Her çiqas ji ber ku hêmanên têda xeyalî û derasayî ne jî; ji ber ku ji civata ku jê derdiketina ra rola neynikê digirin, gelek girîng in. Lehengên çîrokan însan, ajal, hebûnên deresirûştî û hwd. in. Me ev xebat ji nav lehengên çîrokên dayîkan bijart û me hewl da ku em rola dayîkan di çîrokan da bînin zimên. Di nav lehengên girîng ên çîrokan da dayîk jî hene. Heta di gelek çîrokan da dayîk, zêdetir pêşçav xuya dikin û lehengên dayîkan di çîrokê da roleke gelek çalak dileyîzin. Wêjeya gelêrî ya Kurdan ji aliyê çîrokan ve gelek dewlemend e. Di nav vê erdnigariya ku têde çîrokên bêjimar hene, me mijara xwe tengtir kir û me tenê çîrokên ku tê da motîfa dayîkê heye, bijart. Me çîrokên xwe jî bi herêma Hîzanê ra da sinordarkirin. Di teza me ya “Di Çîrokên Hîzanê da Motîfa Dê” di nav çîrokên hatine berhevkerin da em li ser mijara dayîkê rawestiyên. Di teza me da pêşî di derheqê herêma xebatê da (Hîzan) agahî hatin dayîn û paşê di derheqê çîrokan da agahiyên hûrgilî hatin pêşkêşkirin. Her wiha me behsa tezên lîsansa bilind ên li ser çîrokên kurdî hatine kirin kir û mînakên pirtûkên çîrokan rêz kir. Peyre li gorî çîrokan dahûrandina motîfa dayîkê û dêmariyê hat kirin û çîrokên ku di tezê da hatine bikaranîn di bin sernava pêvek da hatin nivîsandin. Di nivîsandina vê tezê da armanca me ji aliyê çîrokan ve sekinandina li ser dewlemendiya çanda Kurdî ye. Her wiha me xwest ku em li ser cîh û taybetiya jin û dayîkên a di çanda Kurdî da bisekinin û jinan ku lehengên girîng ên çîrokan in bi wesfên wan ên dayîkbûnê binirxînin. Bi vî awayî di civak û wêjeyê da girîngiya jin û dayîkê bi alikariya çîrokan hat şîrovekirin.

Peyvên Sereke: Wêjeya Gelêrî, Çîrok, Jin, Dayik, Hîzan, Wêjeya Gelêrî ya Kurdan

ÖZET
YÜKSEK LİSANS TEZİ

HİZAN MASALLARINDA ANNE MOTİFİ

LEYLA KAPLAN

Tez Danışmanı: Prof. Dr. Hasan ÇİÇEK

2018, 144 sayfa

Masallar sözlü halk edebiyatı ürünleri arasındaki en yaygın türlerden biridir. Her ne kadar içinde bulunan unsurlar açısından hayali ve olağanüstü nitelikler taşıyalar da içinden çıktıkları topluma ayna görevi üstlendikleri için çok önemlidirler. Masal kahramanları insanlar, hayvanlar, tabiatüstü varlıklardır. Biz bu çalışmamızda masal kahramanları arasından anneyi seçtik ve annenin masalarda üstlendiği rolleri dile getirmeye çalıştık. Önemli masal kahramanlarından biri deannelerdir. Hatta birçok masalda anne karakteri daha çok ön plana çıkar ve anne karakteri masalda etkin bir rol oynar. Kürt halk edebiyatı masal yönünden çok zengindir. Sayısız masal örneklerinin olduğu bu coğrafyada bizler konumuzu biraz daraltarak içinde yalnızca anne motifi olan masaları seçtik. Bu masallarımızı da zengin bir halk edebiyatına sahip olan Hizan ilçesiyle sınırladık. “Hizan Masallarında Anne Motifi” başlıklı tezimizle derlemiş olduğumuz masal metinlerindeki anne motifini işledik. Tezde öncelikle çalışma alanı olan Hizan hakkında bilgiler verildikten sonra masal ile ilgili detaylı bilgiler sunulmuştur. Ayrıca Kürt edebiyatında masallar üzerine yapılmış yüksek lisans tezlerine değinilmiş ve Kürtçe masal kitapları örnekleri sıralanmıştır. Daha sonra anne motifi ile üvey anne motifinin masal metinlerimizdeki analizleri yapılmış ve kullanılan masal metinleri tezimizin ekler kısmında yerini almıştır. Bu tezi yazmaktaki amacımız Kürt kültürünün zenginliğini masal yönüyle ele almaktır. Ayrıca kadının/annenin Kürt kültüründeki yerine ve önemine değinerek masalların önemli kahramanlarından olan kadınları annelik vasıflarıyla incelemek istedik. Böylece kadının/annenin toplumda ve edebiyattaki yeri ve önemi masallar aracılığıyla irdelenmiştir.

Anahtar Kelimeler: Halk Edebiyatı, Masal, Kadın, Anne, Hizan, Kürt Halk Edebiyatı

ABSTRACT
MASTER'S THESIS

MOTHER MOTIVE IN THE TALES OF HIZAN

LEYLA KAPLAN

Supervisor: Professor Doctor Hasan ÇİÇEK

2018, 144 pages

Tales are one of the most common types of oral folk literature products. Although they carry fanciful and extraordinary qualities in terms of the elements contained therein, they are very important because they have the same function for the society they are leaving. Tale heroes are people, animals, and natural beings. In this work, we chose the mother among the heroes of the tale and tried to express the roles that the mother plays in the tales. One of the important tale heroes is the mother. Even in many tales the mother character is more prevalent and the mother plays an active role in the character story. Kurdish folk literature is very rich in terms of tale. In this geographical area where we have numerous examples of tales, we narrowed our position slightly and we selected only fairies with mother motifs. We have also limited these tales to the Hizan district, which has a rich folk literature. We worked on the mother motif in the tale texts that we compiled with the titled thesis "Mother Motif in tales of Hizan". In the thesis, we gave detailed information about tales after giving information about Hizan which is the primary study area. In addition, master theses on the titles in Kurdish literature were mentioned and examples of Kurdish tale books were listed. Then the analysis of mother motif and step mother motifs in our tale texts was done and took place in used tale texts in the appendices of our work. Our purpose in writing this thesis is to deal with the richness of Kurdish culture in the tale direction. In addition, by mentioning the place and importance of the woman / mother in Kurdish culture we also wanted to investigate with maternal qualifications women from the main heroes of the fables. Thus, we have examined the place and importance in society and literature of the woman/mother through tale.

Keywords: Folk Literature, Tale, Women, Mother, Hizan, Kurdish Folk Literature

PÊŞGOTIN

Di nav cureyên wêjeya gelêrî da çîrok, xwediyê cihekî taybet e. Bi saya çîrokan, gelan; hest, xeyal û hêviyên xwe anîne zimên. Çîrok bûne awêne ji civakan re û bi alikariya çîrokan em di derheqê milletên cuda da xwediyê agahiyan bûne. Çîrok ji aliyekî da hînkar in, ji aliyekî da şîretkar in, ji aliyekî dihêle ku mirov bihizire, ji aliyekî da zarokan dike hêmin, ji aliyekî da dibe sedema xweşwextderbaskirinê. Bi van taybetiyan em dizanin ku çîrok, piralî ne. Lehengên çîrokan gelek in: ajal, mirov, ajalên derasayî, pîrên mirovxwar, pîrhevok, cadû, dayik û hwd. Me ji nav van lehengan dayik bijart û em li ser taybetiyên dayikan ên di çîrokên Hîzanê da sekinîn. Me herêma çîrokê wek Hîzan da sînorkirin û çîrokên Hîzanê yên nehatine weşandin bûn materyalên me. Di nav çîrokên Hîzanê da yên ku di nav wan da motîfa dayikê hene hatin bijartin û ev mijar bû skeleta teza me.

Xebata me ji destpêk, sê beş, encam, çavkanî û pêvekê pêk tê.

Me di beşa destpêkê da di derheqê erdnigarî û jiyana Hîzanê da, di perwerdehî û medreseyên Hîzanê da agahî dan. Dîsa di heman beşê da em li ser berhevkirina çîrokan sekînin û me hin taybetiyên berhevkinê rave kir.

Di beşa yekem da materyal û metod hatin diyarkirin. Wek mijara tezê dayik li gorî taybetiyên xwe yên di çîrokan da hat şîrovekirin. Di vegotinên gelêrî da cih û girîngiya jin û dayikê hat diyarkirin.

Di beşa duyem da em li ser çîrokê sekinîn û bi awayekî gelemperî taybetî, binyat, cure, beş, motif, vebêj, lehengên çîrokê hatin dayîn. Tezên kurdî yên li ser çîrokan hatine kirin û hin pirtûkên kurdî yên ku ji çîrokan pêk tên hat nivîsandin.

Beşa sêyem beşa “Di Çîrokên Hîzanê da Motîfa Dê” ye. Di beşa sêyem da em li ser cih û girîngiya dayikê ya di vegotinên gelêrî, gotinên pêşiyar, çîrok û destanan da sekinîn. Paşê motîfa dê û dêmariyê li gorî çîrokên hatine berhevkin hat nirxandin.

Di encamê da li gorî bidestxistinên xebatê nirxandineke gelemperî hat kirin.

Wekî çavkanî pêşî nav û agahiyan çîrokbêjan hat dayîn; ji ber ku ew çavkaniyên devkî ne; paşê pirtûk, kovar û tezên ku di xebatê da me serî lêdaye hatin nivîsandin.

Çîrokên hatine berhevkirin jî di dawiya teze da hatin nivîsandin.

Ez dixwazim spasîyên xwe yê taybet pêşkêşî şewirmendê xwe birêz Hasan Çîçek bikim ku di vê xebatê da piştgiriya herî mezin wî da min. Ji ber pêşniyaz û şîrovêyên wan ên hêja, spasî birêz Nesim Sönmez û Ahmet Bardak dikim. Ji bo alikariyên wan ji M.Ragıp Kaplan û Akif Akto re jî spas dikim. Spasî ji Cûneyt Ewraş û Ronî Reşo re ku wan sererastkirina nivîsê da alîkariya min kirin. Wek dawî, diya min di berhevkirina çîrokan da her tim li ba min bû û zehmetiyên mezin kêşand, ji wê re jî spasdardar im.

Leyla KAPLAN

Wan - 2018



NAVEROK

KABUL VE ONAY	Hata! Yer işareti tanımlanmamış.
BİLDİRİM	iv
KURTE	i
ÖZET	ii
ABSTRACT	iii
PÊŞGOTIN.....	iv
NAVEROK	vi
KURTEBÊJE	x
DESTPÊK.....	1
DERHEQÊ HERÊMA LÊKOLÎNÊDAAGAHİYÊN GIŞTÎ	1
I. BINESAZIYA HÎZANÊ YA DERBARÊ ERDNIGARÎ, DÎROKÎ Û CIVAKÎ DA	1
2. Dîroka Hîzanê	1
3. Li HîzanêPerwerdehî û Medrese	2
II. XEBATÊN FOKLORÎK ÊN LI HÎZANÊ	2
III. BERHEVKIRINA ÇÎROKÊN HÎZANÊ	3
1. Vekolîna Weşanan	3
2. Xwegihandina Çîrokbêjan	3
3. Tomarkirina Çîrokan	4
4. Hin Taybetiyên Berhevkirinê.....	5
4.1. Zehmetiyên Ku Di Dema Berhevkirina Çîrokan Da Rû Dane	5
4.1.1. Di Berhevkariyê Da Meseleya Wextê	6
4.1.2. Di Berhevkariyê Da Meseleya Cihî	7
4.1.3. Di Berhevkariyê Da Meseleya Çîrokbêjan	7
BEŞA YEKEM.....	10
MATERYAL Û METOD.....	10
1.1. MATERYAL Û METOD.....	10
1.1.1. Materyal	10
1.1.2. Metod.....	10
1.1.2.1. Modela Lêkolînê	10
1.1.2.2. Koma Xebatê	11
1.1.2.3. Amûra Berhevkirina Daneyan	11
1.1.2.4. Derbasdarî û Bêbawerî	11
1.1.2.5. Analîza Daneyan	12
1.1.3. Di Çîrokên Hîzanê da Motîfa Dê	12
1.1.3.1. Dê	12
1.1.3.2. Dêmarî/Jinbav	12
1.1.4.Encam û Şîrove	13

BEŞA DUYEM	14
DERHEQÊ LÊKOLÎNA ÇÎROKAN DA HIN AGAHÎ	14
2. ÇÎROK	14
2.1. ÇÎROK ÇI NE?	14
2.1.1. Li Gorî Ferhengan Çîrok.....	14
2.1.2. Li Gorî Lêkolîneran Çîrok	15
2.1.3. Bi Gelemperî Taybetmendiye Çîrokan.....	17
2.1.3.1. Taybetmendiye Çîrokan yê Dirûvî	18
2.1.3.2. Taybetiyê Çîrokan yê Naverokî	18
2.1.4. Binyata/ Koka Çîrokan	20
2.1.4.1. Dibistana Mîtolojiyê	22
2.1.4.2. Dibistana Hindolojiyê	22
2.1.4.3. Dibistana Antropolojiyê.....	23
2.1.5. Cureyên Çîrokan/ Dabeşandina Çîrokan	24
2.1.6. Motîfên Di Çîrokan Da	28
2.1.7. Beşên Çîrokê	31
2.1.8. Vebêjên Çîrokê	32
2.1.9. Di Çîrokan Da Cih û Wext	34
2.1.10. Formelên Çîrokê	35
2.1.10.1. Formelên Destpêkê	36
2.1.10.2. Formelên Borînê	37
2.1.10.3. Formelên Ku Di Rewşên Wekhev da Tê Bikaranîn	37
2.1.10.4. Formelên Dawiyê.....	37
2.1.10.5. Hin Hêmanên Formelan	38
a. Hejmar	38
b. Reng.....	39
c. Cih û Wext	39
2.1.11. Lehengên Çîrokê	40
2.2. XEBATÊN KU LI SER ÇÎROKAN HATINE KIRIN	42
2.2.1. Xebatên ku li Ser Çîrokên Kurdî Hatine Kirin	42
2.2.1.1. Tez.....	42
a. Tezên Lîsansa Bilind	42
b. Tezên Doktorayê	43
2.2.2. Pirtûkên Çîrokan	43
BEŞA SÊYEM	44
DI ÇÎROKÊN HÎZANÊ DA MOTÎFA DÊ	44
3.1. Girîngiya Jînê/Dayikê	44
3.1.1. Di Vegotinên Gelêrî da Cih û Girîngiya Jînê/Dayikê	44
3.1.1.1. Di Gotinên Pêşyan da Jin/Dayik	44
3.1.1.2. Di Çîrokan da Jin/Dayik.....	48
3.1.1.3. Di Destanan da Jin/Dayik	49
3.1.2. Girîngiya Çîrokan	51
3.1.3. Motîfa Dê.....	54
3.1.3.1. Dê	54

3.1.3.1.1. Başbûn	54
3.1.3.1.2. Şîretkirin	55
3.1.3.1.3. Aqilmendî	58
3.1.3.1.5. Gunehbûn	59
3.1.3.1.6. Xirabbûn	60
3.1.3.2. Dêmari/Jinbav	61
3.1.3.2.1. Xirabbûn	61
3.1.3.2.2. Hesûdî	62
ENCAM.....	64
ÇAVKANIYÊN DEVKÎ/ÇÎROKBÊJ.....	66
ÇAVKANÎ	69
PÊVEK	74
Çîroka Çêleka Zerî	74
Çîroka Dara Leyl û Reqqasê	76
Çîroka Dêmariyê	81
Çîroka Dir kê	82
Çîroka Edlê û Ebbas	84
Çîroka Ehmedê Beyrema	87
Çîroka Eyşê û Mamê Hirç	91
Çîroka Fatma Xanim û Lêvreş	94
Çîroka Herdemcanê	96
Çîroka Hespa Xweliyê	101
Çîroka Kalikê Têş	104
Çîroka Mîrza Miheme û Qîza Qarqarê Çînê	110
Çîroka Mîrza Miheme û Şêx Sînem	114
Çîroka Nîsko	117
Çîroka Şengê Pengê Alîçengê	120
Çîroka Şengê û Pengê	123
Çîroka Zengilo Mengilo	125
Çîroka Xelîl Beg û Tîlî Eyşan	126
Çîroka Marê	132
Çîroka Mîrza Miheme	134
Çîroka Senem Xanim û Hiseyn	141



KURTEBÊJE

C. :Cîld

H.b :Heman berhem

Hwd. :Her wekî din

J. :Jimare

K.T. :Komara Tirkiyeyê

R. :Rûpel

TDK :Türk Dil Kurumu

Vgz. :Veguhêzer

Weş. :Weşanxane

DESTPÊK

DERHEQÊ HERÊMA LÊKOLÎNÊDA AGAHİYÊN GIŞTÎ

I. BINESAZIYA HÎZANÊ YA DERBARÊ ERDNIGARÎ, DÎROKÎ Û CIVAKÎ DA

1. Erdnigariya Hîzanê

Herêma Hîzanê, herêmeke çiyayî ye û li başûrê Bedlîs û Gola Wanêye. Hejmara deşt û zozanan dema li cihên çiyayî ra tê muqayesekirin, gelek kêr in. Rûbera Hîzanê 917km² ye. Erdê navçeyê piranî çiyayî ye û ji xeynî çemên piçûk, çemên mezin û girîng tune ne. Avûhewayaya Hîzanê zahfî bejayî ye, lê hin cih hene ku avûhewayaya wan cuda ne. Bi saya avûhewayê li herêmê; zebze û fêkiyên cuda çêdibin. Ji ber ku navçe li ser rêyên borînê nîn e û erdên wê jî çiyayî ne, navçe zêde pêş neketiye. Ji aliyê xweza û hêşnahiyê ve cihekî zaf dewlemend e. Gelek gund û gundikên wê hene.

2. Dîroka Hîzanê

Di derheqê wateya navê Hîzanê da û di mijara gelo ev nav ji kû ve hatiye da gelek rîwayet hene. Li gorî rîwayetekî peyva “Hîzan”ê ji “Seherxizan” a Farisî tê û wateya wê “ew kesên ku serê sibê radibin” e. Ev peyv wek “Hîzan” hatiye bikaranîn û herêm wek “cihê kesên zû radibin” di dîrokê da cih girtiye. Dîroknasê navdar Şerefxan, di berhema xwe ya *Şerefnameyê* da (1597) di derheqê vî navî da wiha gotiye: “*Di herêmê da, gelên welatê di şev û siharan da radibin, îbadet dikin, ji gunehan perwa dikin; di ewlemendî, olperwerî û girêdayîbûna dînê da navdar bûne.*”¹. Zana, şareza, pişpor û rewşenbîrên ku ji Hîzanê derketine, gotinên Şerfxan piştrast dikin. Dema cihê ku jê ra digotin Hîzan guherî û ew nav bû navê cihê îro, ew çax ji Hîzana kevin ra gotin “*Nefs-î Hîzan*”.²

Hîzan, di serî da maye di bin serdestiya Hîtî, Asûrî û Urartûyan da; paşê bi rêz ve maye di bin serdestiya Pers, Makedonya, Part, Roma û Bîzansê da. Hîzan û derûdora wê, piştî sedsala 7. çar sedsal di bin serdestiya Abbasî û Emeviyan da maye. Paşê ketiye bin serdestiya Selçûqî û Osmanîyan da.

¹ Şerefxan, *Şerefname*, wer. M. Emîn Bozarslan, Diyarbakır, 2006, r.161

² Hasan Çiçek: “Hizan’ın Kültürel Zenginliğinin Tarihsel Arka Planı”, *I. Uluslar arası Düünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu Bildirileri Kitabı*, Weş. Beyan, İstanbul, 2007, r. 72-659

Hîzan di 1919'an da bûye navçe û girêdayê bajarê Bedlîsê bûye. Di 1929'an da bûye qeza, 1936'an da girêdayê Mûşê bûye û paşê dîsa bûye navçe û girêdayê Bedlîsê bûye.³

3. Li Hîzanê Perwerdehî û Medrese

Bajarêqedîm Hîzan, bi taybetî di wexta Osmanîyan da ango ji sedsala 16. heta serî sedsala 20'an navenda çand û perwerdehiyê bûye. Di van sedsalan da Hîzana Kevin (Nefsî Hîzan, îro wek Xeyda derbas dibe) şehrê medreseyan e. Li vir Medreseya Ûsivê Welî, Medreseya Mîr Dawud, Medreseya Atîk, Medreseya Meydanê, Medreseya Şahzade, Medreseya Sixalê; ji xeynî van Medreseya Taxê ku di dawiya sedsala 18'an da saz bûye, gelek pîspor û rewşenbîr, tevî ilm û ronakbîrêncîhanê kir. Di medreyên Tax, Meydan û yê din da kesên bijare mezin bûne. Di wextê xwe da di mijara perwerdehiyê da medrese xwediyê roleke mezin bûn.⁴ Medreyên Hîzanê yê sereke: Medreseya Mîr Dawud, Medreseya Simban, Medreseya Ûsivê Welî, Medreseya Atîk, Medreseya Şahzade, Medreseya Sixalê, Medreseya Meydanê, Medreseya Taxê.

Hîzan ji aliyê aliman ve herêmeke zahf dewlemend e. Hin alimên ku di medreyên Hîzanê da mezin bûne, piştîsalan çûne bajarên din û perwerdeya xwe li cihên din dewam kirine. Lê hin alim jî hene ku xelkê Hîzanê nin in; lê ji ber ku li medreyên Hîzanê perwerde dîtine, bi Hîzanê ra wekhev bûne. Em dikarin hin alimên Hîzanê bi vî awayî rêz bikin: Feqiyê Teyran (1560-1632), Selîmiyê Hîzanî (sedsala 18.), Molla Xelîl (1754-1843), Mela Ebdillahê Hîzanî (?-1854), Sibxatullah Arvasî (?-1870), Abdurrahmanê Taxî (1831-1886), Fetullah Varkanîsî (?-1899), Muhammed Ziyauddîn (1855-1923), Bedîuzzeman Said Nursî (1878-1960)...

II. XEBATÊN FOKLORÎK ÊN LI HÎZANÊ

Hîzan, ji aliyê berhemên çanda devkî ve herêmeke zehf dewlemend e. Ji ber ku çanda niviskî dereng çêbûye, di mijara berhevkirina berhemên çanda devkî da mixabin xebat û lêkolînên têr û tijî nehatine kirin. Îro her çiqasî li ser herêmê xebat hatibin kirin jî dîsa ev xebat kêr û hindik in. Di gundên Hîzanê û navenda Hîzanê da gencîneyên çanda devkî pir hene, lê heger ev berhem neyên nivîsandin, dibe ku di rojên pêş da bèn

³ Hasan Çiçek, *Hizan: İlim ve Alim Havzası*, Müspet Hareket Sayısı, Sal:2016, J.1, r. 190

⁴ Hasan Çiçek: "Hizan'ın Kültürel Zenginliğinin Tarihsel Arka Planı", *I. Uluslar arası Düünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu Bildirileri Kitabı*, Weş. Beyan, İstanbul, 2007, r. 72-659

jibîrkirin û winda bibin. Li Hîzanê hin xebat û bername tên çêkirin, lê hejmara van xebatan gelek kêr in, divê zêdetir girîngî bidin vê mijarê. Ji aliyê kesên berpirsyar vedivê bername bên amadekirin ku alim û zanayên Hîzanê, folklorê Hîzanê neyên jibîrkirin.

III. BERHEVKIRINA ÇÎROKÊN HÎZANÊ

Di dewra nûjen a îroyîn da geşedanên teknolojîk robar zêde dibin û ev geşedanên hanê jî li ser xebatên çandî bandoreke xirab dike. Di nav berhemên folklorê da herî zêde çîrok ji van geşedanên zerar dibîne. Wextekî zarok li derdorê mezinên xwe kom dibûn ku dixwestin ji wan ra çîrok bînin gotin, lê ev rewş îro zaf kêr bûye. Di gund û cihên ku bandora teknolojîyê zêde tune da, kevneşopîya çîrokgotinê hêj didome. Lê di bajarên mezin da, ne zarokên çîrokhez hene ne jî mezinên çîrokbêj. Ev rewş jî girîngiya çîrokkomkirinê berbiçav dike. Di vê mijarê da kesên lêkolîner her tim hebûne û çîrok hatine komkirin û liser çîrokan xebat hatine kirin. Lêkolîner Saim Sakaoğlu li ser mijara komkirina çîrokan sekiniye û di bin sernava “Ji Berhevkarên Çîrokan ra Agahiyên Kurt” da ji berhevkarên ra şîretan kiriye.⁵ Her wiha Nail Tan di berhema xwe ya “Folklor (HalkBilimi) Genel Bilgiler” da piştî ravekirina metodên berhevkirinê mînakê ji bo çîrokan jî daye.⁶

Di wextê berhevkirina çîrokan da ev rê hatiye şopandin:

1. Vekolîna Weşanan

Berîya ku em ji bo çîrokkomkirinê derkevin herêmê, me berhemên di derheqê dîrok, erdnîgarî, çand û aboriya Hîzanê da hatine nivîsîn, xwend. Bi taybetî ji ber ku li ser çîrokên Hîzanê ti xebat nehatiye kirin me jî xebat, tez û pirtûkên ku li ser çîrokên herêmên din derçûne, xwend. Bi saya xebatên hatine kirin, me jî ji xwe ra rê û rêbazek diyar kir û em li gorî wê rê û rêbazê xebitîn.

2. Xwegihandina Çîrokbêjan

Hîzan ji aliyê gundan ve cihekî dewlemend e, lê çawa me di berî da jî gotibû cihekî çiyayî ye û bi taybetî di mehên zivistanê da çûnûhatina gundan gelekî zehmet e. Me çîrokên xwe pîranî di mehên zivistanê da kom kir, ji ber vê yekê di çûnûhatina gundan da, me gelek zehmetî kêşand.

⁵ Saim Sakaoğlu, *Masal Araştırmaları*, Weş. Akçağ, Ankara, 2010, r. 338-340

⁶ Nail Tan, *Folklor (HalkBilimi) Genel Bilgiler*, Weş. Ankara, İstanbul, 1997, r. 78

Bi alikariya kesên meriv û nasan, me çîrokbêjan nas kir. Beriya çûyina gundan ji hin kesan ra bi rêka bêtelê me xeber şand. Ji hin kesan ra jî bi alîkariya kesên nas, me xeber şand ku haja wan hebe ji çûyina me. Hemû çîrok piştî hevdîtîne ji çîrokbêjan hatine komkirin. Yek çîrok jî be, ji berhemekê an jî dereke din nehatiye sitendin.

3. Tomarkirina Çîrokan

Ew çîrokên ku me di vê xebatê da bi kar anîne, hemû ji aliyê tomarkerê ve hatine qeydkirin. Çîrokbêjan gelek efsane, stran, çîrok û hîkayetên gelêrî gotin, lê me çîrokan ji nav wan vebêjeyan veqetand û nivîsand. Di nav van çîrokên veqetandî da jî di hemû çîrokan da motîfa dayîkê tune bû. Lewma, me wan çîrokan jî bijart û tenê çîrokên ku tê da motîfa dayîkê hene, nivîsand. Di nav van çîrokan da hin varyantên heman çîrokê hebûn û di nav van varyantan da hin guherînên piçûk hebûn. Me xwest ku em van varyantan jî bi kar bînin û me heman çîrok bi guherînên piçûk ve dîsa nivîsand û di teza xwe da xemiland. Lê hin çîrok jî hebûn ku di nav varyantan da guherînên zahf piçûk hebûn; ew çax jî me varyanta herî xweş bijart û me bi wê varyantê nivîsand.

Beriya ku em çîrokan qeyd bikin, pêşî, me xwe da nasîn û me armanca xwe ya di berhevkirin û qeydkirina çîrokan da ji çîrokbêjan ra got. Me ji çîrokbêjan ra got ku em ê bi tomarkeran dengê wan qeyd bikin, me xwest ku em hînî bin, gelo ev rewş ji bo wan dibe pirsgirêk an na. Hin çîrokbêj ji vê rewşê aciz nebûn; lê hin çîrokbêj jî hebûn ku dema tomarkerê dîtin dest ji vegotina çîrokê berdan. Ji ber ku çîrok bi kurdî bûn û ji aliyê tomarkerê ve dihatin qeydkirin, gelek kes tirsîyan. Hin kes hebûn ku di mijara çîrokgotinê da navdar bûn, lê ew kes jî ji tirsî xwe gotin ku, em çîrokan nizanin û çîrokên ku me dizaniya ji bîra me çûne û filan û bêvan. Hin kes jî hebûn ku çîrokbêj nebûn, lê dîsa jî ji bo alîkariyê çî tîştên dizanîn ji me ra gotin. Em rastî gelek kesan jî hatin ku ji cihê çîrokgotinê ji me ra qala jiyana xwe ya berê kirin. Hin kesên ku wextekî çîrokbêjên navdar bûn ji me ra gotin ku: *“Êdî tu kes nayê li ba me ku em ji wan ra çîrokan bêjin. Kesên çîrokhez êdî nemane. Ew çîrokên ku me dizaniya va çend sal in me ji tu kesê ra negotiye û ji bîrame jî çûne.”* Gelek çîrokbêjan piştî çîrokgotinê xwestin ku çîroka gotine guhdar bikin û dengê xwe seh bikin.

4. Hin Taybetiyên Berhevkirinê

4.1. Zehmetiyên Ku Di Dema Berhevkirina Çîrokan Da Rû Dane

Zehmetiya yekem a ku di berhevkirina çîrokan da hate jiyîn salixdana çîrokbêjan û çûyîna gundê wan bû. Him dûrbûna gundan him jî çûnûhatina rêyên zehmet, di berhevkariyê da astengên sereke bûn ku hatine serê me. Ji piştî çûyîna hin gundên dût û rêyên zehmet zehf caran em bi awayekî destvala zivirîn. Çîrokbêjan, ji ber ku emrê wan zaf mezin bû, çîrokan ji bîr kiribûn, çîrokên ku wextekî dizanîn tevlihev dikirin.

Di berhevkirina çîrokan da zehmetiyeke din jî rewşa avûhewayê bû. Me çîrokan piranî di mehên zivistanê da kom kir. Ji ber ku ji berfê, rê hatibûn girtin, gihiştina gundan bi erebeyan ne pêkan bû û gund pir dût bûn. Ji piştî peyabûna erebê diviya ku em bimeşin û di rêyên dût da ev qet hêsan nebû. Çimkî rêyên gundan piranî, hevraz bûn. Ji her gundekî ra wesayît tune bû. Ew gundên ku servîsa wan hebû jî servîs, di rojekê da tenê yek car diçû navendê û êvarê dîsa vedigeriya. Ev rewş jî dide xuyakirin ku heger erebeya we ya şexsî tunebe, ji bo berhevkariyê çûyîna gundan gelek zehmet e. Ji ber ku me karê berhevkariyê di zivistanê da kir, gihiştina me ya ji hin çîrokbêjan ra mimkin nebû. Gundî, piranî jî kesên kal û pîr, bi gelemperî, di demsala zivistanê da diçin li ba xizmên xwe yên ku li bajaran dijîn û zivistana xwe li wir derbas dikin. Ji neçarî me nekarî em xwe bigihînin gelek kesên çîrokbêj, ji ber ku çûbûne bajarên dût.

Xwestina me ya çîrok guhdarkirin û qeydkirinê, li ecêba çîrokanan çû. *“Dê hûn li van çîrokan çî bikin, çîrokên kurdî dê ji bo çî kêrî we bê, heger wextekî bûya dê min sê şev û sê roj ji we ra çîrok bigotaya, lê aniha nayên bîra min, wextekî min bi qasî tûrikek çîrok dizaniya, lê min hemû ji bîr kir, çîrokên wextekî êca niha bûne qîmetdar...û hwd.”* Me van gotinan ji gelek kesan seh kir. Gazinda hin kesan jî bi vî awayî bû: *“Ji rûyê van televîzyonan êdî neviyên me jî nayên li ba me û ji me çîrokan naxwazin, va sî sal e em ji tu kesê/î ra çîrokan nabêjin, em ê çawa çîrokan ji bîr nekin?”* Çîrok, yek ji wan cureyan e ku ji geşedanên teknolojîk zererên mezin dibîne. Ji ber vê yekê bala zarokên li bajaran tiştên din dikêşin û ev rewş jî dibe sedema jibîrkirina çîrokan. Îro her çiqas hindik be jî heger em bikarin çend çîrokan kom bikin, ew ê saya hin gundiyan be ku hêj neketine li bin bandora geşedanên teknolojîk.

Dema em ji bo çîrokkomkirinê çûn gundan, hinek kesan gotin ku, *me wextekî çîrokan digot, lê me niha ji bîr kiriye*, ew çax me jî ji tomarkera xwe hin çîrokên

qeydkirî vekir ku ew jî seh bikin û dibe ku çîrokên wan ên wextekî bê bîra wan. Hin çîrokên ku çîrokbêjan digotin me di berî da qeyd kiribû, lê dîsa jî me çîroka wan nebiri û heta dawiyê qeyd kir. Bi vî awayî hin çîrokên ku ji bîra çîrokbêjan çûbûn hate bîra wan û çîrokbêjan wan çîrokan bi me ra parve kirin.

Rojekê em çûn li ba çîrokbêjekê navdar. Me daxwaza xwe ji çîrokbêjê ra got û me jê xwest ku alîkarî bide me û ji me ra çîrokan bêje. Lê ji ber ku çîrok bi kurdî bûn çîrokbêj tirsîya û hinek tişt kirin hecet: *“Ez nizanim çîrok filan, min hemû çîrokan ji bîr kirye, hûn pere jî bidin min ez nikarim çîrokan bêjim filan û bêvan.”* Lê li aliyê din, em çûn mala dapîrekê ku ji me ra çîrokan bêje. Dapîrê kir û nekir çîrokên di hişê wê da nehatin bîra wê, ji me ra hekayet, stran û gotinan got. Me jî nexwest ku em kêfa wê bişkînin û me hemû gotinên wê qeyd kir. Roja din, serê sibê jinik hate li gundê ku em li wir mabûn. Ji me ra got ku: *“Ez duh zaf xemgîn bûm ji ber ku min nekarî alîkarî bidin we. Heta sibê min melheze kir û du çîrok hat bîra min. Min xwest ku ji we ra bêjim dibe ku kêrî we bê.”* Hin çîrokzanên wiha jî derketin pêşîya me.

4.1.1. Di Berhevkarîyê Da Meseleya Wextê

Li gorî lêkolîneran ji bo berhevkirina çîrokan wexta herî pêkan demsala zivistanê ye. Bi taybetî li gundan, di şevên zivistanê da, li dora sobeyê ji bo gotin û guhdarkirina çîrokan cihê herî xweş e. Wextekî di gundên Hîzanê da çandin û çinîna tûtînê gelek belavbûyî bû. Çandina tûtine, berhevkirina wê, ji bo hişkbûnê aliqandina wê, piştî hişkbûnê baqkirina wê dibû sedema kombûna gundiyan. Baqkirina desteyêntûtînê, di demsala zivistanê da dibe. Jin, dema ku ji bo demetkirinê kom dibûn ji hev ra stran û çîrok digotin ku wext zû derbas be. Bi taybetî di van şevên dirêj da bi saetan çîrok digotin. Gelek çîrokbêjên me, ji me ra gotin ku çîrokên dizanin bi saya van kar û baran e.

Dîwan, cihekî din e ku li wir çîrok dihatin gotin. Di hemû gundan da maleke sereke hebû ku kesên biyanî dihatin ezimandin. Di van malan da ji xeynî mêvanan, gundî jî kom dibûn û di şevên zivistanê da kilam û çîrok dihatin gotin. Hin çîrokbêjan gotin ku çîrokan di van civatan da hîn bûne.

Li gundan di heyama bihar û havînê da gundî zêdetir di zevîyan da dixebitîn. Ew kesên ku ajalên wan hene jî sibê heta êvarê li serê çiyayan ajalên xwe didin çêrîn û

dema dibe êvar bêhal dikevin. Ji ber vê yekê li gundan ji bo çîrok gotin û guhdarkirinê heyama herî pêkan zivistan e.

Îro li gundan jî televîzyonan ji xwe ra di qunceki odayê da cîh veqetandiye û ev televîzyon bûne sedema jibîrkirina çanda çîrokgotinê.

4.1.2. Di Berhevkarîyê Da Meseleya Cihî

Di berhevkarîyê da cihên herî pêkan gund in. Ber ku li gundan, hejmara mal û kesan kême, bandora teknolojiyê hindik e û hevbandoriya mirovan zehf e. Navenda bajêran ji bo çîrokgotinê pêkan nîn in. Li vir bandora kêmbûna têkiliyên mirovan heye.

Çîrokbêjên jin, piranî cihên bêdeng û yên ku tu kes li wir tune dicibînin an jî dihilbijêrin. Hin çîrokbêjên jin hebûn ku li ba mêrê xwe fedî dikirin û çîrok nedigotin. Van çîrokbêjan, me birin odayên vala û li wir ji me ra çîrokan gotin. Lê ji bo mêran rewş bi temami cuda bû. Çîrokbêjên mêr dixwestin ku dema çîrokan bêjin, li derdora wan kesên din jî hebin.

4.1.3. Di Berhevkarîyê Da Meseleya Çîrokbêjan

Bi tewsiyeyên hin kesan em gihiştine çîrokbêjan. Me pêşî çîrokbêjên navdar tespît kir û paşê me bi wan ra têkilî danî. Van çîrokbêjan jî hin çîrokbêjên din tewsiye kirin û bivî awayî em gihiştine çîrokbêjan.

Ji bo gotina çîrokan, hunereke mezin divê. Hin çîrokbêj hebûn ku di warê çîrokgotinê da gelek serkeftî bûn. Lê hin kesên din jî hebûnku ew çîrokên wextekî dizanîn ji bîr kiribûn an jî dema çîrokvedigotin, çîrok tevlihev dikirin. Di çîrokên kurdî da hin beşên helbestkî jî hene û tenê çîrokbêjên serkeftî van beşan bi kar tînin û dikarin bêjin.

Dema me di derbarê çîrokbêjan da lêkolîn dikir, gelek kesan navê *Meqbûle Şimşek* da û em jî ji bo çîrokguhdarkirinê çûn li ba wê. Wê jî zaf xwest ku alikarî bide me, lê ti çîrok bi temami nehat bîra wê. Çîrokên ku ji me ra vedigot, hemû kême û nîvco bûn. Wê bi xwe ji me ra van gotinan got: *“Keça min, wextekî ew çîrokên ku min dizaniya ji xwe ti kesê nedizani. Min ji sedan zêdetir çîrok digot. Dema me tûtinê çêdikir her kes bi kelecani li benda min dima ku ez çîrokan bêjim. Va sî sal e ku tu kes nayê ba min û ji min daxwaziya çîrokan nake; zarokên min hemû mezin bûn û li derveyê bajêr*

dijîn. Ji xwe piştî televîzyonan qet çîrok nayên vegotin. Ji ber vê yekê min hemû çîrokên xwe ji bîr kir.” Em bi hêviyên mezin çûbûn li ba wê, lê mixabin em bi awayekî destvala ji ba wê zivirîn.

Çîrokbêjekî me yê din jî çîrokbêjê navdar Mamê Zeydîn bû. Mixabin em ji ba Mamê Zeydîn jî bi awayekî destvala zivirîn. Ji ber ku emrê wî gelek mezin bû zaf tişt ji bîr kiribû. Ew tiştên ku digot piranî hekayetên gelêrî bûn û vegotina wan ji saetekê zêdetir dewam dikir. Di hin çîrokên ku vedigot da jî peyv û beşên pişêw hebûn û ji ber vê yekê ew çîrok nehatin nivîsandin.

Dema me ji çîrokbêjan pirs dikir ku gelo çîrokan ji kê hîn bûne, piranî bersiv; dê û dapîr bû. Hin kesan jî çîrokan ji bapîrên xwe û ji mezinên gundê xwe hîn bibûn. Hin kesan jî gotin ku “*Nizanim, wextekî ji me ra vedigotin...*”

Çîrokbêjên me piranî jinên pîr û navser bûn. Lê herçiqasî kêmbin jî çîrokbêjên mêr jî hebûn. Çîrokbêjên herî piçûk Samet⁷ (9) û Yadîgar (20) bûn. Yadîgar, xwendekar bû û çîroka ku bi salan e ji dapîra xwe guhdar dikir ji ber kiribû û lib û lib ji me ra vegot. Çîroka wê 20 xulek dom kir û Yadîgar, bi awayekî serkeftî çîroka ku ji ber kiribû ji me ra vegot. Çîrokbêjê herî kal, bapîrê Evdila bû û wî jî ji me ra çîrokvegotin. Lê ji ber ku di çîrokên wî da motîfa dayîkê tunebû, me wan çîrokan di teza xwe da nenivîsand.

Dema me çîrokan bi tomarê qeyd dikir, berteka hin jinan bala me kêşand. Qeydkirina dengê wan ji aliyê hin jinan ve xweş nehat dîtîn, lê hin jinan jî xwestin ku dengê wan bê qeydkirin. Dema qeyd qediya, hin jinên çîrokbêj xwestin ku dengê xwe guhdar bikin. Hin çîrokbêjên jin gotin “*dê kê guhdariya dengê me bike, bila mêr dengê me seh nekin...*” Ji bo ku hin çîrokbêjên jin ji tomarê aciz nebin me tomarê da li cihekî dûr lê ew çax jî dengê çîrokbêjê baş nehat qeydkirin. Di rê da, jinika li kêleka min rûniştî ji bo çîrokan xwest ku alîkarî bide min lê jinikê şerm dikir; ji ber ku li piştê wê mêrê wê rûniştibû. Dema mêrê jinikê tomarkera di destê min da dît destûr neda ku jina wî çîrokê bêje. Min jî tomarê xef kir û jinikê bi awayekî bêdeng ji min ra

⁷ Samet xwendekarekî xwişka min bû û 9 salî bû. Çîrokekê ji bapîra xwe hînî bibû û xwest ku ji min re bêje. Lê çîrok baş nedihat bîra wî û di vegotina çîrokê da hin kêmasî hebûn. Ji bêr vê yekê me di teza xwe da çîroka ku Samet gotibû bi kar neanî.

çîrokekê got. Ji ber ku dengê wan dihat qeydkirin, gelek kesan pirsgirêkên wiha derxistin.

Dema çîrokbêjan ji bo çîrokgotinê cihên bêdeng dihilbijartin, çîrokên xwe sipehîtir vedigotin. Dema civat qelebalix bû, hin kesan gotinên çîrokbêjê dibiriya û çîrok dihatin qutkirin, dengê gelek kesan tevlihev dibû û ji ber vê yekê bi taybetî çîrokbêjên jin cihên bêdeng dixwestin ji bo vegotina çîrokan.



BEŞA YEKEM

MATERYAL Û METOD

1.1. MATERYAL Û METOD

1.1.1. Materyal

Navê çîrokên ku di vê tezê da hatine bikaranîn bi vî awayî ne:

- 1- Çîroka Çêleka Zerî
- 2- Çîroka Dara Leyl û Reqqasê
- 3- Çîroka Dêmariyê
- 4- Çîroka Dirê
- 5- Çîroka Edlê û Ebbas
- 6- Çîroka Ehmedê Beyrema
- 7- Çîroka Eysê û Mamê Hirç
- 8- Çîroka Fatma Xanim û Lêvres
- 9- Çîroka Herdemcanê
- 10- Çîroka Hespa Xweliyê
- 11- Çîroka Kalikê Têş
- 12- Çîroka Marê
- 13- Çîroka Mîrza Miheme û Qîza Qarqarê Çînê
- 14- Çîroka Mîrza Miheme û Şêx Sînem
- 15- Çîroka Mîrza Miheme
- 16- Çîroka Nîsko
- 17- Çîroka Senem Xanim û Hiseyn
- 18- Çîroka Şengê Pengê Aliçengê
- 19- Çîroka Şengê û Pengê
- 20- Çîroka Zengilo Mengilo
- 21- Çîroka Xelîl Beg û Tîlî Eysan

1.1.2. Metod

1.1.2.1. Modela Lêkolînê

Di lêkolînê da bi bikaranîna ji rêbazên lêkolîna wesfîn mînaka xwe gihandina hêsan (convenient sampling) wekî xebata rewşê ya lêkolînê hatiye plankirin. Xebata rewşê; rêbazeke wesfînî ye ku di nav hawirdoreke xwezayî ya wekî pol, tax, rêxistinê da

tê kirin û hedefa wê şîrovekirina tevayî ye. Xebata rewşê rêbazekê lêkolînê ya wisa ye ku di çarçoveya jiyana wê da li ser mijareke rojane disekine, di rewşên ku di nav bûyer û naveroka ku di nav da ye da cudahiyeke teqez nîne û ji yekî zêdetir delîl an jî çavkaniyên didaneyên heyî da tê bikaranîn.⁸

1.1.2.2. Koma Xebatê

Di xebatê da alternatîfa “mînaknîşandana bi armanc” hat bikaranîn. Di mînakdayîna wiha da lêkolîner di mijara ka dê kî bê hîlbijartin da biryara xwe bi kar tîne û yên li gor armanca lêkolînê hilde nav mînakdayîne⁹. Ji ber ku lêkolîn wekî xebata rewşê hatin teswîrkirin li ser komekê tene bi berfirehî lêkolîn hat kirin. Ev koma xebatê hemû kesên li Hîzanê û hawirdora wê yên ku agahiya wan a çîroka heye dihewîne. Bi tevahî bi 50 kesî ra hevdtin hat kirin. Lê bele ji ber ku di çîrokên da li motîfa “Dê” dihat geran jimara kesên ku çîrokên bi motîf qise kirin bi tevahî danzdeh e.

1.1.2.3. Amûra Berhevkirina Daneyan

Daneyên lêkolînê bi teknîka hevdtina ve sazkirina nivî hatine berhev kirin. Formên hevdtinê yên ku ji pirsên vekirî yên standart kirî pêktên û ji bo ku ji kesên li Hîzanê û der û dora wê ra bê pirsên tînan bikaranîn pêk tînan di çarçoveya nivîsên qadê û pirsên lêkolînê da hatin amadekirin û ji bo nêrîna pispor hat pêşkêşkirin. Pispor ji aliyê bergeh, ziman, guncaniya astê, fehbarî û vekirîbûna pirsan ve li ser van formen ku ji bo kesên beşdarî lêkolînê bûn bi awayekî paralel hatin amadekirin, lêkolîn kirin. Di çarçoveya nêrînên pisporan da di forman da ve rastkirinên hewce hatin kirin. Form li ser koma ku beşdarî lêkolînê bû û wêfî wan dişibin koma xebatê hatin ceribandin û piştî ku kêmasiyên derketin holê hatin temamkirin, şaşî hatin rastkirin û hat tetbîqkirin. Hemû hevdtin li malên beşdaran hatin kirin. Hevdtin bi destura beşdaran di cihaza qeydkirina dengên da hat qeydkirin.

1.1.2.4. Derbasdarî û Bêbawerî

Ji bo ku bêbaweriya forma hevdtinê bê pêkanîna serîlînêrîna pisporan hat dayîn. Ji *derbasdariyanavxweyî* ya lêkolînê bêpêkanîna di amadekirina amûrên berhevkirina daneyan da û berhevkirina daneyan da çarçoveya tînginîrêber hat qebûlkirin. Bûyer û daneyên ku vekirînin in û nayên fehmkirin hatin tespîtkirin û tevî encaman nehatin

⁸ Ali Yıldırım, Hasan Şimşek, *Sosyal Bilimlerde Nitel Araştırma Yöntemleri*, Weş. Seçkin, Ankara, 2004, r.201

⁹ Ali Balcı, *Sosyal Bilimlerde Araştırma*, Akademiya Pegem, Ankara, 2009, r. 98

kirin. Di lêkolînê da ji bo pêkanîna *bêbaweriya derverêbazên* lêkolîna belgeyan û hevdiîtinên ku hatin bikaranîn û merhaleyên van rêbazan bi awayekî eşkere hatin pênasekirin. Di xebatê da encamên ku hatin bidestxistin bi daneyên ku hatine bidestxistin ra hatin têkildarkirin û pêşkêşkirin.

1.1.2.5. Analîza Daneyan

Daneyên ku di dema hevdiîtinê da li cihaza dangan hatin qeydkirin pêşî hatin transkrîptekirin. Lêkolîneran li ser daneyên ku di transkrîptan da nivîsandine bi awayekî ji hev cuda analîza şayesî ya daneyan hat kirin û kodên tematik hatin avakirin. Digel mijara sereke ya ku ji daneyan hat tespîtkirin analîza naverokê hat kirin. Di rêbaza analîza naverokê da daneyên dişibin hev di çarçoveya têgeh û mijarên diyar da tînin bal hev û bi awayekî û xwendekar bikarin jê fehm bikin tînin rastkirin û şîrovekirin. Ji nêrînên ku beşdaran anî ziman jê giran hat kirin. Dema ku dane hatin berhevkerin û analîzkirin her beşdar bi navê çîroka ku qise kir hat kodkirin. Ev çîrokên ku nêzî bistî ne di tezê da bi serenava “pêvek” da hatin rêzkirin. Her wiha destura beşdaran jî hat sitandin û di xilasiya her çîrokê da agahiyên nispî yê nasnameyên wan hatin dayîn. Mijarên sereke û jêrîn di beşa encaman da wek serenav hatin pêşkêşkirin. Ev mijar li jêrê hatine rêzkirin:

1.1.3. Di Çîrokên Hîzanê da Motîfa Dê

1.1.3.1. Dê

Başbûn

Şîretkirin

Aqilmendî

Namûs

Gunehbûn

Xirabbûn

1.1.3.2. Dêmarî/Jinbav

Xirabbûn

Hesûdî

1.1.4. Encam û Şîrove

Ji bo kesên ku beşdarê lêkolînê bûn hevdiîta nivêverastkirî hat tetbîqkirin. Daneyên ku hatin bi dest xistin di çarçoveya kategoriyên cur bi cur da hatin verastkirin û analîza wan a şayesî û naverok hat kirin û hatin kurtkirin. Ji qiseyên beşdarên lêkolînê bi ser mijara “Dê” binmijarên wekî “Başbûn, Şîretkirin, Aqilmendî, Namûs, Gunehbûn, Xirabbûn” û bi ser mijara “*Dêmarî/Jinbav*” binmijarên wekî “Xirabbûn û Hesûdî” hatin çêkirin.



BEŞA DUYEM

DERHEQÊ LÊKOLÎNA ÇÎROKAN DA HIN AGAHÎ

2. ÇÎROK

2.1. ÇÎROK ÇI NE?

Ji bo çîrokên di Kurmancî da “metele, metelok, mesele, derew¹⁰, çîvanok, roman, efsane, serborî, hîkayet”; di Zazakî da “sunik, fistunik, mesela¹¹, sanike, estaneke¹², di Soranî da “çîrok” tê gotin. Ew kesên ku çîrokên dibêjin “çîrokbêj, çîrokvan, çîrvanokbêj” in.

Li Diyarbekir û derdora wê derê ji bo çîrokê peyva “xebrojik” an jî “xevrojik” tê bikaranîn; lê li Êlih, Mêrdîn, Sêrt, Şirnex, Colemêrg û herêma serhedê peyva “çîrok”ê zêdetir belav bûye.¹³

Di derheqê çîrokên da di serî da ferheng û gelek lêkolîneran pênasên cuda kirine. Ji van pênasan çend bi vî awayî ne:

2.1.1. Li Gorî Ferhengan Çîrok

Di ferhenga Farizovê da çîrok, wek “metelok, metele, mesele, çîrok, derew” hatiye nivîsîn.¹⁴ Li gorî Celadet Elî Bedirxan çîrok: “çîvanok, roman, efsane, serborî”¹⁵. Li gorî Ferhenga Îzolî: “1.Çîrok, çirçîrok, hîkaye”. “Bûyerên nerast. 2.Hîkaye, fantezî. Bi awayekî nivîskî weşandina bûyereke an jî xeberekê. 3. Bûyereke derbasbûyî, çêbûye an çênebûye, hatiye serê mirovan an di xwezayê da çêbûye an bi awayekî devkî heta îroyîn hatiye, çîrok, efsane. 4. Çîrokên ku ders diden an meseleyên exlaqê dibêjin, fabl.”¹⁶

Muallim Naci di berhema xwe ya **Lugat-î Naci da** li gor têgeha çîrokê di xala “mesel” de: “Dâsîfân, kîssa-i meşhûre. Çîrok ji vê muharref e.” bi vî awayî şîrove kiriye.¹⁷ Ferit Devellioğlu di ferhenga **Osmanlıca Türkçe Ansiklopedik Lûgatî da** çîrokê bi vî awayî rave dike: “Hikayetên ji exlaq û terbiyeyê ra kêrhatî, bi

¹⁰ I.O. Farizov, *Türkçe-Kürtçe Sözlük*, Weşanên Özge, Ankara, 1994, r.199

¹¹ Harun Turgut, *Türkçe-Zazaca Sözlük*, Weş. Do, Stenbol, 2008, r. 244

¹² Grûba Xebatê ya Vateyê, *Ferhengê Tirkî- Kirmanckî (Zazakî)*, Weş. Vateyî, Stenbol, 2001, r. 149

¹³ Kenan Bozkurt, *Kürt Masallarının Yapısal Özellikleri, Kimlik Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler Uhuslar arası Sempozyumu*, Weşanên Bingöl Üniversitesi, Bingöl, 2013, r. 819

¹⁴ I.O. Farizov, *Türkçe-Kürtçe Sözlük*, r.199

¹⁵ Celadet Alî Bedirxan, *Ferheng(Kurdî-Kurdî)*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2009, r.98

¹⁶ D.Îzolî, *FerhengKurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî*, Weşanên Deng, Amed, 2007, r. 133, 939

¹⁷ Muallim Naci, *Lugat-î Naci*, Weşanên Çağrı, İstanbul, 1995, r. 714

fêde.”¹⁸ DoğanKaya di **Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimler Sözlüğü** da: “Çîrok ji wan berhemên pexşanî ra tê gotin ku; bûyer di cîhaneke xeyalî da diqewimin, lehengên wan carina mirov, carina heywan û carina jî hin heyinên derasa ne, bi mebesta kêfanîn an jî perwerdekirina guhdaran tên gotin û rastiyan bi hin remz û sembolên derasa û bi rêya hin qaliban tînin ziman.”¹⁹

Di **Türk Dünyası Edebiyat Kavramları ve Terimleri Ansiklopedik Sözlüğü** dapênaseya çîrokê: “Çîrok, cureyeke vebêja devkî ye ku lehengên wê hin caran ajal in hin caran heyinên deresiruştî ne. Bûyer, di welatê çîrokan da diqewimin. Herçiqasî xeyalî bin jî kesên guhdar dikin jê bawer dikin.”²⁰ Bi vî awayî hatiye pênasekirin. Di **Türkçe Sözlük**ê da çîrok: “Cureyeke hikayetan e ku pîranî bûyerên derasayî yên zahfî tên serê mirovan û afirîneran dibêje. Afirînerên wê gel e û bi awayekî devkî di navbera nifşan da tên naqlîkirin.”²¹ Mustafa Uslu çîrokan wiha pênase dike: “Çîrok, cureyeke edebî ye ku pîranî ji aliyê gel ve hatine pêkanîn, xeyalî ne û di wêjeya devkî da dijîn. Bûyerên tene serê însên, heywan û cadû, cin, ejderha, periyar in.”²²

2.1.2. Li Gorî Lêkolîneran Çîrok

Ramazan Pertev: “ Çîrok, cureyek ji vegotinên gelêrî nin ku tê da cih didin serborî û lehengên derasayî û mijara wan xeyalî û bi devkî belavbûyî nin. Di Kurdiya Kurmancî da ji bo vê cureyê vegotinê, navên wekî çîrok, çîrvanok, çîrçîrok, kurteçîrok, xeberoşk, xemîşok, mesel, meselok, metelok, serborî, serpêhatî, hikaye û hwd. tene bikar anîn.”²³ Çiya Mazî: “Çîrçîrok: Bûyerên ku ji xeyalên gel derketine û ev bûyer di jiyana rastîn da nayên dîtin an bi temamî an jî hinekî ji jiyana rastîn dûr in. Gelek caran bi kesayetî û bûyerên nedîtî ra neqîşkirî ne. Bi Tirkî masal, bi ‘Erebî mesel tê gotin.”²⁴

Erman Artun: “Vegotinên bi qalibên eşkere ve hatine xemilandin û însên, ajal, nebat û hwd. her tişt dibe leheng û bi derasayîyan honandî ne. Çîrok, çawa girêdayî lehengên diyar bin bi vî awayî girêdayî lehengên nediyarin jî.”²⁵ Pertev Naili Boratav: “Taybetmendiya sereke ya çîrokê ew e ku; ew xwedî teknîkeke vegotinê ya pîr kurt û serî

¹⁸ Ferit Devellioğlu, *Osmanlıca Türkçe Ansiklopedik Lügati*, Ankara, 1993, r. 625

¹⁹ Doğan Kaya, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimler Sözlüğü*, Weşanên Akçağ, Ankara, 2010, r. 493

²⁰ *Türk Dünyası Edebiyat Kavramları ve Terimleri Ansiklopedik Sözlüğü*, Weş. Atatürk Kültür Merkezi Başkanlığı, cilt 4, Ankara, 2004, r. 295

²¹ *Türkçe Sözlük*, Weş. TDK, Ankara, 1988, r. 992

²² Mustafa Uslu, *Ansiklopedik Türk Dili ve Edebiyatı Terimler Sözlüğü*, Weş. Yağmur, İstanbul, 2007, r. 220

²³ Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok*, Weşanên Dozê, Stenbol, 2008, r. 87

²⁴ Çiya Mazi, *Baxek Ji Folklorê Kurdî*, Weşanên Berbang, Stenbol, 2014, r. 353

²⁵ Erman Artun, *Türk Halk Edebiyatına Giriş*, Weşanên Kitapevi, İstanbul, 2009, r. 34

ye. Di çîrokê da xaleke pir girîng jî ev e ku; her tim tê aşkerekirin ku bûyer di demeke borî da derbas bûne. Ji bilî van, taybetmendiyê girîng a çîrokan ku ew ji destanan vediqetîne ev e ku; çîrokbêj (û guhdar jî) dizane û dixwaze bibêje ku van hemî tiştên ku tên vegotin bi rastiyê ra li hev nakin, ango dûrî rastiyê ne. Di çîrokê da hêmanên fantastîk gelekî zêde ne û di cureyên din da bi vê mîqdarê nayên dîtin. Her wiha ji aliyê şeklî ve jî çîrok, xwedî vegotineke taybet e. Dîsa di destan û çîroka gelêrî da evîn, mijareke bingehîn e. Lê di çîrokê da li ser evîne ew çend nayê israrkirin.”²⁶

Şükrü Elçin: “Di nava berhemên anonîm ên wêjeya gel da, yên herî berbelav çîrok in. Di zimanên erebî û aramî da masal, mesel hatiye gotin jê re. Li gorî wesfîyetên serdest yên çîrokan, em dikarin wiha pênase bikin: Ew, hikayeyên bûyerên aydê heyîn an jî kesine nayên zanîn in ku, di dewrên ne diyar da derbas dibin. Sedema ku dewrên wan ne diyar in jî ev e ku, bi piranî çîrok bi qaliba, “hebû tunebû”, yan jî, “wextekî, di dewrên berê da, di zemanê berê de” dest pê dikin. Wekî ku em ji van qaliban jî têdigihên, dema çîrokan, demeke ne diyar e. Her wiha sedema ku, heyîn an jî mirovên nayê zanîn, tê gotin, ev e ku; di vê mijarê da vegotina çîrokî wiha ye: mirovek, keçikek, jinek, parsekek, padîşahêk, derwêşek, darek, dêwek û hwd. Wekî ku tê dîtin, kîbûna wî/wê kesê an jî wî/wê heyîne ne girîng e, lê nasnava ku ew teşîs dike girîng e. Çunkî çîrok, bi mebesta diyarkirina hin tiştan nayên gotin lê ew bi mebesta perwerdeyê û li dû armançêkê tên gotin. Ji ber vê yekê ye ku, kurt in, li ser detayan nayê sekinîn û gelekî bi fonksiyon in.”²⁷

Ali Berat Alptekin: “Çîrok, ji ber ku xeyalî ne û di binyata wan da çîvanok (formel) hene, ji cureyên vebêjê yên din bi awayekî hêsan tên cudakirin. Çîrok, ji aliyê kokê ve bi mîtolojî û jiyana rojane ra ji nêz ve têkildar in.”²⁸ Nakî Tezel di berhema xwe ya **Türk Masalları** da çîrokê bi vî awayî rave dike: “Çîrok, ew hikayet in ku cih û wextê bûyeran nediyar e û lehengên wek perî, dêw, cin, ejderha û kesên diyar temsîl nakin.”²⁹

Umay Türkeş Günay, çîrokan wek cureya herî balkêş a wêjeya devkî rave dike û di derheqê çîrokan da van gotinan dibêje: “Çîrok, zanista sedsalan a kombûyî û pergala jiyaneke diyar, tiştên ku em dijîn û yên ku em dixwazin bijîn bi hev ra, bi terz û

²⁶Pertev Naili Boratav, *Halk Hikayeleri ve Halk Hikayeciliği*, Weşanên Adam, İstanbul, 1989, r. 64-65

²⁷ Şükrü Elçin, *Halk Edebiyatına Giriş*, Weşanên Kültür ve Turizm Bakanlığı, Ankara, 1986, r. 368-370

²⁸ Ali Berat Alptekin, *Halk Bilimi Araştırmaları*, Weş. Akçağ, Ankara, 2015, r.118

²⁹ Naki Tezel, *Türk Masalları*, Weş. Bilge Kültür Sanat, İstanbul, 2009, r. 8

atmosfereke xweserî, xwe di nav sîlsîleya mantiqa xwe da li gel motîfên kevneşopî dibêjin.”³⁰

Saim Sakaoğlu piştî raveyên çîrokên yên di ferhengan da û yên ji aliyê lêkolîneran ve hatine kirin, di berhema xwe ya **Gümüştane ve Bayburt Masalları**da çîrokê bi vî awayî rave dike: “Çîrok, vebêjên devkî ne ku lehengên wê hin caran ajal in hin caran heyînên deresiruştî ne, bûyer di welatên xeyalan da derbas dibin û her çiqasî xeyalî bin jî dîsa guhdêran dide bawer kirin.”³¹

Tirkologê Macar İgnacz Kunos, çîrokên Tirkan cara yekem wek cîldan pexşan kiriye û di derheqê çîrokên da van gotinan gotiye: “Tîştta ku em jê ra dibêjin çîrok, awêneya zivirandî ya her milletê ye. Heger em bixwazin li wê awêneyê binêrin, em ê him ibadetên kesên berê him jî exlaqa dewrên berî bibînin.”³² Vladimir Propp ê zimanzan û folklorzan di berhema xwe ya **Folklor Teori ve Tarihi**dadibêje ku çîrok; ji rastiyan tînen xwedîkirin û dewam dike: “Di hemû çîrokên gel da hêmanên bi rastî ra tînkildar hene. Çîrokên gel, heqîqetên beriya dîrokê, kevneşopî û exlaqa çaxa navîn, tînkiliyên civakî yên feodalîzm û kapîtalîzmê didin der.”³³ Ahmet Kabaklı di berhema xwe ya **Türk Edebiyatı**da çîrokê wiha rave dike: “Çîroka ku cureya herî sîpehî ya semereya gelan a pexşanên devkî ye, hikayeta lehengên wisa ne ku ew leheng qîma xwe ji rastiyan jiyana bisînor û ziwa naynin û lehengan di jiyaneke rastederî da dijîne.”³⁴

2.1.3. Bi Gelemperî Taybetmendiyên Çîrokên

Çîrok, hêmanên herî girîng ên çanda devkî ne. Bêguman di jiyana rojane da gelek geşedan û guhertin, li ser çanda devkî xwedîbandor in û dibin sedema guherîna wan. Piştî geşedanên teknolojîk ên îroyîn da televîzyon û înternet tîketine hemû malan û ev rewş jî bûye sedema windabûna taybetiyên çîrokên. Em dikarin ku van cudahiyan di navbera kesên çavkanî yên bajarî û gundî dabi hêsanîbibînin; ji ber ku çîroka dibêjin heman çîrok e, lê di nav ev çîrokên tînen vegotin da cudayî pir in. Hin peyv û tîgehên jiyana bajarî ketine di nav çîrokên da û bûne sedema guherînan piçûk. Beriya ku em li ser van guherînan bisekinin, em dixwazin ku li ser taybetmendiyên çîrokên yên gelemperî bisekinin û dû re bi alîkariya çîrokên ku me li Hîzanê berhev kirine em ê hin cudahiyan îroyîn binivîsin.

³⁰ Umay Türkes Günay, Elazığ Masalları ve Propp Metodu, Weş. Akçağ, Ankara, 2011, r.665

³¹ Saim Sakaoğlu, Gümüştane ve Bayburt Masalları, Weş. Akçağ, Ankara, 2002, r.4

³² İgnacz Kunos, Türk Halk Edebiyatı, Weş. Akçağ, Ankara, 2001, r.112

³³ Vladimir Propp, Folklor Terori ve Tarih, Weş. Avesta, İstanbul, 1998, r.31

³⁴ Ahmet Kabaklı, Türk Edebiyatı I, Weş. Türk Edebiyatı Vakfı, İstanbul, 2008, r.111

2.1.3.1. Taybetmendiye Çîrokan ye Dirûvî

- a. Çîrok ji sê beşan pêk tên: Destpêka çîrokê yanî çîrçîrok, çîrok bixwe, dawiya çîrokê.
- b. Çîrok her çiqasî ne bi qasî destan û çîrokên gelerî dirêj bin jî dîsa jî metnên dirêj in. Hindik bin jî hin çîrok hene ku vebêja wan çend şevan didomin. Lê mînakên wiha piranî di “çîrokên esil ên gel” û “çîrokên periyar” da tên xuyakirin. Ji xeynî van cureyan “çîrokên heywanan” û “rêzeçîrok” kurttir in. Di nav van da hin çîrok hene ku vebêja wan di nav du sê xulekan da diqede.³⁵
- c. Çîrok, piranî forma pexşanan da ne. Hema hema hemû çîrok taybetiya xwe ya pexşanbûnê parastine. Lê her çiqasî hindik bin jî dîsa çîrokên ku tê da parçeyên helbestkî hene, henin.
- d. Vebêj, bi zimanê deverkî çîroka xwe dibêjin. Ji ber ku hemû çîrok bangî gelan dikin û bi zimanekî hêsan û fehmar tên vegotin.
- e. Di ser, navend û dawiya çîrokan da bi hêmanên qalib (formel) erk û şiklên diyarkirî hene. (Dema me behsa formelan kir em ê zêdetir li ser vê mijarê bisekinin.)
- f. Her çîrok wek tîp tê qebûlkin. Lê hin vebêj hene ku çend çîrokan, wekî yek çîrok vedibêjin. Li vir vebêj di navbera mijaran da pêwendî didane û çîrokek li gel çîrokeke din ve bi hêsanî girê dide. Li vir divê em rola jibîrkirinê jî paşçav nekin.³⁶
- g. Di nav metnên çîrokan da em dikarin rastî mînakên cureyên wêjeya gelêrî jî bîn; wek gotinên pêşyan, biwêj, dia, nifir/nifin, efsane, zêmar, dûrik... û hwd.

2.1.3.2. Taybetiyên Çîrokan ye Naverokî

- a. Çîrok bi derasayîyan ve tijî ne: dêw, keça perî, însanên ku ketine şiklê heywanan da, heywanên ku diaxivin, Sîmurga ku dikare li ser piştê xwe Mîrza Miheme hilgire, zarokên bi qasî nîskê, heft qat binê erdê, dinyaya tarî, asîman... û hwd.
- b. Em bi gelemperî dikarin bêjin ku hemû çîrokan da kesên baş tên xelatkin û kesên xirab tên sizakirin. Di dawiya çîrokan da lawê feqîr an bi keça herî sipehî an jî bi keça paşê ra dizewice an jî dewlemend dibe. Hemû malhebûnên paşeyên xirab di dawiya çîrokan da ji destê wan diçe, an jî di dawiya çîrokan da dêmariya xirab, jinbiraya xirab bi hespan ra tên girêdan û cezaya xwe dibînin.

³⁵ Saim Sakaoğlu-Zekeriyâ Karadavut, *Halk Masalları*, Weş. Anadolu Üniversitesi, 2011, r. 4

³⁶ H.b. r. 5

- c. Di çîrokan da wext “dema borî” ye. Çîrokbêj bi bikaranîna dema borî ra tîne bîra me ku him bûyer di paşerojê da qewimîne him jî rast nîn in.³⁷“Wext” di çîrokê da hêmana herî girîng e ku çîrokê ji hîkayet, mît, efsane û romanê cuda dike. Ji xeynî çîrokan di hemû cureyên din da “wext” aşkere û berbiçav e.³⁸
- d. Di hemû çîrokan da taybetiyên wek dersdan û perwerdekarî hene. Ev dabaş bi taybetî di “çîrokên heywanan” da xuya dike. Bo mînak, berxika ku guhdariya diya xwe nake dibe xurê guran.
- e. Çîrok, guhdaran teşwîqê qencîkirinê dikin. Çimkî di dawiya çîrokê da lehengên ku qenciyan dikin tîna xelatkirin û bextewar dibin.
- f. Di çîrokan da şopên jiyana civakî jî hene. Di çîrokan da şopên jiyana, çand û terza jiyîna vebêjêkê an zêde xuya dike. Bi taybetî di welidîn, xortbûn û zewaca lehenga çîrokê da, ji dab û nerîten herêmê tim û tim sûd jê tê wergirtin.³⁹
- g. Di çîrokan da piranî dia û nifrînên lehengê pêk tîna. Dema ku keçik dixwaze ji destê dêmariyê bifilite dia dike, diayê wê qebûl dibe û keçik vediguheze teyrekê û ji pacê difire, diçe.
- h. Leheng bi awayekî derasayî tîna tedawîkirin. Dema çavê paşê kor dibe dermanê wî ava di tasa li ber serê qîza qarqarê Çînê da ye. Dema wê tasê bi dest dixin çavê paşê jî vedibin.
- i. Alîkarên lehengan kesên xwedî taybetmendiyên derasayî ne. Ew hin caran hesp, se, dîk, pisîk/kitik hin caran jî jinên pîr in. Di çîroka Fatma û Lêvresê da, bi saya pîrê Fatma gurîfa taya xwe dibîne û bi saya dîkê dizanin ku Lêvres li ser mehfûrê ye û Fatma di binê tenûrê da ye.
- j. Hin lehengên çîrokê tîpên dawerî ne û taybetiyên karakterîstîk didin nîşan. Em dikarin ji wan çend liban bi vî awayî rêz bikin:

Mîrza Miheme: Aqil, zana, şans

Dêmarî/ Jinbav: Fesadî, hesûdî, xirabî, zilm

Pîra mirovxwar: Xirabî, hîle

Birayê piçûk: Aqil, rastbûn, şans

³⁷ H.b. r. 8

³⁸ Ali Fuat Bilkan, *Masal Estetiği*, Weş. Timaş, İstanbul, 2009, r. 74

³⁹ Esmâ Şimşek, *Yukarıçukurova Masallarında Motif ve Tıp Araştırması*, Weş. T.C Kültür Bakanlığı, Ankara, 2001, I.Cild, r.5

Zirbira: Hesûdî, xirabbûn

Zirxwişk: Hesûdî, xirabbûn

Pîrê: Alîkarî

Rûvî: Hîlebaz, fêlbaz

Bira: Hêz, qewet

Jinbira: Hesûdî, xirabbûn

Hirç: Ehmeqtî

- k. Mijarên çîrokan, cûr bi cûr in. Hin bi motîfên derasayî tên xemilandin hin xwediyê şopên jiyana rasteqîn in.
- l. Di çîrokan da ol dabaşeke girîng e. Dia, çûyîna mizgeftan, nimêjkirin tim û tim di çîrokan da derdikevin li pêşiya me. Di çîrokan da baweriya qederê serdest e.
- m. Welatên çîrokan ên diyarkirî hene: dinyaya tarî, dinyaya ronî, Çîn
- n. Di navbera serê çîrokê û dawiya çîrokê da mantiqeke taybet heye. Kesên xirab tên sizakirin û çîrok her tim bi “dawiya baş” diqedin.⁴⁰
- o. Her kes nikare çîrokan vebêje. Vebêjên çîrokan ên taybet hene û ji van ra “çîrokbêj”, “çîrokzan”, “çîrokvan”, “xeberoşkbêj”, “çîrçîrokbêj” tên gotin.

2.1.4. Binyata/ Koka Çîrokan

Çîrok li kû welidîne, çawa li cihên din belav bûne? Li ser van mijaran gelek lêkolîn hatine kirin, lê îro jî hêj negihiştine dawiyeye teqez. Di dawiya van lêkolînan da hatiye tespîtkirin ku heman çîrok, çand û herêmên zimanê yên cuda datêne vegotin. Li ser vê mijarê Teodor Benfey î rojhilatnas (oryantalîst) (1809-1881) sekiniye û bal kêşandiye li ser hevparî û dirûvtiyên di navbera çîrokên ku koka wan Sanskrît an jî Hînt in bi çîrokên Ewropayê û ya zêdetir girîng çîrokên ku gelên wan ne ji Ewropayê ne. T.Benfey, çarçoveyeke teorîk ya ku sedemên vê rewşê aşkere dike derxistiye holê. Li gorî Benfey, di binyata çîrokên milletên Ewropayî û ne Ewropayî da, wekî ku di berî da jî xwestibû bêje, gelên ku kalikên wan hevpar in û ji xêzana heman zimanî hatine, xizmbûna binamalê wan nîn e. Li gorî wî, binyata çîrokên hevpar û manendî yên navneteweyî, têkiliyên çandî û dîrokî ne. Têkiliyên çandî û dîrokî yên ku di navbera gelan da diqewimin, ji hev hin hêmanên çandî “deyn dikirin.” Ji ber vê yekê

⁴⁰ Mehmet Yardımcı, *Malatya Masalları*, Weş. Malatya Kitaplığı, Malatya, 2012, r.20

herçiqasîgirêdayê xêzana zimanên cuda bin jî di navbera wan da -wekî ku di çîrokan da jî hene- manendî û şîrkahî heye.⁴¹

Lêkolînên birêkûpêk ên li ser çîrokan cara yekem li Rojava, sedsala 19'an da dest pê kiriye. Kesê ku li ser binyata çîrokan cara ewil lêkolîn kiriye; Wilhelm Grimm e. Grimm di pêşgotina berhema xwe ya "Kinder und Hausmarchen" (Zarok û Çîrokên Xanî) da, di derheqê binyata çîrokan da van nêrîn aniyê zimên:

*"Hin motif li her derê bi heman taybetî û xusûsiyetan dihingirin, di hemû çîrokan da bermayiyên baweriyên ku heta dewrên berî dirêj dibin û vebêja xazeyî ya heyînên arişî hevpar e. Ev hêmanên mîtolojîk ji aliyê çavên tûj ve tîn dîtin; dişibin giyayên ji axêû qetên elmas ên li ser kulîlkan."*⁴²

Grimm dema nêrînên xwe didomîne bal dikişîne li ser dirûvtiya di navbera çîrokên Erebb û Elmanan da û vê dirûvtiyê "çîrok ji biyata Hîndan tîn" ve girê dide. Bi vî awayî xebata Grimm ya li ser binyata çîrokan ji ber ku xebata yekemîn e, ji lêkolînerên din ra rê vedike û dibe sûdewar.

Ignacs Kunos di berhema xwe ya **Türk Halk Edebiyatı** da di derheqê binyata çîrokan da wiha dibêje:

*"... Du eslê hemû çîrokên cîhanê hene; yek ji van di Hindîstana kevin a li Asyaya Navîn da, ya din jî di hizirîna her miletê de... Şopa hemû çîrokên li dinyayê û çîrokên gelêrî rêya giyanî ya çûyîna welatên kevin ên Hindûyan dide nişan. Çîrokên Erebban ên "Hezar û Yek Şevan" di xewna xwe da kirine pilepil jî dişibin çîrokên wan. Çîrokên Tirkan wek Heft Peyker, Tûtîname û gelek çîrokên din ji kurterêya Ecemistana kevinderbas bûne, xwe dirêjê welatê Hindûyan ên bisîhr û efsunî kirine û ji kaniya wan lê avêtine."*⁴³

Li gorî Saim Sakaoglu, divê çîrok bi tu binyatê ve neyê girêdan û Sakaoglu nêrînên xwe yên li ser vê mijarê bi vî awayî tîne zimên:

⁴¹ Özkul Çobanoğlu, *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Weş. Akçağ, Ankara, 2005, r. 105

⁴² VgZ. Erman Artun, Anonim Türk Halk Edebiyatı Nesri, Weş. Kitapevi, İstanbul, 2009, r. 111

⁴³ Kunos, *Türk Halk Edebiyatı*, r.95

“Dibe ku cihê herî zêde çîrok tên gotin û cihê herî zedê xwedî pirtûkên çîrokan Hind bin. Lê hin hevşibê çîrokên Çermesoran û qebîleyên Afrikayan di çîrokên Hindûyan da tune ne. Ew çax girêdandina van çîrokan bi Hintê ra mimkin nîn e. Belkî jibîrkirina wan an jî windabûna kuliyata hewînera wan çîrokan bèn hizirkirin.”⁴⁴

Ligel nêrînên cuda yên li ser binyata çîrokan hatine gotin, binyata çîrokan piranî wek sê serdem û çend navên bi wan ra têkildar tê bîranîn.

1. Dibistana Mîtolojiyê
2. Dibistana Hindolojiyê
3. Dibistana Antropolojiyê

2.1.4.1. Dibistana Mîtolojiyê

Wek *“Nêrîna Beriya Dîrokê”* jî tê binavkirin. Parêzkarên vê nêrînê G.Grimm û Dasent in. Temsîlkarê vê mektebê Max Müller (1820-1900) li ser mîtolojiyê lêkolîn kiriye û binyata mîtolojiyê wek Hindîstan dîtiye. G.W. Cox, metoda Müllerî, pêş da xistiye û vê metodê li ser çîrokan sepanîye. Cox, angaşt dike ku mîtolojiya Grekê bi mîletên din ra heman e.

Ji nûnerên vê dibistanê Max Müller *“Zanista Mîtolojiyê ya Berawerdi”* saz dike. Nûnerên nêrîna mîtolojikê, bala xwe didin li ser dirûvtiya di navbera çîrok û mîtolojiyê da û berpêş dikin ku, dibe ku çîrok ji mîtolojiyê derketibe. Müller, mîtolojiya gelên Hind-Ewropayê analîz kiriye û wek çavkanî jî Hindistanê nîşan kiriye.

Cox, nêrîna vê mektebê pêş da xistiye û di lêkolînên hin çîrokan da bi kar anîye. Cox, li ser dirûvtiyên di navbera lehengên mîletên Arî (nîjada xêzana ziman a Hint-Ewropa) da lêkolînên berfîreh kirine û hemûyan bi yek binyata hevpar ve girê daye.⁴⁵

Di vê mektebê da têkoşîna Xwedawendê Tavê û şerên lehengên mîtolojik şibandine têkoşîna tavê ya bi tarîtiyan ra û bi ser ketina wê. Ji ber vê yekê ji vê mektebê ra *“Mîtolojîstên Tavê”* jî tê gotin.⁴⁶

2.1.4.2. Dibistana Hindolojiyê

Wek *“Nêrîna Dîrokî”* jî tê binavkirin. Li gorî vê nêrînê derketina cihê çîrokan Hindistan e. Bi gotineke din binyata çîrokan ji pirtûkên çîrokên navdar ên Hintê (Paçatantra, Çakasaptati) pêk tî. Cara ewil di sala 1838’an da L. Deslongehan,

⁴⁴ Sakaoğlu, *Gümüşhane ve Bayburt Masalları* r. 52

⁴⁵ Saim Sakaoğlu, *Masal Araştırmaları*, Weş. Akçağ, Ankara, 2007, r. 5

⁴⁶ Erman Artun, *Anonim Türk Halk Edebiyatı Nesri*, Weş. Kitapevi, İstanbul, 2009, r. 112

Hindistanê wek binyata çîrokên Ewropayî daye nîşan. Hatiye derpêşkirin ku ew çîrokên ji Hindistanê çûne Rojavayê dibe ku bi sê rêyan çûne:

- a. Beriya sedsala X. hin çîrok bi awayekî kevneşopa devkî li Rojavayê belav bûne.
- b. Piştî sedsala X. bi bandora îslamiyetê û ligel çavkaniyên nivîskî derbasê Bîzans, Îtalya û Îspanyayê bûye.
- c. Nêrînen xwe malên Bûdîzmê û materyalên devkî yên girêdayî vê nêrîne, bi saya Moxolan derbasê Ewropayê bûne.⁴⁷

Ev nêrîna ku wek “*Nêrîna Îndîyanîst*” jî tê binavkirin, nûnerê wê yê yekem ji aliyê zanistiyê ve Sylvestre da Dacy e. da Dacy, wek binyata çîrokan Paçatantrayê dide nîşan.⁴⁸

2.1.4.3. Dibistana Antropolojîyê

Wek “*Nêrîna Etnografîk*” jî tê pênasekirin. Li gorî parêzkarên wê nêrîne têkiliya çîrokan bi mîtolojî û Paçatantrayê ra tune. Çîrok, bermayiyên jiyana rojane ne. Andrew Lang, Edward Tylor û M. Lennan nûnerên vê nêrîne ne.

Nêrîna Langê bi vî awayî pêş ketiye: Ew di mijara binyada çîrokan da Hisdistansereke ye napejirîne. Langê, ji fikrên kevnare yên ku di çîrokan da hene dide mînak û dibêje ku ew di wextên zahf kevin da çêbûne. Ji nêrîna curbicurî ya binyata çîrokan dest pê dike û nêrîna “çîrok di cihên cuda da wek dirûvê hevbi awayekî xweser diqewimin” diperijîne. Li gorî Langê, mirovên ku asta çanda wan cuda ne, xwediyê bawerî û adetên hevpar in. Di dawîya pêşketina çandê ya hevterîb çîrokên wek hev derdikevin holê, dibêje Lang.⁴⁹

Wekî ku li jor jî hate gotin, nêrînen di derheqê binyata çîrokan da yên her sê mekteban jî, ji hin aliyan ve dikarin bîn qebûlkin. Kêm an zêde her sê jî hevûdu temam dikin. Her çiqas Gaston Paris nêrîneke nû derpêş nekiribe jî, di mijara derketina çîrokan da li gorî wî, divê mirov li ser xalekî nemîne asê. G. Parisî dibêje ku: “*Bi usûlên curbecur kifşkirina binyada hin motîfan mimkin e. Lê çîrok wek cureyên wêjeyê tişteki mustakrîr nîn e. Dizane, ew her tim diguhere, hêmanên nû dihingire û hêmanan zahfan jî dîterikîne. Ji ber vê yekê divê çawa di çîrokên Hintê da bandor û şopên deverî tîn*

⁴⁷ Artun, *Anonim Türk Halk Edebiyatı Nesri*, r. 112

⁴⁸ Sakaoğlu, *Masal Araştırmaları*, Weş. Akçağ, Ankara, 2007, r. 7

⁴⁹ Umay Günay, *Elazığ Masalları (İnceleme)*, Erzurum, 1975, r. 18

gerandin bi vî awayî di çîrokên Babil, Misr, Îran, Yewnan, Asyaya Piçûk da jî divê bên gerandin.”⁵⁰

Di lêkolînên hatine kirin da, di nav civatên seretayî yên tu têkiliyên wan bi şarezayî ra tune da hatiye dîtin ku çîrokên wan dişibin çîrokên dîtir. Ev bûyer derxistiye holê ku sedema hevpariyên di çîrokan da wekhevîna kûrahiya giyana hemû mirovên li ser rûyê erdê ne.⁵¹

Necati Birinci, di **Türk Edebiyatı Ansiklopedisi** dadi derheqê çîrok û binyata çîrokan da van agahiyan dide:

*“Çîrok xwediyê rabirdûyên zahf kevn in. Tê melhezekirin ku di civatên mirovan ên yekem da çêbûne. Li her cihê hertim bi gel ra hebûna xwe didomînin, hest û ramanên mirovahiyê yên li hemberê jiyan û xwezayê bi kar tînin. Îro çîrokekê ku li herêmekê welatê da hatiye tespîtîkirin, mimkin e ku bi cudahiyên piçûk ve li herêmên din jî derkeve pêşiya me. Heta cudahiyên piçûk ên bilêvkirinê, cudahiyên vegotinê û bi wekhevîna hin motîfan gelek çîrok, di wêjeya devkî ya gelên cuda da dibe ku ji xwe ra cih girtine. Çîrok, dema derdikevine holê xweyê wan yek kes e, lê dema belav dibin, di navbera herêman da tên û diçin gotinbêjên yekem tên jibîrkirin û çîrok dibin sermiyana civatê. Dema hebûna kesên ku çîrokê derxistine holê ji ser çîrokê winda dibe ew çax çîrok nîrxên hevpar a civatê dixê di nava laşê da.”*⁵²

2.1.5. Cureyên Çîrokan/ Dabeşandina Çîrokan

Hewla yekem di mijara tesnîfkirina çîrokan li gorî esasekî ji aliyê J.G. von Hahn ve hatiye dayîn. Di vê berhema ku ji du cildan pêk tê da lêkolîner hewl daye ku pêwendiya di navbera çîrokên modern û mîten Yewnan da bide nîşan. Lê belê ev tesnîf, ji piştî tesnîfa ku ji aliyê Aarne ve hatiye amadekirin û ji aliyê Thompson ve bi pêş ve hatiye xistin, zêde bal nekêşandiye.

Piştî hewldanên dabeşandinên yekem, Antti Aarne dabeşandina ku hêj îro jî tê bikaranîn amade kiriye. Di vê xebatê da ji nivê zêdetir tîp, çîrokên yek motîfî ne. Tesnîfkirina van çîrokan hêsan e. Di çîrokên ku motîfên wan ji yekî zêdetir in da tesnîf, li gorî lehenga/ê çîrokê ya/ê herî girîng, bûyer an jî li gorî binyada baldar dihat çêkirin.

Aarne çîrokan diqetîne sê beşan:

1. Çîrokên Heywanan (1- 299)
2. Çîrokên Resen/Esil (300- 1199)

⁵⁰ Sakaoğlu, *Gümüşhane ve Bayburt Masalları*, r. 51

⁵¹ Cemil Yener, *Türk Halk Edebiyatı Antolojisi*, Weşanxaneya İnkılapê, İstanbul, 1989, r.374

⁵² Necati Birinci, *Türk Edebiyatı Ansiklopedisi*, Weş. Tercüman, İstanbul, 1985, r. 283

- a. Çîrokên Sêhrê 300-749
 - b. Çîrokên Efsaneyî 750-849
 - c. Çîrokên ku di cureyê hikayeyên kurt da ne 850-999
 - d. Çîrokên li ser dêwên bêaqil 1000-1199
3. Pêkenok (1200- 1999)⁵³

Dema Aarne vê katalogê amade dike ji bo tîpên ku di pêşerojê da bên dîtin hin nimreyên katalogê vala dihêle. Xebata Aarne ji aliyê xwendekarê wî Stith Thompson ve bi pêş ve tê xistin û tîpên ku nû dîtine jî li ser hatiye zêdekirin. Ji ber ku sal ji ser derbas bûne û tîpên nû jî hatine dîtin hewce bûye ku dîsa li ser îndeksê bisekinin. Stith Thompson bûye berpirsyar û di salên 1926-1927 da lêzêdekirin û guherînan pêwîst çêkiriye û di sala 1928'an da "*The Types of the Folktale*" weşandiye. Di vê berhemê da tesnîfa Aarne bi heman şiklî hatiye parastin. Tîpên ku piştî xebatan hatine dîtin di cihên vala da hatine zêdekirin. Ev behrem tenê ji bo çîrokên Ewropa û Asyaya Rojava kêrhatî ye. Thompson, di çapa duduyan da berhemê da hin guherînan çêkiriye û hejmara tîpan jî zêde kiriye. Tesnîfa çîrokên nû bi vî awayî çêbûye:

1. Çîrokên Heywanan 1-299
2. Çîrokên Resen/Esil Yên Gel 300-1199
3. Çîrokên Pêken 1200-1999
4. Rêzeçîrokên Zincîrî 2000-2399
5. Çîrokên Ku Nakevin Tu Sinifê 2400-2499⁵⁴

Thompson di vê xebata xwe da jî ji bo tîpên ku dê nû bê xuyakirin hin hejmaran vala hiştiye.

Kataloga tipê ya çîrokên Tirkan ji aliyê Boratav û Eberhard ve hatiye amadekirin. 378 tîp tespît kirine lê ji bo tîpên ku dê nû bê xuyakirin, nimereyên vala nehêştine. Ev rewş jî cihkirina tîpên nû dijwar dike. Ev katalog ji 23 mijarên cuda pê tê. Dabeşandina Boratav-Eberhard bi vî awayî ye:

- A. Çîrokên Ajelan(1-22)
- B. Ajel-Mirov (22-33)
- C. Ajel an ruhek arîkariya mirov dike (34-82)
- D. Zewaca bi ruh an ajel ra (83-109)

⁵³ Sakaoğlu, *Masal Araştırmaları*, r. 11-12

⁵⁴ Özkul Çobanoğlu, *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Weş. Akçağ, Ankara, 2005, r. 118-119

- E. Jiyana bi ewliya û ruhen baş re(110-122)
- F. Desthilatdariya carenusê (123-142)
- G. Xewn (143-145)
- H. Jiyana bi ruhê xerab ra (146-168)
- Î. Sêhrbaz (169-184)
- J. Keçika ku ji xwe ra yarekî dibine (185-196)
- K. Lawikê ku ji xwe ra yareke dibîne (197-222)
- L. Kecika hêjar bi dewlemendekî ra dizewice (223-238)
- M. Hesûdi û bêbexti (239-255)
- N. Lehengê biçûkxistî (256-258)
- O. Zina û ji rê derxistin (259-280)
- P. Bûyer û karên ecêb (281-289)
- Q. Dozên ecêb (290-301)
- R. Çîrokên rasteqîn (302-310)
- S. Tesadufên ecêb (311-316)
- T. Çîrokên pêkenokî (317-322)
- U. Zilam u jinên bale û tiral (323-338)
- V. Diz û dedektîf (339-349)
- W. Fenekorê/a jîr, mêr an jina qesîs (350-378)⁵⁵

Di edebiyata Kurdî da di derheqê tesnîfkirina cureyên çîrokên Kurdî da li gor nêrîna Ramazan Pertev:

“Çîrokên gelêrî em dikarin di bin çar grûban da tasnîf bikin; çîrokên ajalan (fabl, cefen), çîrokên neasayî (fewqulade), çîrokên rasteqîn û çîrokên zîncîreyî (muteselsîl).”⁵⁶

Naki Tezel di berhema xwe ya **Türk Masalları** da di mijara dabeşandina çîrokan da nêrineke cuda gotiye. Li gorî wî, qetandina çîrokan bi xetên qethî mimkin nîne. Nivîskar li gorî taybetiyên çîrokan, çîrokan wek “Çîrokên Xeyalî” û “Çîrokên Rastî” dabeş dike.⁵⁷

⁵⁵ Saim Sakaoğlu, *Gümüşhane ve Bayburt Masalları*, r. 57-58

⁵⁶ Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok*, Weş. Doz, Stenbol, 2008, r. 94

⁵⁷ Tezel, *Türk Masalları*, r.13

Çîrokên heywanan piranî çîrokên kurt in. Di çîrokên heywanan da mînakên herî girîng, ji mînakên çîrokên herî kevin “Çîrokên Pançatantra û Aisopos” û “LaFontaine” ne. Di çîrokên heywanan da formelên destpêkê zêde tune. Di çîrokên heywanan da bûyer yek jî dibe ji yekê zêdetir jî. Di navbera bûyeran da tevayî heye. Di çîrokên heywanan da mebest dan pejirandina fikrekî û ders dayîn e. Di van çîrokên da her çiqas hêmanên perwerdekerî hebin jî pêkenîti zêdetir xwedî bandor e. Di van çîrokên da li dorî her temenê peyam hene. Piranî lehengên derasayî wek dêw, cîn, cadû di van çîrokên da tune ne. Çîrokên heywanan piranî pexşan in lê awarte bin jî hin çîrokên heywanan hene ku nezm û pexşan tevlihev e.

Di çîrokên heywanan da piranî heywanan taybetmendiye xwe winda kirine, tîpên xwe guhertine, bûne mîna mirovan. Mînakên çîrokên vê cureyê yên herî kevin di dîroka cîhanê da “Pançatantra” û “Aisopos” e.⁵⁸

Edebiyata Kurdî di vî warî da gelek dewlemend e û mînakên çîrokên heywanan gelek in. Çîroka Mamê Hirç, Çîroka Dîkê û Pîrê, Çîroka Roviye, Çîroka Zengilo Mengilo, Çîroka Şengê Pengê Aliçengê û hwd.

Di nava cureyên çîrokên da çîrokên herî zêde bi wateya xwe ve heman, çîrokên derasayî ne. Di çîrokên derasayî da li gel heyînên asayî heyînên derasayî jî wek cin, pêrî, dêw hene. Lê ev hêman xwediyê taybetiyên mirov û heywanan in. Him mijar him jî leheng berhemên xeyalî ne û taybetiyên wan ên derîaqil hene.

Di çîrokên rasteqîn da bûyer û leheng zêdetir nêzikê rastiye ne. Zahf kesên di çîrokên da mîna paşe, mîrên dewlemend, qazî, kesên ketober û xizan, diz bi taybetiyên xwe yên jiyana rastî tîpên vegotin. Di van çîrokên da armanc, li hembêrê xirabiyên xetirandina guhdêran e.

Tîpe û kurtbûn taybetiyên herî girîng ên çîrokên pêkenî ne. Ev çîrok piranî bişahînet û mustehcen in. Ji ber vê yekê ev çîrok zêdetir di nav kesên mezin da belav bûne. Di çîrokên pêkenî da vegotinên qalib zêde tine. Leheng xwediyê taybetmendiye derasayî nîn in, ji jiyana rojane hatine wergirtin. Têkiliya wan bi rastiye ve heye.

Di çîrokên zincirî da leheng piranî heywan in. Lehengên derasayî ew qas hindik in ku meriv dikare bêje tine.

“Bûyerên piçûk û negirîng li pey hev rêz dibin û wek helqeyan çîrokên derdixînin holê û ji van çîrokên ra jî “Çîrokên Zincirî”tê gotin.”⁵⁹

⁵⁸ Perteve Nailî Boratav, 100 Soruda Türk Halk Edebiyatı, Weş. Bilgesu, Ankara, 2014, r. 89

Ev çîrok kurt in û pêwendiya wan bi rastî ra tine, xeyalî ne.

2.1.6. Motîfên Di Çîrokan Da

Koka peyva motîfê ji “motivum”a latînî ye. Ev peyv di jiyana rojane da di muzîk, resm, nexş, wêje û gelek warên din da tê bikaranîn. Lê têgiha motîfê ya ku di warê wêjeyê da tê bikaranîn ji warên din cuda ye û ji bo mebestên cuda tê bikaranîn. Heta di cureyên wêjeyê da jî motîf ji hev cuda ne. Hin cureyên vebêjê ji aliyê motîfan ve xizan in lê hin cure gelek dewlemend in.

Gotina ‘motîf’ ji destpeka sedsala 19. pê da weki tegeh hatiye bikaranîn. Lê xebatên li ser motîfê yên di cureyên vebêjê da di dawiya sedsala 19. dest pê kirye. Pêşî em ê li ser wateyên motîfê yên di ferhengên da derbas dibin bisekinin paşê em ê pênasên lêkolîneran binivîsin.

Li gorî Doğan Kaya: “*Navê hêmana herî biçûk e ku di cureyên wek mîtolojî, çîrok, efsane, destan, çîrokên gelî da, xwediyê hêza jiyînê ye.*”⁶⁰

Yaşar Çağbayır, li ser wateyên motîfê yên di şaxên hunerê da jî sekiniye û di derheqê motîfan da pênasên wek: “1. *Xêz an desena ku nirxa hunerê dihingire û her tim tê dubarekirin; nîgar. 2. Hêmana xemlê ya ku di berhemê da her tim tê dubarekirin; nîgar. 3. Hêmana xemlê an jî vebêja di berhemekê de...*” kiriye.⁶¹

Nurettin Albayrak pêşi behsa wateya motîfê ya di jiyana rojane da -ku di wateya “parçe”, “beş” da tê bikaranîn- dike; paşê motîfê wek têgiha wêjeyê bi vî awayî rave dike: “*Motîf, di berhemên hunerê wek mîtolojî, çîrok, destan, hikayet, efsaneyê da her tim tê dubarekirin û hêmana herî biçûk e ku tê da hêza jiyânê heye.*”⁶²

Max Luthî wiha pênasê dike: “*Motîf hêmana herî biçûk a çîrokê ye û dikare xwe di kevneşopiyê da biparêze*”. Li gorî Arthur Chrîstensen: “*Motîf ew hêman in ku xwe bi zindîtiya xwe didin qebûl kirin, li gorî rêgeza psîkolojîk a tarîfe-zor tesîreke mezin li guhdaran dikin, û ji silsileyên fikrî ya îbtîdaî ji bo ku bikevin terkîbên nû dikarin bîn parçe kirin*”⁶³

Di mijara motîfê da xebata herî girîng ji aliyê Stith Thompson (1885-1976) ve hatiye kirin, li gorî wî motîf: “*Hêmana herî biçûk a çîrokan e ku xwediyê hêza jiyînê ye*

⁵⁹ Artun, *Anonim Türk Halk Edebiyatı Nesri*, r. 115

⁶⁰ Kaya, *Ansiklopedik Türk Halk Edeb. Terimler Sözlüğü*, r. 539

⁶¹ Yaşar Çağbayır, *Ötüken Türkçe Sözlük*, Weş. Ötüken, İstanbul, 2007, r. 3259

⁶² Nurettin Albayrak, *Ansiklopedik Halk Edebiyatı Sözlüğü*, Weş. Kapı, İstanbul, 2010, r. 414

⁶³ Vgz. Ali Berat Alptekin, *Taşeli Masalları*, Weş. Akçağ, Ankara, 2002, r.113

di pêşerojê da.⁶⁴ Li gorî Vesselovski, motîf yekemîn e, mijar duyemîn. Pênaseya wî ya motîfê bi vî awayî ye : “*Motîf, parçeya herî piçûk a çîrokan e.*”⁶⁵

Arvas di gotara xwe da bo tegeha motife raveyeke wiha kiriye:

*“Motîf îfadeyên qalibgirtî ne û mirov dikare wan ji aliyê naverok û binyadê ve binirxîne. Ew her çiqas têkilî hev jî bibin di kontekstên cuda da kirasê cuda li xwe dikin. Her wiha ew dubareya bûyerên rojane ne. Em dikarin vê bi nimûneya îndeksa dawîya pirtûkekê aşkeretir bikin. Bonimûne, armanca sereke ya amadekirina îndeksa navên kes û cihên erdnîgarî û têgehên di dawîya pirtûkekê da ew e ku dema xwendevan li wê îndeksê binêre derbarê naveroka pirtûkê da bibe xwedî zanyarî. Yanî îndeksa pirtûkekê, kurteya wê ya di van gotinan da veşartî ye. Belê fonksiyona herî girîng û taybet a xebatên motîfan di folklorê da aşkerakirina babet û peyamên veşartî di motîfên berhemên gelêrî da ye.”*⁶⁶

Ligel van pênase û raveyan em dikarin motîfan bi giştî di bin sê beşan da kom bikin:

1. Lehengên çîrokan: xweda, ajalên derasayî, afirendeyên ecêb, dêw, cadû, ferîşte, perî, mirov, zarokên bêguneh, dêmariyên bêrehm...
2. Mijarên di nava tevgeran da: heyberên sêhrî, kevneşopên derasayî, baweriyên ecêb û hwd.
3. Koma motîfan ku di nava xwe da gelek motîfan dihewîne û tenê ji bûyereke pêk tê.⁶⁷

Ji xeletiyên di mijara motîfan da yek jî ev e ku wateya vê têgihê hêj baş nehatiye fêmkirin. Heger motîf hêmana herî piçûk a vegotinê be divê bê diyarkirin gelo çi motîf in çi nîn in. Di serî da ji bo ku bibe motîf derasayî şert e. Divê ev derasayî xwe di şehs, cih, bûyer û wextê bide nîşan. Vexwarina avê ji tasekê tişteki normal e û taybetiyeke cuda nîn e; lê heger piştî vê avvexwarinê çavên lehengê yên kor vebe ew çax em dikarin ji motîfê behs bikin.

Dema em temaşê xebatên li ser motîfê dikin, em dibînin ku dîroka wan zêde kevn nîn e. Di vê mijarê da di cîhanê da xebata herî girîng ji aliyê Stith Thompson ve

⁶⁴Çobanoğlu, *Halkbilimi Kuramları ve A.Y.T.G.*, r.119

⁶⁵ Vladimir Propp, *Masalın Biçimbilimi*, Weş. Türkiye İş Bankası Kültür, İstanbul, 2011, r.16

⁶⁶ Vgz. Bünyamin Demir, *Çîrokên Kurdî Li Gorî Motîf Îndeksa Stith Thompson (Bi Nimûneyên Çîrokên Mîrze Mihemed)*, Teza Lîsansa Bilind (Neweşandî), Mêrdîn, 2016, r. 7

⁶⁷ Şimşek, *Yukarıçukurova Masallarında Motif ve Tip Araştırması*, r.156

hatiye kirin. Berhema Thompson a bi navê **Motif Indeks of Folk-Literature** ji şeş cîldan pêk tê. Di pênc cîldên berhemê da motîf di navbera xwe da veqetiyane mijarên.

Cîlda şeşemîn fêhrist e. Di Motif Indeksê da sernavên mijaran û herfên ku wan îfade dikin bi vî awayî ne:

Cîldê I. :

- A- Motifên Mîtolojîk
- B- Lawir
- C- Qedexe

Cîldê II. :

- D- Sêhr
- E- Mirin

Cîldê III. :

- F- Tiştên Derasayî
- G- Dêw / Hût
- H- Azmûn / Îmtîhan

Cîldê IV. :

- Î- Biaqîli û Safîtî
- J- Xapandin

Cîldê V. :

- K- Berevajîbûna Qederê
- L- Tayîna Pêşerojê
- M- Şens û Siûd
- N- Cemiyet
- O- Xelatkirin û Ceza
- P- Dîl û Qaçax
- Q- Zilmên Derasayî
- R- Zayend
- S- Tebîeta Jiyanê
- T- Dîn
- U- Taybetiyên Karakteran
- V- Mîzah

W- Komên Cuda yên Motîfan⁶⁸

2.1.7. Beşên Çîrokê

Di çîrokên da hin qalib hene ku ew ti wextê naguherin. Çi dirêj çi kurt her çîrok li ser sê hîmên neguher tê damezirandin:

1. Destpêka Çîrokê (Serê çîrokê)
2. Bingeha Çîrokê (Gewde)
3. Dawiya Çîrokê (Serencam)

Ji destpêka çîrokê ra “çîvanok” jî tê gotin. Çîvanok, bêjeyên qalib in ku pêwendiya wan bi hev ra tune lê ji bo guhdêran bikişîne çîrokê hatine çêkirin. Di çîvanokan da armanc berhevkirina bêjeyên bêleqe ye ku bala guhdêran bikişîne û sexbêriyê wan bike domdar. Ev bêjeyên qalib pêşiya bûyera resen û dawiya bûyera resen tînan bikaranîn. Çîrokbêjê/ê serkeftî pîvan û cihê çîvanokên baş dizane. Li gorî Pertev Nailî Boratav, çîvanokên çîrokên xwediyê erkên diyarkirî ne. Ew çîvanokên ku di serê çîrokê da tînan gotin bi awayekî îkazkirinê dibêjin ku çîrok rast nî e, ji bo kêfxweşkirin û zendegirtinê hatine guncandin; lê bûyer her çiqas guncandin bin jî divê bê qebûlkirin ku di wextên zaf berî da derbas bûne. Em dikarin “wextekî”, “hebû tunebû” wek mînak bibêjin. Yê herî kurt ku di dawiya çîrokên da tînan gotin dixwazin wesfekî hevpar ê çîrokê xuya bikin: ji bo her kesê heman bextewariyê dixwazin û dibêjin ku hemû serpêhatî li gorî dilê her kesê bi dawiyên bextewariyê diqedin... Wek mînaka: “Ew li wir gihane mirazê xwe...”.⁶⁹ Ew çîvanokên ku di nava çîrokê da derbas dibin ji bo şewaz û cîhana çîrokê hemanên temamker in.⁷⁰

Hemû çîrokbêj ji çîvanokan sîd werdigirin û destpêka çîrokên xwe bi çîvanokan dikin. Ji xeynî çîvanokên tînan zanîn, çîvanokên dirêj jî hene ku ji aliyê çîrokbêjên hoste ve hatine kemilîn. Li gorî Boratav çîvanok, serpêhatiyên şaşker û ecêp in ku wekî ji serê vebêjan derbas bûne û bi kesê yekem ra tînan gotin.⁷¹ Çîrokbêj tiştên tevlihev, şaşker û dûrê aqlê her wekî ji serê wan derbas bûye qal dikin.

Di çîvanokan da hostetî, lihevanîna bêjeyên bêleqe çêdibe. Çend mînakên çîvanokan ku di çîrokên kurdî da tînan bikaranîn: “Hebû tunebû, kes ji Xwedê mezintir tunebû... Hebû tunebû rehme li dê û bavê hazirguhderan bû... Hebû tunebû, carek ji

⁶⁸ Çobanoğlu, *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, r. 120-121

⁶⁹ Boratav, *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, r.86

⁷⁰ Umay Türkes Günay, *Elazığ Masalları ve Propp Metodu*, Weş. Akçağ, Ankara, 2011, r. 670

⁷¹ Pertev Nailî Boratav, *Az Gittik Uz Gittik*, Weş. İmge Kitapevi, Ankara, 2009, r. 344

caran rehme li dê û bavê guhdaran... Careke ji caran, rehmet li dê û bavê zehmetkêş û xwendevanan... ”

Di beşa gewde da çîrok rasterast tê gotin. Bûyerên çîrokê diqewimin û çîrokbêj bi awayekî kelecânî çîrokê dibêje ku bala guhdêran bikişîne û guhdêr dawiya çîrokê mereq bikin. Çîrokbêj carinan ji bo zindîkirina guhdaran hin hevokên nişkoc û baneşanî û yên bi qafiye jî di navberan da dibêje. Bi bo mînak: “Çû çû, heft kevirê li dû.” , “Pî li min rebenê”, “Wey li min rebenê”, Ez mam çikî tenê”, “Mala min şewitiyo/ê”, “Eliyê min û te, Kezîzera min û te...”⁷²

Di dawiya çîrokê da divê çîrokbêj hemû hunerên xwe derîne holê û çîrokê bi awayekî hostatî biqedîne. Di vê beşê da guhdar û xwendevan ji guman û meraqan tèn rizgar kirin. Dawiya çîrokan da piranî dibêjin: “ Çîroka me çû diyaran, rehme li dê û bavê guhdaran”, “Ew li wir gihane mirazê xwe, tu/em jî li vir”, “Çîroka me li diyaran. Dilovanî û başiya Yezdanê Dilovan li dê û bavên guhdaran. Ji bilî fesad û ewanan”... û hwd.

2.1.8. Vebêjên Çîrokê

Çîrok berhemên çanda devkî ne û di navbera nifşan da tèn neqilkirin. Çîrokbêj li ser çîrokan motîfên nû zêde dikin û bi vî awayî çîrokan geş û dewlemendtir dikin. Armanca çîrokbêjan, divê çîrokên ku hînî bûne bi heman şiklê ve gotin nebe; divê armanca wan dewlemendkirina çîrokan bi peyv û biwêjên nû be. Ji ber ku dema çîrokbêj çîrokan dibêje a rastî ziman, çand, keyfxweşî, xemgînî, hêviyên civakê bi awayekî girtî an vekirî divê bîne zimên. Bi raya Ali Fuat Bilkan çîrokbêj, bi serdestiya xwe ya li ser zimên û bi hunera xwe ya bikaranîna biwêj, gotinên pêşiyên û gotinên têrwate ve di hawirekî siriştî da perwerdehiya zimanê zikmakî dike û haja guhdêran jê tine.⁷³

Çîrok dibin eynikên herêmên ku tê da tèn gotin. Çîrok, di derheqê xeyal, nêrîn, bawerî û jiyîna mirovan da me haydar dikin. Çîrokbêj dema çîroka xwe dibêje hin guherîna jî dike. Di vê mijarê da Azadowski van gotinan dibêje:

“Çîrokbêj, di çîrokê da gelek cihan diguherîne. Ev guherîn wekî taybetiyên zimên, vebêj; di binyata çîrokê da, di xîzkirina lehengan da, di

⁷² Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok*, Weş. Doz, Stenbol, 2008, r.97

⁷³ Ali Fuat Bilkan, *Masal Estetiği*, Weş. Timaş, İstanbul, 2009, r. 87

bîrdozî û erka çîrokê da jî derdikeve pêşiya me. Bi vî awayî çîrok, hevsengiya vebêj, guhdêr û çîroka kevneşopiyê ye.”⁷⁴

Çîrok bi kevneşopiyeye taybetmend tên gotin. Em dikarin bi şêweya vebêjê çîrokên hin gelan ji hev veqetînin. Çîrok, taybetiyên devkî yên çîrokbêjê û terza axaftina herêmê ya ku çîrok tê da tê gotin dide nîşan. Bi vî awayî çîrok, di her vegotinê da ji nû ve şêwe digire. Ev jî bi neteweyiya çîrokgotinê ve têkildar e. Divê zimanê çîrokê zimanê rojane, rewan be û bi hêsanî bê fêmkirin. Gotinên herêmî, biwêj, gotinên pêşiyên di çîrokan da her tim derbas dibin. Ji ber vê yekê vegotina çîrokan qabiliyeteke taybet hewce dike. Her kes nikare çîrokan bêje. Ji pîrbûn û bitecrubebûna çîrokbêjan diyar e ku vegotina çîrokan da tecrube gelek girîng e. Kesên piçûk hene ku çîrokan dizanin û dibêjin. Lê gotinaçend çîrokan wan “çîrokbêjên hoste” nake. Li gorî Saim Sakaoğlu rewşa derûnî ya çîrojbêjê jî di wextê vegotina çîrokê da girîng e. Saim Sakaoğlu gotinên xwe wiha didomîne:

“Çîrokbêj dema çîrokan dibêje divê her tim li aliyê kesên ku heqê wan tê xwarin û qels be. Ew, vê rewşa xwe bi hin peyvan eşkere dike ku ew gotin di binyata çîrokê da tine ne. Ya rastî çîrok xwediyê binyatên qalibgirtî nîn in. Ew ne mîna helbestê ne. Lê motifên wê westar in. Her çîrojbêj dikare heman bûyerê bi peyvên cuda bêje. Vebêj di wextê vegotinê da li ser çîrokê hin tiştan zêde dikin. Heta ew xwe bi çîrôkê ra dikin yek.”⁷⁵

Çîrokbêjên Kurd, lehengan di navenda çîrokê da didin rûniştin û hemû balêdikişînin li ser serlehengê. Di çîrokên Kurdî da ev balkêşandin heta dawiya çîrokê dewam dike.⁷⁶ Çîrokbêj dema çîroka xwe dibêje li ser detayan zêde nasekine. Çimkî zahfbûna detayan dibe ku bibe sedema bêhtengiya guhdêran û fêmkirina çîrokê. Çîrokbêj dikare di navbera wext û cihan da valahiyên mezin bihêle. Bi yek peyvê dikare derbasî bi pênçe sal şun da be. Di çîrokan da jiyan zahf çalak e. Di çîroka ku di yek xêzê da didome da aksiyon zû çêdibin. Li gorî Nuri Taner, di cîhana çîrokan da her tiş mimkin e. Tixûbên jiyanê rasteqîn, di çîrokan da ji holê radibin û di binyata çîrokê ya

⁷⁴ Vgz. Sibel Turhan Tuna, *Türk Masallarının Varoluşçuluk Açısından İncelenmesi*, Weş. Muğla Sıtkı Koçman Üniversitesi, Muğla, 2014, r.3

⁷⁵ Sakaoğlu, *Masal Araştırmaları*, r.130

⁷⁶ Kenan Bozkurt, *Kürt Masallarının Yapısal Özellikleri, Kimlik Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu*, Weş. Bingöl Üniversitesi, Bingöl, 2013, r. 820

ku tixûban nas nake da tune dibin. Li gorî wî bêderfetî tine. Çîrok lehengê feqîr dike paşe û kesên xirab bi awayekî bêmerhemetî dide cezakin.⁷⁷

Çîrok ji aliyê her kesekî ve tê guhdarkirin û eleqeyeke taybet dibîne. Bi taybetî çîrokên ku di şevên dirêj ên zivistanê da ji bo xweşwext derbaskirinê tînin gotin dibin sedema kombûna insanen. Bi heman awayî di rojên dirêj ên havînê da jî di navbera insanen da çîrok tînin gotin. Bi saya van çîrokan kar ji xebatkaran ra hêsantir dibe û wext zûtir derbas dibe. Bi vî awayî çanda çîrokgotinê didome.

Çîrok di nava civatê da zêdetir ji aliyê jinan ve tînin gotin. Ignacz Kunos di berhema xwe da wek çîrokbêj “pîrejin”an dide nîşan.⁷⁸ Di mijara çîrokbêjan da li gorî Ziya Gökalp, çîrokbêjî ji dayikan derbasî keçan dibe. Li gorî Gökalp her çiqas çîrokbêjên mêr hebin jî dîsa çîrokbêj piranî jin in. Bi ya wî, çîrokbêj hunermendê qada xwe ne.⁷⁹ Çîrok piranî ji aliyê kesên pîr û kal ve tînin gotin. Kesên pîr di hemû vegotinên çîrokê da ji zanebûnê xwe sûd werdigirin û çîrokê xweştir dikin. Çîrokbêj di vegotinê da bi emilandina jest û mîmîkan dixwaze ku çîrok li ser guhdêran zêdetir tesîr bike. Dema jin û mêr di civatekê da tevlihev bin ew çax çîrokgotin zahfî dibe karê mêrên kal. Çîrok herî zêde di nav malbatê da tînin gotin. Hin caran dapîr an jî bapîr ji neviyan ra çîrokan dibêje hin caran jî dayik ji zarokan ra çîrokan dibêje û ev çîrok jî ji bo zarokan dibin xelat.

Çîrokbêj dizanin ku çîrokên tînin gotin rast nînin in.⁸⁰ Lê dîsa jî çîrok herwekî rast be tê qebûlkirin û vegotin. Serfiraziya çîrokbêjê ya di vegotina çîrokê da li vir diyar dibe. Çîrokbêj divê guhdêran bide bawerkirin di mijara rastbûna çîrokê da. Dijane, li rexê din, hin çîrokbêj hene ku ji çîrokan bawer dikin û bûyerên çîrokê wek hatine jiyîn dibînin. Dema me çîrokan kom dikir em rastî gelek mînakên hatin ku ew kes çîrokan wek rast dibînin û qebûl dikin. Hin kes jî dêwan bawer dikin û dibêjin dêwan insanen xwarine, hin kes jî piştî çîrokan “Wextekî dia hema wê demê dihatin qebûlkirin” gotin. Ev gotin piştî lehenga ku dizivire çûkê hat gotin, di nav çîrokên me mînakên wê hene.

2.1.9. Di Çîrokan Da Cih û Wext

Di çîrokan da hêmana wextê nediyar e. Ji ber ku çîrok ne di wextên hatine jiyîn de; wextên ku jiyîna wê tê qebûlkirin da diwelidin. Lewma di her vegotina çîrokê da

⁷⁷ Nuri Taner, *Masal Araştırmaları*, Weş Art-San, İstanbul, 1988, r.9

⁷⁸ Kunos, *Türk Halk Edeb*, r. 89

⁷⁹ Vg. Saim Sakaoğlu, *Masal Araştırmaları*, Weş. Akçağ, Ankara, 2007, r.38

⁸⁰ Vladimir Propp, *Folklor Teori ve Tarih*, Weş Avesta, İstanbul, 1998, r. 49

wextê çîrokê naguhere.⁸¹ Ev nediyariya di wextê çîrokê da bi navneteweyîbûna çîrokê ra têkildar e. Di çîrokan da dûrahiya di navbera du cihan da bi qasî ku tu çavê xwe bigirî û vekî jê tê bihurîn lê hin caran dûrahiyên di navbera cihên zaf nêzik da bi salan naqedin. Di çîrokan da wext zû derbas dibin. Çîrokbêj dibe ku yekser behsa bûyereke sed sal pêşiyê bike.

Tabîrên di serî çîrokan da wek “*wextên berî*”, “*wextekî*” wextên nediyar, muxlaq nîşan dikin. Taybetiyeke herî girîng ê çîrokê jî -ku çîrokê ji cureyên din wek hikayet, mît, efsane, romanê diveqetîne- hêmana “wext”ê ye. Ji xeynî çîrokê di hemû cureyan da tegiha wextê gelek girîng û eşkere ye.⁸² Di çîrokan da nediyarbûna wextê piranî bi van vegotinan diyar dibe: “Wextekî, demekî, berê, çend sal berê, rojek ji rojan, demek ji deman, û hwd.

Cihên ku di çîrokan da derbas dibin piranî cihên nediyar in. Bûyer “*di welatekî dûr de*”, “*di deverekî de*”, “*di gundekî de*”, “*li ser çiyayekî*” derbas dibin. Di çîrokan da cih, mîna wextên di çîrokan da nediyar e. Lê hin caran çîrokbêj ji bo ku guhdêr zêdetir bawer bikin cihên ku tên zanîn di nav çîrokê da bi kar tînin. Hin caran heft qat binê erdê di çîrokan da dibe mekân, hin caran jî navê gundekî nas ji aliyê çîrokbêjê ve di çîrokê da wek mekân tê bikaranîn.

Mekânên di çîrokan da ji bo peyamdanê alîkar in. Ji ber vê yekê zaf caran dema heman çîrok ji aliyê vebêjên cuda ve tên gotin di çîrokê da mekân cuda cuda dibin. Çîrokbêj li gorî xwe mekânan diguherîne û cihên nas diemilîne.

Cihên ku di çîrokên Kurdî da derbas dibin: welatê hat nehatinê, rêya çûn û nehatinê, dinyaya ronî, dinyaya tarî, heft qat binê erdê, asîman, gundekî dûr, li daristanekî, li welatekî... hwd.

2.1.10. Formelên Çîrokê

Formel, vegotinên biqalib in ku di binyata çîrokê da xwediyê erk û şiklên diyarkirî ne.⁸³ Formel bi metnên çîrokê ve başbaş girêdayî ne. Di vegotina çîrokê da bikaranîna formelan bi hostetiya çîrokbêjê ve têkildar e. Çîrokbêjê/î hoste formelên pêketî di nav çîrokê da di cihên pêketî da bikar tîne û bi vî awayî çîrokê dewlemendtir dike. Formelên ku di dêstpêka çîrokê da tên bikaranîn ji formelên ku di dawiya çîrokê da

⁸¹Mustafa Ruhi Şirin, *Klasik Masaldan Sanat Masalına*, Dergah, Jimar: 1, Adar, 1990, r. 20

⁸²A.F.Bilkan, *Masal Estetiği*, r. 74

⁸³Sakaoğlu, *Gümüşhane ve Bayburt Masalları*, r. 250

tên bikaranîn cuda ne. Heger cihê van formelan biguhere dê vegotina çîrokê da xirabebûn çêbe.

Di çîrokan da hêmanên formel li gorî cureyên wêjeya gelêrî yên din, zêdetir berbiçav in.⁸⁴ Di nav û vegotina çîrokan da ev formel xwediyê hin erkan in. Bi destpêka çîrokê da çîrokbêj, armanc û daxwaza wî guhdaran, bi formela destpêkirina çîrokê hişyar û amadeyî guhdarkirina çîrokê ye. Erkekî hêmanên formel ên di çîrokan da jî nişankirina hostatiya çîrokbêjê ye. Çîrokbêjek hoste bi bikaranîna formelan di cihên rast da dikare qabiliyeta xwe bide nîşan. Heger formelên çîrokê di cihên rast e neyê bikaranîn ew çax çîrokbêj nikare ser bikeve. Ew çîrokbêjên ku dixwazin çîrokê dirêjtir bikin bi alikariya formelên çîrokê dikarin bigehişin armanca xwe. Lê ew çîrokbêjên ku dixwazin çîrokê zû biqedînin ji xeynî formelên sereke(destpêk û dawî)formelan bi kar naynin.

Armanca vebêjê di bikaranîna formelên destpêkê da ew e ku, guhdêran ji jiyana rastî hingire û bibe jiyana xeyalî. Armanca bikaranîna formelên din jî ew e ku guhdêr bala xwe bidin li ser çîrokê û bêhna guhdêran teng nebe. Hin caran jî dema çîrokbêj çîroka xwe ji bîr dikin hêmanên formel bi kar tînin û çîvanokan dibêjin. Bi vî awayî wextê wan çêdibe ku dewama çîrokê bînin bîra xwe.

2.1.10.1. Formelên Destpêkê

Beriya ku vebêj dest bi çîroka xwe bike bi bikaranîna van formelan, guhdêran ji bo çîrokê amade dike. Hin çîrokbêj hene ku bi yek an du hevokan bi awayekî sade dest bi çîroka xwe dikin; lê hin çîrokbêj jî hene ku formelên sade bi çîvanokan dewlemend dikin û bi vî awayî destpêka çîroka xwe dikin. Em dikarin formelên destpêkê bi vî awayî rêz bikin: *“hebû tunebû”*, *“hebû tunebû rehme li dê û bavê guhdaran / hazirguhdaran bû”*, *“hebû tunebûrehmet li dê û bavê min û we guhdaran bû”*, *“hebû tunebû wextekî”*, *“hebû tunebû kes ji Xweda mezintir tunebû”*, *“hebû tunebû ... hebû”*, *“wextekî”*, *“hebû tunebû di wextek zemanê berê da ... hebû”*, *“hebû tunebû di hundur dîrokê da... hebû”*, *“hebû tunebû di mêj da ... hebû”*⁸⁵, *“zemanekî”*, *“carek ji caran başîli dê û bavê guhdaran”*⁸⁶, *“Di demeke borî ya dûr û dirêj da... hebû”*⁸⁷, *“Hebû carek*

⁸⁴ Mehmet Ali Yolcu, *Azerbaycan Masallarında Formeller ve Formel Unsurlar*, NEÜ Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi 1, Nevşehir, 2011, r. 75

⁸⁵ Rıza Çolpan, *Çîrokên Gelî*, Weşanên Dozê, İstanbul, 2007, r. 13, 335, 487

⁸⁶ Hilmi Akyol, *Ji Zargotina Kurdî*, Weş Do, İstanbul (Bêdîrok), r. 31

⁸⁷ Nejat Çetin, *Pixço*, Weş Pêrî, İstanbul, 2003, r. 5

ji caran”, “rojek ji rojan”⁸⁸, “Careke ji caran, rehmet li dê û bavê zehmetkêş û xwendevanan”⁸⁹

2.1.10.2. Formelên Borînê

Bi van formelan ji bûyerekê derbasê bûyereke din dibin û ev formel di çîrokan da xwediyê rolên girîng in. Ev formel di çîrokê da ji bo guherandina leheng û bûyeran tên bikaranîn. Her wiha bi saya van formelan, çîrok li ser guhdêran zêdetir bandor dike. “çû çû hey çû”, “şev û roj çûn hey çûn”, “hatin çûn”, “pir çûn hindik çûn”, “pir geriya hindik geriya”⁹⁰, “Dem şev bû, şevereş bû, dinya tarî bû, ha li vir ha li wir...”⁹¹ “Roj li pey rojan çûn, şev li pey şevan herikîn û derbas bûn”⁹², “Roj li pey rojan çûn, hefte li pey hefteyên buhurîn û meh li pey mehan derbas bûn”⁹³

2.1.10.3. Formelên Ku Di Rewşên Wekhev da Tê Bikananîn

Ev formel di nav heman çîrokê da an jî di çîrokên cuda da ji bo heman rewşê tên bikaranîn. Her çiqas ji ber vegotina vebêjê hin guherîn çêbin jî ji aliyê ramanê ve wek hev in. Bo mînak, dêw di çîrokan da bi heman şiklê da ne an jî di çîrokên cuda da keçeken bedew bi heman peyvên tên teswîrkirin.

2.1.10.4. Formelên Dawiyê

Ev formel, di dawiya çîrokan da tên gotin. Her vebêj formelên cuda bi kar tîne. Li vir tiştê herî girîng ew e çîrokbêj çîroka xwe bi formelên rast biqedîne. Ew çax jî hostatiya çîrokbêjê xuya dike. Guhdêrek baş dema formelên dawiyê seh dike dizane ku çîrok qediya.

Formelên dawiyê yê belavbûyî: “çîroka me çû diyaran, rehme li dê û bavê guhdaran”, “çîroka min çû nav dal û diriyar, rehme li dê û bavê we hemûyan”, “ew liwir gihane mirazê xwe tu/em jî li vir”, “ew li wir digehin mirazê xwe, em li vir digehin heqê xwe”, “Xwedê mirazê wan li wir bike ya me jî li vir”, “Li vir çîroka me qediya çû diyaran, Rehma Xwedê li dê, bav û miriyên we xwendevan û guhdaran, hezar carî nale li hefsed bavê cenderme, tasîldar û neyaran, şên û ava be mala belengaz û hejaran”, “Çîroka me li vir dûwayî dît, revî çû diyaran, rama Xwedê li mirî dê û bavê xwendevan û we guhdaran, hezar cari nalet li kedxwar, sîtemkar, tehsîldar û cendirmeyên neyaran,

⁸⁸ Abbas Alkan, *Çîroka Rovî û Gur*, Weş. Elma, İstanbul, 2003, r. 29, 38

⁸⁹ M. Xalid Sadinî, *Çîrokên Gelêrî*, Weş. Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 39

⁹⁰ Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû Antolojiya Çîrokên Zarokan*, Weş. Rupel, Stenbol, 2014, r.48

⁹¹ Zeynelabidin Zinar, *Kewê Çîrokbêj*, Weş Sîtav, Wan, 2013, r. 17

⁹² M. Emîn Bozarşan, *Gurê Bilûrvan*, Weşanên Deng, Stenbol, 2000, r. 55

⁹³ M. Emîn Bozarşan, *Pepûk*, Weş. Deng, Diyarbakır, 2006, r. 34

*çûcar ji xwe bîrnekin rewşa kesîb, belengaz, hejar û jaran*⁹⁴, *“Xebroşka mi li diyara, rehme li dê û bavê hazir û godara”*, *“Ew çûn miradê xwe, têr şahî şa bûn, win jî miradê xwe”*, *“Mesela min li diyara, hezar rehme li dê o bavê godara”*⁹⁵, *“Çîroka me li diyaran, başî li bav û diyên guhdaran”*, *“Çîroka me li diyaran. Dilovanî û başiya Yezdanê Dilovan li dê û bavên guhdaran. Ji bilî fesad û ewanan”*⁹⁶, *“Ew gihiştin mirada xwe, serê guhdaran sax be.”*⁹⁷, *“Çîrvanok çû ji xwe re, hemû şiltaxî û dexesî dûrî guhdaran û vebêjan”*, *“Çîrvanok çû ji xwe re, bihar hat ji me re, hemû dexesî û zikreşî dûrî derê çîrvanokbêj û guhdaran”*, *“Çîrvanok çû diyaran, rehmet li dê û bavê çîrvanokbêj û guhdaran, bêwefatî ne li derê canik û camêran”*, *“Çîrok çû ji xwe re, rojên rind ji me re. Dibêjin “camêr ku meriv bikujin, hiltînin jî”*, *“Çîrok çû ji xwe re, alîkarxwazî ji me hemûyan re”*⁹⁸, *“Me çîroka xwe got, ji vê çîrokê jî aqil girtin bara we ye”*⁹⁹

Hin çîrokbêj jî hene ku van formelan bi kar naynin û tenê dibêjin “Çîroka me qediya, çîrok li vir diqede...”.

2.1.10.5. Hin Hêmanên Formelan

Çîrokbêj ji xeynî wan formelên ku me behs kir di hin cihên çîrokan da hin formelan bi kar tînin. Ev formel di derheqê wext, hejmar, cih û rengan da ne. Ev formel, vegotina çîrokan zindîtir dikin û guhdêr jî dema guhdariyê çîrokan dikin dixwazin van formelan seh bikin. Sê law an keçê paşê hene, heft serê dêwan hene, hin dawet çil şev û çil roj didomin... û hwd.

a. Hejmar

Hejmarên 3, 7, 40 ên ji aliyê çîrokbêjan ve di çîrokan da tînin gotin wek hejmarên formel tînin qebûl kirin. Çawa tê zanin ev jimare di metnên tesewûfî, olî, felsefî da jî xwediyê roleke girîng in. Ji bo hejmara sisêyan di îslamiyetê da gelek hêman hene. “*şerîet-terîqet-heqîqet*”, “*cemâdat-nebâtat-heywanet*”, “*rih-nefs-beden*”,¹⁰⁰ “*sê mehên pîroz* (Receb, Şaban, Remezan). Di olan da, di çîrokan da ji bo lehengan “3” şert tê danîn û “3” şansê lehengan hene.

⁹⁴ Rıza Çolpan, *Çîrokên Gelî*, Weş Dozê, İstanbul, 2007, r. 75, 202

⁹⁵ Berhevkar Hilmî Akyol, *Çîrokên Kurdî Senem Xanim*, Weş Enstituya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2000, 36, 88, 196.

⁹⁶ Hilmî Akyol, *Keçelikê Serdar*, Weş. Do, İstanbul, 2006, r. 57, 108

⁹⁷ Hüseyin Deniz, *Ji Çîrok û Çîvanokên Kurdan*, Weş. Aram, Stenbol, 2013, r. 148

⁹⁸ Akîf Arda, *Hirç û Pirç*, Weş. Dozê, Stenbol, 2010, r. 26, 61, 102, 128, 135

⁹⁹ Mesut Fidan, *Çîrokên Gelêrî Ji Herêma Botan*, Weş. Berbang, Stenbol, 2014, r. 86

¹⁰⁰ A. F. Bilkan, *Masal Estetiği*, r.69

Ji bo hejmara “7”ê “hejmara afirînê” jî tê gotin. Li gorî Qurana kerîm, Xweda erd û asîmanê wek 7 tebeqeyê afirandiye. Her wiha di quranê da hejmara 7ê li gelek cihan derbas dibe: “7 qat asîman, 7 behr, 7 simbil, 7 cot, 7 derî, 7 şev, 7 roj, 7 rê, 7 salên xelayê, 7 sal...”¹⁰¹ Li gorî Yahudiyên, gerdûn şeş rojan da hatiye afirandin û roja 7. roja bêhnvedanê ye. Di hecê da li derdora kabeyê 7 car tê zivirandin.

Hejmara 40ê jî xwediyê nirxeke simbolîk e. Ji Hz. Muhammed ra wehî di 40 saliya wî da hatiye, di islamiyetê da zekât, ji heyîna mirov wek di çilan da yek hatiye diyarkirin. Ji xeynî van; 40 roj şîn girtin jî nirxeke simbolîk e. Her wiha dêwên çîrokan 40 şev û 40 roj radizên, çil miftiyên çil deriyên hene.

Di gelek gotinên pêşiyên da jimareyên 3,7, 40 derbas dibin: “*Sê ehmeq hene li dinê; yê mihê dide bizinê, yê nîska diavêje dewsa kizinê, yê mala xwe dibe ser mala jinê.*” “*Sê gidî hene li dinê: Yê li rêyan diçe bi tenê, yê li evraziyan vedixwe tûtinê, yê mala xwe datine nik mala babê jinê.*” “*Sê tişt hene bi lezzet: Rez û pez û hîrmet.*” *Sê tişt xweş in bi sarî: tirşik û mehîr û karî.*” “*Heft meseleyên hirçê hene, her heft jî li ser hirmiyê/karçînê ne.*” “*Heft sal xela, ne salek neyartî.*”¹⁰² “*Çil heravî nikarin rûtekî bişêlînin.*”¹⁰³, “*Çil derzî nabin şûjinek.*” “*Çil deve li dewsa kerê diçin.*” “*Çil diz nikarin ji mirovê tazî tişteki bidizin.*” “*Çil piştî çile, nû giha bihara ji dil e.*”¹⁰⁴

Çend mînakên hejmaran ku di çîrokan da derbas dibin: 3 xwişk, 3 bira, 3 zêr, 7 bira, 7 roj, dêwa 7 serî, 7 derî, 7 qat binê erdê, 7 têtjikên hirçê, 7 nobedar, 40 şev û 40 roj, 40 dêw, 40 zêr...

b. Reng

Ev formel zêdetir wek rengdêran tîn bikaranîn. Rengê heywanekî an jî rengê eşyayekî: hespa sor, sêva sor, hespa spî, pora reş, pora spî, rûyê spî, pora zer, keziyên zer, ewrên reş, beranê qemer...

c. Cih û Wext

3 şev, 3 roj, 7 şev, 7 roj, 40 şev, 40 roj, 7 sal, Çîn, Cizîra Botan, Çiyayê Sîpanê...

¹⁰¹ Ömür Ceylan, *Tasavvufî Şiir Şerhleri*, Weş. Kitapevi, İstanbul, 2000, r. 291

¹⁰² Abdulkadir Bingöl, *Gotinên Pêşiyên û Biwêjên Botan*, Weş. Nûbiharê, Stenbol, 2005, r.226, 113

¹⁰³ Çiya Mazî, *Ferhenga Gotinên Pêşiyên*, Weş. Elma 38, Stenbol, 2005, r.122

¹⁰⁴ Mehmet Oncu, *Gotinên Pêşiyên*, Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2009, r. 113-114

2.1.11. Lehengên Çîrokê

Lehengên çîrokan insan, heyînên deresiruşt û heywanên ku bi taybetiyên insanan hatine xemilandin in. Şexsên çîrokan bê wext û bê dîrok in. Ziman, nîjad, dîna van kesan eşkere nîn e.¹⁰⁵ Piranî sê keç/kurên paşê hene lê navên wan nayê zanîn an jî dêmariya lehengê heye lê em navê wê nizanin û hwd. Lê di hin çîrokan da navê lehengan tên gotin. Ev navdayîn, zahfî ji bo hêsankirina bi bîranîna çîrokê ye. Di çîrokan da piranî “tîp” hene û peyama ku dixwazin bidin bi alîkariya van “tîpên çîrokan” didin. Nakî Tezel, di derheqê lehengên çîrokan da wiha dibêje:

“Di qewmên hov da lehengên çîrokan li gorî pêdiviya jiyan û derdorê, di şiklê heywanan da xuya dikirin. Piştî ku civat şareza bûn û çîrok gihiştin civatên medenî ew çax leheng jî ketin di şiklê insanan da.”¹⁰⁶

Ramazan Pertev li ser rolên erênî û neyênî dikesine û lehengên erênî û neyênî bi vî awayî rêz dike:

“Di çîrokan da hin aktorên klasîk hene ku rolên wan di her çîrokeke da heman tişt e. Padîşah û keç û kurê wî, derwêş, şivan, gundiye feqîr, şêr, pîremêr, perî bi piranî xwedî roleke erênî nin, lêbelê wezîr, heramî, dêmarî, erfîd, pîrebok, êjmeçetir, cadû bi piranî xwedî roleke neyênî nin.”¹⁰⁷

Di nav çîrokên Kurdî yê girîng da yek leheng jî dêw in. Di hin çîrokan da ji aliyê şiklê ve dişibin insanan lê ji insanan girtir û mezintir in. Di hin çîrokan da jî dêw, wek heft serî derdikevin pêşiya me. Lêvekê van dêwan li erdê ya din li asimanan e. Ew qas bilez in ku ji cihên dûr ra di demeke kurt da dikarin biçin. Tenê di yek gavê da dikarin bimetreyan rê biçin. Dêw ji goştê insanan hez dikin. Heger li cihekî insan hebe ji bêhna wan nas dikin û dizanin û çî wextê insanekê bibînin yekser dixwin. Tenê lehengên bîaqil û bihêz wek Mirza Miheme dikarin li hemberê dêwan bi ser kevin an jî heger keça bîaqil daxwaza dêwê qebûl bike û bibe jina wî, bi vî awayî dikare ji destê dêwî xilas be. Dêw, di çîrokan da tîpa hêwilnak û xirab temsîl dike.

¹⁰⁵ Bilkan, Masal Estetiği, r.99

¹⁰⁶ Naki Tezel, Türk Masalları, Weş. Bilge Kültür Sanat, İstanbul, 2009, r. 9

¹⁰⁷ Pertev, Zarok û Çîrok, r. 99

Di çîrokan da pîrhevok/pîrhebok lehengên hêwilnak in. Ew jî wek dêwan laşgir û tirsnak in. Piranî xwarina wan goştê insanan e.

Di çîrokan da ji tîpên xirab yek jî pîramirovxwar e. Pîra mirovxwar, herkî dibînebi dek û dolaban dixapîne û dixwe. Piranî tenûrekê wê heye û ew tenûr her tim tijî agir û bizot e. Kesên ku dikevin destê wê nikarin bi hêsanîjê bifilitin. Ew qurbanên xwe di nav agira tenûrê da dipêjîne û dixwe. Lehengên çîrokan ên bîaqil piranî li ser tenûrê hêlaneke çêdikin û pîra mirovxwar dixapînin ku li ser hêlanê rûne. Dema pîra mirovxwar li ser hêlanê rûdine ew çax leheng taya hêlanê dibire û pîra miroxwar jî dikeve di nav tenûrê da û dimire. Leheng bi vî awayî ji destê pîra mirovxwar difilite. Pîra mirovxwar piranî xwe wek kesekê baş dide xuyandin û dixwaze ku her kes guneha xwe jê ra bîne. Ji ber ku pîr e, guneha insanan pê tê û dixwazin alikariyê bidin wê. Pîrê bi vî awayî xelkê dixapîne û bi dest dixwe. Pîra miroxwar zahf dewlemend e. Di mala wê da çil ode hene û her çil ode jî tijî zêr û zîv in.

Pîrê di çîrokan da wek jineke xêrxwaz derdikeve pêşiya me. Di hin çîrokan da alikariyê nevisiyên ku ji destê dêmariyan zaf dikêşin, dike. Hin caran şîretan li keçikan dike û ji wan rê rêya baş dide nîşan. Jinên pîr piranî bi tenê dijîn, feqîr in û ti kesê wan tune. Dema serê lehengan dikeve tengasiyê pîrê ji wan ra deriyê mala xwe vedike û wan wek keç û kurê xwe dihesibîne.

Padîşah, di qesrên mezin da dijîn. Ev qesr piranî ji zêr û zîvan hatine çêkirin. Hin caran qet zarokên padîşahê tune; hin caran jî bi vexwarina dermanên pîrê zarokên wî çêdibin. Piranî zarokên padîşahê yan sê keç in yan jî sê kur. Padîşah dixwazin ku keçên wî li gel kesên dewlemend bizewicin. Xortên feqîr ji bo keçên padîşahê ji gelek azmûnên dijwar derbas dibin û di dawiyê da piranî bi ser dikevin û li gel keça padîşahê dizewicin. Kurên padîşahê jî piranî ji keçên feqîr hez dikin û bi wan ra dizewicin. Di hin çîrokan da nexweşiyên dijwar tînin serê keçên padîşahê û padîşah dibêjin: *“Her kî keça min sax bike ez ê hemû mirazên wî bi cih bînim.”* Padîşah zahfî kesên xirab û zilimker in lê hin padîşahên baş û birehm jî hene. Dawetên zarokên padîşahan piranî çil roj û çil şev didomin.

Dêmarî/ jimbav jî lehengekê çîrokê ye. Piranî nevisiya wê sîpêhî û jêhatî ye lê keça wê kirêt û nekêrhatî ye. Ji ber vê yekê dêmarî her tim hesûdiyê dikin. Di hin çîrokan da şûna nevisiyê keça xwe dide li ser mexfûrê ku xêla dawetê keça wê bibe. Zaf

caran mêrên xwe dixapînin ku nevisiya wê bikuşînin. Bêbextî û neheqîyan li nevisiyan dikin.

Mîrza Miheme, di çîrokên kurdî da lehengekî sereke ye. Zahfî, ji sê birayan ê herî piçûk e. Jîrek e û ji tengasiyan bi bikaranîna hişê xwe difilite. Bihêz e, dikare dêwekî heftserî têk bike. Ew astengên ku derdikeve li ser rêya wî bi jêhatîbûna wî ji holê radibin û Mîrza Miheme bi ser dikeve. Di çîrokan da piranî birayên Mîrza Miheme neheqiyê li birayê xwe dikin lê dawiye dîsa Mîrza Miheme bi ser dikev.

2.2. XEBATÊN KU LI SER ÇÎROKAN HATINE KIRIN

2.2.1. Xebatên ku li Ser Çîrokên Kurdî Hatine Kirin

2.2.1.1. Tez

a. Tezên Lîsansa Bilind

Metin Eren, **Bitlis Masalları Üzerine Bir Araştırma**, Van, 2001

Evîn Bîlge, **Ji Hêla Naverokê ve Dahûrîna Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî**, Mêrdîn, 2013

Mehmet Bozkoyun, **Çend Çîrokên Herêma Şêxan (Metn-Analiz)**, Bîngol, 2015

Îbrahim Tarduş, **Bikaranîna Çîrokên Kurdî di Perwerdeya Zarokan da**, Mêrdîn, 2015

Îsa Yılmaz, **Vekolînek Li Ser Çîroka Zembîlfiroş**, Muş, 2016

Mohammed Baiz Rahman Rahman, **Rola Folklorê di Perwerdekirina Zarokan da mînak: Çîrok**, Wan, 2016

Bünyamin Demir, **Çîrokên Kurdî Li Gorî Motîf Îndeksa Stith Thompson (Bi Nimûneyên Çîrokên Mîrza Mihemed)**, Mêrdîn, 2016

Nimet Baykal, **Çend Çîrokên Kurdî yê Dişibin Çîrokên Gülîstana Sa'dî Şîrazî**, Bîngöl, 2017

Mohammed Khidhir, **Ji Bo Zarokan Çîrokên Ajalan (Mînak Çîrokên Kovara Heng 2001-2011)**, Wan, 2017

Halîl Îçen, **Di Nav Çanda Kurdî da Çîrokek Sîndirella**, Dîyarbekir, 2017

Reşîf Rojdar Yıldız, **Di Edebiyata Zarokan da Çîrok**, Wan, 2017

Muzaffer Ekîncî, **Lêkolîneke Li Ser Motîfên Lawiran Ên Ku Di Berhema M. Emîn Bozarlan ya Rêze Çîrokên Lawiran a Bi Navê “Meselokên Lawiran” da Cih Digirin**, Mûş, 2017

b. Tezên Doktorayê

Li ser çîrokên kurdî hêj tu tezên doktorayê nehatine nivîsandin.

1.2.2. Pirtûkên Çîrokan

Çend pirtûk ku ji çîrokan pêk tîn:

HîlmîAkyol, **Keçelikê Serdar**, Weşanên Do, İstanbul, 2006

HîlmîAkyol, **Ji Devê Mehemedê Ûsivê Goçkar**, Weşanên Do, İstanbul, (Bê tarîx)

HîlmîAkyol, **Mamê Rovî**, Weşanên Do, İstanbul, 2008

HîlmîAkyol, **Zargotina Kurdî**, Weşanên Do, İstanbul, 2008

HîlmîAkyol, **Kerdiz**, Weşanên Do, İstanbul, 2008

HîlmîAkyol, **Kew û Kew**, Weşanên Do, İstanbul, (bê tarîx)

M. Emîn Bozarşan, **Gurê Bilûrvan**, Weşanên Deng, Stenbol, 2000

M. Emîn Bozarşan, **Pepûk**, Weş Deng, Diyarbakır, 2006

Abbas Alkan, **Çîroka Rovî û Gur**, Weşanên Elma, İstanbul, 2003

Nejat Çetîn, **Pixço**, Weşanên Pêrî, İstanbul, 2003

Bryan Guinness, **Conî û Cimêma**, wergera ji fransizî: Celadet Alî Beirxan, Weşanên Avesta, İstanbul, 2009

Çîrokên Kurdî Senem Xanim, Berhevkar Hîlmî Akyol, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2000

Rıza Çolpan, **Çîrokên Gelî**, Weşanên Dozê, İstanbul, 2007

Mesut Fidan, **Çîrokên Gelêrî Ji Herêma Botan**, Weş. Berbang, Stenbol, 2014

M. Xalid Sadinî, **Çîrokên Gelêrî**, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2013

Zinarê Xamo, **Hebû Tunebû Antolojiya Çîrokên Zarokan**, Weş. Rupel, Stenbol, 2014

Zeynelabidin Zinar, **Kewê Çîrokbêj**, Weş Sîtav, Wan, 2013

Hüseyin Deniz, **Ji Çîrok û Çîvanokên Kurdan**, Weşanên Aram, Stenbol, 2013

Mehmet Öncü, **Çîrokên Kurdan**, Weşanên Dozê, Stenbol, 2006

Yücel Feyzioğlu, **Mirza Memed ile Ejderha**, Nesin Yayınevi, İstanbul, 2013

Yücel Feyzioğlu, **Adapa**, Nesin Yayınevi, İstanbul, 2013

Akîf Arda, **Hirç û Pirç**, Weşanên Dozê, Stenbol, 2010

BEŞA SÊYEM

DI ÇÎROKÊN HÎZANÊ DA MOTÎFA DÊ

3.1. Girîngiya Jînê/Dayikê

3.1.1. Di Vegotinên Gelêrî da Cih û Girîngiya Jinê/Dayikê

3.1.1.1. Di Gotinên Pêşiyên da Jin/Dayik

Gotinên pêşiyên, gotinên kurt in û li nav herêmê da heqîqetekê, tecrûbeyekê piranî bi qafiyê tîne zimên. Ev gotin piranî şîretan didin û nayê zanîn ku ji aliyê kê ve hatine gotin. Ji gotinên pêşiyên ra “pîrebend” jî tê gotin ji ber ku axaftinên, gotinên kal, bav û mezinên me nin.

Li gorî ferhangan gotinên pêşiyên: “Li gorî çavderî û ceribandînan dirêj hatine gotin û ji gelê ra malbûne; gotinên şîretmend, darbimesel.”¹⁰⁸

Gotinên pêşiyên di ferhengeke din da wiha hatiye ravekirin: “*Gotinên pêşiyên, ji piştî çavderî û tecrûbeyên dirêj bi awayekî hişmendî ji aliyê mezinan ve hatine gotin. Gotinên kalikan, mesel, darbimesel.*”¹⁰⁹

Gotinên pêşiyên beşeke girîng a folklorê Kurdî pêk tînin û wek neynika jiyana gelê Kurd gelek agahiyên biqîmet pêşkêşî me dikin. Gotinên pêşiyên, tecrûbeyên mirovan ên bi hezar salan nişan didin. Ji van tecrûbeyan hinek şîret in, hinek serpêhatiyên balkêş in, hinek jî jiyana bi xwe ne. Gotinên pêşiyên di derheqê millet û civatan da gelek agahiyên girîng didin me. Em bi saya wan di warê çand, kevneşopî, bawerîya civatê da xwediyê agahiyan dibin. Di nav gelek gotinên pêşiyên a Kurda da jin û dayik derbas dibin. Jinên jêhatî û kêrhatî gelek gotinên pêşiyên da hatine pesndan. Bo mînak:

“*Jin bincoya aşî ye.*”

“*Jin binyata xanî ye.*”

“*Jinan dil kir, dîwar qul kir.*”

“*Jina qeç ew e berrika xwe ji avê derêxe.*”

“*Jin sênca malan/mêran e.*”

“*Jin çûne hewaran, mêr ketin kewaran.*”

“*Kê kir kê nekir, şêrejinê navê xwe kir.*”

¹⁰⁸ *Türkçe Sözlük*, Weş. Türk Dil Kurumu, Ankara, 2005, r. 140

¹⁰⁹ D. Mehmet Doğan, *Büyük Türkçe Sözlük*, Weş. Pınar, İstanbul, 2005, r.91

“Avaya malan destê jinan e.”

“Jin dike malavayî.

Wekî di van mînakên li jor da jin, wek binyata malê hatiye dîtin. Jin dema ku bixwaze, ji tu astengiyê natirse û ji hemûyan bi ser dikeve. Di nav hin gotinên pêşiyên da pesnê qîzan, jinan dane û jinan ji mêran kêmtir nedîtine:

Jin heye ji mêran zêde ye.

Kulfet heye ji sed mêrî zêde ye.

Jina baş ji hezar mêrê xirab çêtir e.

Ji kurê bêxîret, qîzeke kor paktir e.

Qîz hene heft kuran nadin.

Bila jin çê be, bila nav ordiya esker be.

Qîza filankesê xûna mêrekî ye¹¹⁰.

Di hin gotinên pêşiyên da mijar têkiliya di navbera jin û mêrê da ye.

Jin û mêr bibine yek, kes bi wan nikare.

Jin û mêr şer kir, nezanan bawer kir.

Jin û mêr, canik û camêr.

Jina mêran be, li ber beran be.

Jin sitara mêran e.

Jin û mêr, tevr û bêr

Jin diwarê hundir e, mêr diwarê derve ye.

Şêr şêre, çî jin çî mêr e.

Di van mînakan da em dibînin ku jin û mêr girêdayê hev in û di navbera wan da wekhevî heye. Yek ji wan tune be ya/ê din nîvco dimîne. Jin û mêr dema bibin yek, piştgiriyê bidin hev dikarin ji her tengasiyê bifilitin. Jin, bi karên hûndirê malê re; mêr bi karên derve ra mijûl e. Bi vî awayî destgirê hev in. Di herheqê jina baş û nebaş da jî çend gotinên pêşiyên hene:

Jina baş jîn e, jina xirab jan e.

Jina baş mêrê nebaş jî baş dike.

Jina baş bêmane birê mêrê xwe ye.

Jina baş namûsa mêrê xwe ye.

Jina baş ji dûr ve kifş e.

¹¹⁰ Rohat Alakom, *Di Folklorê Kurdî De Serdestiyê Jinan*, Weş. Avesta, Stenbol, 2009, r.80

Jina baş sebr e.

Jina nebaş mêrê baş jî xerab dike.

Jina xerab wekî sola teng e.

Jin jî hene, jan jî hene, melhema dilan jî hene.

Jin hene malan xera dikin, jin hene malan ava dikin.

Jin dikare mêrê xwe rezîl jî bike, ezîz ji bike.

Jina xirab mêran serberjêr dike.

Axiriya diranê diêşe kişandin e, jina xirab berdan e.

Di nav civata kurdan da li ser spehîtiya, bedewbûna, ciwanbûna jinan gelek tişt hatine gotin. Ji bo mînak çend gotinên pêşiyên:

Jina bedew para mêrê kirêt e.

Jina sipehî her bela ye.

Jina ciwan zozana mêrî ye.

Jina sipejî ji rêveçûna xwe tê nasîn.

Jina ne delal, çavê mirov diêşîne; jina delal, dilê mirov diêşîne.

Ji van gotinan tê fêmkirin ku jin spehî jî be derd e, spehî nebe jî. Jina spehî bêsiûd e û rastî mêrê kirêt tê; jina kirêt jî nayê pejirandin. Piştî van gotinan hin gotinên pêşiyên hene ku di wan da neheqî li jinan hatiye kirin. Tiştên xirab li ser jinan gotine û jinan piçûk dîtine. Mixabin di civatên pederşahî da jin gelek caran rastî van gotinan bûne. Çend mînak:

Jin û derew mirovên yek in.

Jina bêkes har dibe, mêrê bêkes jar dibe.

Jina berdayî wek kera bindorê ye.

Jinê bidin jin mirîyan.

Jin dara şikestî ye.

Jin dirêse, belê nizane hember yek bike.

Bila rê be bila dûr be, bila gol be bila kûr be, bila qîz be bila pîr be.

Jin di her demê da hem ji aliyê mêr û hem jî ji aliyê hemcîsnên xwe yê jin da wekî “dara şikestî”, “kêm”, “qels”, “lewaz”, “reben”, “belengaz” û hwd hatiye dîtîn û binavkirin. Li gorî van gotinên li jor, bi giştî jin bi tenê serê xwe nikarin bijîn, ji ber ku ji aliyê aboriyê ve girêdayê mêran in. Lê jiyana îroyîn da rewş guheriyê û jin bi tenê

serê xwe jî dikare li ser pê xwe bisekine. Li gorî van gotinan jin zêde derewan dikin lê ev jî gotineke rast nîn e ku li ser jinan hatiye gotin. Belê êdî jin ne jina berê ye. Bi lebatî, li hember serdestî û kevneperestiya hezar salan radiweste û di nava rêxistin û komelên civakî yên şarwer (sivîl) da cih digire û tê dikoşe.¹¹¹ Ji xeynî van gotinan gelek gotinên din jî hene ku mijar jin e. Di van gotinan da li ser heyabûna jinan, fihêtûbûna wan sekînîne. Hin jin wek jîn hatine dîtin, hin jî wek jan... Hin jin jî bûne melhema dilan:

Jin hene jan in, jin hene melhema dilan in.

Jin jî hene jinkok jî, mêr hene mêrkok jî.

Jina bêheya mîna girara bêxwê ye.

Jîna bînin ji malan, xwarzê herin li xalan.

Jina esil dane li ser hesîr.

Jina fitêhû hejaye şehrekê, mêrê fihêtû ne hêjaye kerekê.

Jinê bîne ji kuran re, da kur bigihên riha re.

Jin jî hene, jinkok jî hene.

Jinan zehmet kêşand, dia li mêran kirin.

Jina qelsemêran be li ber behsa ye.

Jin bîne ji esliyan, tê bibîne ecêbiyan.

Jin dibê bila bextê min hebe, bilaçavekî min tunebe.

Piştî mijara “jin”ê di gotinên pêşiyar da “dayik” jî gelek caran derbas bûye. Di van gotinên pêşiyar da mijar: şîretkirina dayikê, fedakariya dayikê, yarbûna dayikê û hwd. bûye. Çend mînakên gotinên pêşiyar ku li ser dayikan hatine gotin:

Dayikê heft kur xwedî kiriye lê heft kuran dayikek ji birçîna kuştine.

Dê li ber weledan, weled li ber Çiyayê Qaf.

Dê bibe dêmarî, bav dibe bavmarî. / Dê bibe jinbab, bab jî dibe zirbab.

Dê bibîne dotê werîne. (dot: qîz)

Dê yek, jin deh.

Dê û weledan şer kir, bêaqilan bawer kir.

Dayik nifiran li zarokan dikin, lê şîrê wan xwe diavêje pêşiyê.

¹¹¹ Adar Jiyan, *Raveya Peyvan*, Weş. Pêrî, Stenbol, 2005, r.370

Dayik yar e, bavik rêber e.
Dayika mirov, bi derdê mirov dişewite.
Dayika xelkê nabe dayika mirov.
Dê bibîne, dotê bistîne. (dot: qîz)
Dê dergûşa xwe naavêje avê.
Dê dota xwe bernade.

Di warê mezinkirina zarokan da keda dayikan zaf e. Ev rewş ji ber çavên civatê nereviye û civatê hurmeteke bêhempa ji bo dayikan nîşan daye. “*Dayik hate derda Xwedê rabû berda.*” Dema di navbera dê û bav da nîqaşekê derket, gel piştgiriye daye dayikê û gotiye: “*Dê ji bav şirîntir e.*” Çend mînakên din ku mezinkirina zarokan da keda dayikan nîşan dide:

Dê heşandiye, dê mêjandiye.
Zarok li ser milê dê mezin dibin.
Zarok ya dê ye, ne ya bavê ye.
*Bav dimire zar nizanin bavê wan miriye, dê dimire stûyê wan xar dibe.*¹¹²

Di derheqê dêmarîyan/jinbavan da jî hin gotin hene:

Dêmarî nabe dê.
Dê bû, lê bû dêmarî.
Dê bû dêmarî, bav bû filê Kavarê.

3.1.1.2. Di Çîrokan da Jin/Dayik

Di çîrokan da jin, ji mêran zêdetir cih digrin. Çîrok jî mîna zêmaran, lorîyan li derdora jinan qewimîne.

Çîrok, piranî ji aliyê jinan ve hatine gotin. Ji ber vê yekê di çîrokan da lehengên jin bi qasî lehengên mêr bandordar û berçav in. Jinên sipehî, aqlê selîm, dilpak, hêmin, xebatkar, durist di çîrokan da dema kêmasî an bêsiûdî çêdibe ew jî dikevin di nav têkoşînê da. Jin, bi alîkariya alîkarên derasayî bi sebr û hûnera xwe digihêjin bextewariya dawî, dewlemendî û serkeftinê.¹¹³

Di çîrokên Kurdî da jin lehengeke muhîm e. Jin, di gelek çîrokên kurdî da bûye lehenga sereke an alîkar. Ji bo jinan zaf caran şerên mezin qewimîne, xwîn hatiye

¹¹² Alakom, *Di Folklorê Kurdî De Serdestiyê Jinan*, r. 78

¹¹³ Umay Günay, *Türk Dünyası El Kitabı, Masal*, Weş. Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, c.III, Ankara, 1992, r. 327

rijandin. Di çîrokan da spehîtiya jinê şibandine heyvê. Bejn û qameta wan dirêj e. Ewqas sipehî ne ku şewqa wan dide avê û dema kurê paşê/mîrê wan dibînin hema wê demê bi dileke ne bi hezar dilan wê dihebînin. Hin lehengên çîrokan çawa resmê jinan dibînin aşiq dibin.

Jin di çîrokan da bi awayekî zû nagehijin mirazê xwe. Piştî gelek ked û berxwedanê, zehmetiyê jin xwestina xwe bi dest dixwe. Di çîrokan da piranî dijminê jinan dîsa jin bixwe ne. Ev jin dêmarî ye, xwesî ye, keçên jinbavê, jinbira ye û hwd. Di çîroka “Fatma û Lêvreş”, “Fatfatişok”, “Lêvreş” da kesên ku xirabiyê li lehengê dikin dêmarî û keça dêmariyê ye. Di hin çîrokan da jî jinbira heneqî li dişa xwe dike û dixwaze ku dişa xwe ji aliyê mîrê xwe ve bide kuştin. Li ser namûsa jinan gelek tiştên gotin. Jin mecbûr dimîne ku ji welatê xwe dûr keve. Di rêyan da gelek tiştên serê jinê. Heta ku bêgunehbûna xwe îspat bike gelek zehmetî dikêşîne. Hin caran pora xwe dibire û dibe keçelo, hin caran li gundekî şivantî dike. Lê dawiya dawî digihe miraz û armanca xwe.

Di çîrokan da jinên baş û nebaş bi hev ra hene. Di dawiya çîrokan da jinên baş rûspî, jinên xirab, fesad rûreş û rûtenî bûne. Cîvatê pîvanên başî-nebaşiyê angorî xêra civatê, malbatê, angorî xêra zarokan û angorî xêra xelasî, azadiya jinan kifş kiriye. Jinên baş çawa em di dawiya çîrokan da dibînin, xêr û xweşî li ser wan dibare, ew ji ber destê zordestan xelas dibin û difilitin. Jinên nebaş jî, di dawiya çîrokê da gelek caran cezayên xwe dibînin.¹¹⁴

Tiştên ku tîne serê jinan heman tiştên tîne serê dayikan jî. Dayik di çîrokan da ji bo zarokên xwe li ber her astengiyê disekin, li ber xwe didin û ji bo zarokên xwe hemû cefayan dikêşin. Çi bête serê wêbila bê dîsa jî zarokên xwe bernade û naçe. Di çîrokan da dê çiqas baş be dêmarî jî ewqas xirab e. Her tim hesûdiyê dike û dixwaze keça wê jêhatîtir, spehîtir û baştir be. Tiştên zaf xirab tîne serê nevisiyên xwe. Wisa dike ku nevisiyên ji destê bavê wan dide kuştin.

Di beşa “Di Çîrokan da Motîfa Dê” da em ê bi berfirehî li ser vê mijarê bisekînin.

3.1.1.3. Di Destanan da Jin/Dayik

Peyva destan, bi eslê xwe îranî ye û di zimanên îranî da wekî “*dasîtan*” an jî “*dastan*” derbas dibe. Destan cureyeke wêjeya gelerî ye. Rastiyên dîrokî yê kû di paşeroja netewan da xwediyê cihekî girîng bûne, bi ruhê civatê geş bûne û bûne destan.

¹¹⁴ Alakom, Di Folklorê Kurdî De Serdestiyeke Jinan, r. 17

Paşê bi wêjeya devkî heta îro hatine. Em dixwazin çend mînakên ku di derheqê wateya destanan da hatine kirin binivîsin.

Lêkolîner Doğan Kaya, di derheqê destanan da wiha gotiye:

“Destan, hîsên bilind yê neteweyê, ramanên wan û armancên wan ên hevpar didin der... Destanên her neteweyê nîn in. Lê neteweyên ku dîroka wan ber bi dewrên dêrîn ve diçin, xwedî destan in... Derketina meydanê ya destanan ji sê merheleyan pêk tê: kakil (a bûyerê), (merheleya) bûyinê û merheleya tesbîtê... Ji ber ku, bandoreke mezin û kûr ya bûyerên ku di destanan da diqewimin li ser civakê heye, nabe ku lehengê van bûyeran jî mirovên ji rêzê bin. Lehengên destanan xwedî taybetmendiyên xwerû û derasa ne. Ew, hê di welidîna xwe da bi rengekî derasa tîn dinyayê.”¹¹⁵

Cevdet Kudret zêdetir li ser nezmên destanan sekiniye û gotiye:

“Destan nezmên dirêj in û behsa bûyerên civakî û dîrokî wekî şer, koçberî û hwd. ku bi jiyana netewan ra ji nêz ve têkildar in, dikin.”¹¹⁶

Li gorî Pertev Naili Boratav, mijarên destanan didu ne. Yek ji van mijarên kozmogonî û mîtolojik in: afîrîna gerdûn û heyînên li rûyê erdê. Ya din jî, bûyerên girîng ên paşeroja neteweyan da, şerên ku ji aliyê serokan ve li derve û nav da li hemberî dijminan, xebatên ku mebesta wan jiyaneke rehetir e...¹¹⁷

Di destanan da mijar piranî lehengî û evîn e. Ji xeynî van mijaran şer, koçberî, xela, hin bûyerên xwezayî jî di nav destanan da dibin mijar. Bi saya destanan em xwediyê agahiyên wek jiyana, kevneşopî û baweriyên li heremê dibin. Destan metnên dirêj in û bi awayekî helbestvanî, nezm hatine gotin. Lê dibe ku piştî salan hin beşên helbestvanî hatibin jibîrkirin û şûna wan jî pexşanan girtibe. Ji ber vê yekê îro di destan da piranî nezm û pexşan têkel in.

Destan ji aliyê vebêjên taybet ve tîn gotin. Her kes nikare destanan bêje û ev karê “dengbêj”an e. Di destanan da jî motifên ku di çîrokan da berbas dibin hene; wek hesp, av, xewn, alîkar û hwd. Ji ber ku destan ji jiyana rastîn û dîrokê ra eleqedar in lehengên destanan jî zahfî kesên jiyayî ne. Lewma bûyerên di destanan da derbas dibin

¹¹⁵ Doğan Kaya, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimler Sözlüğü*, Weş. Akçağ, Ankara 2010, r.222

¹¹⁶ Cevdet Kudret, *Örneklî Türk Edebiyatı Tarihi*, Weş. T.C. Kültür Bakanlığı, 1995, r.14

¹¹⁷ Boratav, *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, r.41-42

wek “bûyerên rastî” tên hesibandin. Destan netewî ne û hejmara wan kêr in, heta destanên hin netewan jî tune.

Jin di destanên kurdî da xwediyê roleke muhim in. Ew di destanan da li hemberê neheqî û bêdadiyê disekin, ber xwe didin. Ji bo hezkiriyên xwe hin caran dimirin, canê xwe didin. Tekoşîna wan heya dawiya emrê wan didome û ji biryarên xwe nazivirin. Jin him ji bo azadiya xwe, him ji bo azadiya welatê xwe xwe diavêjin di nav agirên mezin da.

Berhemên ku li ser babeta jinan agahdarî û zanyariyên balkêş tê da hene, di nav folklorê kurdî da gelek in. Di van destanan da babeta jinan babeteke bingehîn e: Memê Alan û Zîna Zêdan, Siyabend û Xecê, Kerr û Kulik, Binefşa Narîn û Cembeliyê Hekkarê, Mem û Eysê, Zembîlfiroş, Sêva Hecî, Menşa Eliyê Selim Axa, Kela Dimdimê, Filto Quto, Bişarê Çeto, Salih û hwd.¹¹⁸

Di destanên kurdî da mijarê piranî evî û qehremanî bûye. Di destanên evîniyê da gelek caran du mêr dibine evîndarê keçekê, ligel keçikê dibin sê kes. Bûyer di navbera van sê kesan da diqewime. Piranî dawiya van destanan dramatîk in. Dawiyê yan jin û mêr dimirin an jî raqîp dimire. Hin caran raqîp dildar nîn e, bavê keçê an jî birayê keçê jî li hemberê evîna wan dikesine. Piranî ziyana herî mezin jin dibînin û ji canê xwe dibin.

Di destan û serpehatiyên kurdî da, beşeke problematîka xelasiyê jinan jî, rev e. Ne reva bi zorê, reva ji du dilan pêkhatî. Dema keç ji xelasiya xwe ra rêkê nabîne, vê carê bi dilketiyê xwe ra direve, bi gotineke din hev direvînin, dema mirov li ser vê struktura xelasiyê difikire, mirov dibîne ku ev ji alîkî da protestokirina pêwendiyên nemirovî û paşdemayî ye, kakilê tekoşîna xelasiya jinê pêk tîne. Ji ber vê yekê jî her revek, di nav van mercan da riya xelasiya jinan fireh dibe, reya zewacên bêdil dixitimîne, zihniyetên paşverû dirizîne û pûç dibe.¹¹⁹ Herçiqa di dawiya revan da tiştên xirab biqewimin jî dildar razî ne çimkê rêyeke din tune ji bo wan.

3.1.2. Girîngiya Çîrokan

Çîrok, ji hêmanên herî girîng a çanda devkî ne. Ji ziman, çand, kevneşopî û terza jiyînê ya civata ku jê derketiye ra peywira eynikê dibe û çîrok di vê wateyê da erkî ne. Bi rêya çîrokan mirov hest, fikr û xeyalên xwe tîne zimên.

¹¹⁸ Alakom, Di Folklorê Kurdî De Serdestiyeke Jinan, r. 47

¹¹⁹ H.b. r. 51

Çîrokên gelî, bê guman xwediyê paşerojeke zaf kevn in. Heger îro çîrokekê ku wek aidê miletekî ye tê qebûlîkirin, di herêmên din yê welatê da jî bê xuyakirin ev tê wê wateyê ku li herêmên fireh da belav bûne. Ji ber vê yekê çîrok, sermayeyên dewrên zaf berî ne. Ev jî dide xuyakirin ku, çîrok di civatên mirovan a yekem da derketine û bi bi awayekî devkî li gel hin guherînan heta îro hatine. Wek dawî, çîrok di serî da sermayeya kesekê bûye lê piştî guherîna hafîze û derdorê, bûyê sermayeya her kesê.¹²⁰

Vegotin û guhdarkirina çîrokan, neqilîkirina wan di navbera nifşan da jî bo pêşketina civatan zaf girîng e. Di perwerdehiya zimanê zikmakî da jî bo zarokan çîrok çavkaniyên gelek hêja ne. Di kesibandina hişmendîya zimanê zikmakî û xwendina pirtûkan da girîngiya çîrokan nayê înkâr kirin. Ali Fuat Bilkan, di perwerdehiya zimanê zikmakî da li ser girîngiya çîrokan disekine û dibêje ku:

“Çîrokbêj, bi serdestiya xwe ya li ser zimên û hunerweriya xwe ya bikaranîna biwêj, gotinên pêşiyên û gotinên têrwate ve, di dorhêleke tabîî da jî bo guhdêran perwerdehiya zimanê zikmakî dike.”¹²¹

Zarok, bi saya şopên gotinên pêşiyên, biwêj, kevneşopiyên ên di nav çîrokan da, wan hînî dibe. Ji ber vê yekê di perwerdekirinê da nîrx û girîngiya çîrokan zahf e. Bi saya motîfên çandî yê di çîrokê da zarok van motîfan wek nesîhet hînî nabe; di cîhana çîrokê ya rengîn da di nav şêwazeke dewlemend da zarok, xwe bi xwe hînî dibe.

Li gorî Ramazan Pertev hînbûna zimên da çîrok xwediyê rolekê mezin in:

“Di serî da çîrok û her wiha vegotinên gelêrî yê wekî; lîstik, henek, tiştanok, têderxistinok, mamik, metelok, lêhatinok, pêkenok, lorik û stran û hwd. di fêrbûna zimên da roleke girîng digirin.”¹²²

Erkekê çîrokan jî ew e ku, zarokan ji ramanên razber ra amade dike. Ji ber ku cîhana zarokan a xeyalî dişibe cîhana çîrokan, zarok derasayîyên çîrokan wek biyanî nabînin.

Zarok li gel çîrokan dijîtiyan jî hînî dibe. Li gorî Saim Sakaoglu, çîrok her tim cotên dij didin ber hev: nêmerd û merd, wezîrên baş û xirab, biraya bîaqil û biraya dîn û hwd.¹²³ Hema hema di hemû çîrokan da qencî di kesên baş, sîpêhî, bihêz, biserketî

¹²⁰ Tezel, *Türk Masalları*, r. 9

¹²¹ Bilkan, *Masal Estetiği*, r. 87

¹²² Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 107

¹²³ Sakaoglu, *Gümüştane ve Bayburt Masalları*, r. 248

da; kêmasî di kesên kirêt, xirab û qels da xuya dike. Ji ber ku di dawîya çîrokan da kesên bi ser dikevin “ên baş” in, zarok jî lehengên “baş” ji xwe ra dikin nimûne û dixwazin ku wek wan lehengan bikin. Dema zarok dibînin ku leheng li ber astengiyan ber xwe didin, dev ji doza xwe bernadin ew çax zarok jî berxwedanê hîn dibe û bi vî awayî di zarokê da hesta “xwebawerî”yê çêdibe.

Taybetiyeke çîrokê ya karakterîstîk jî ew e ku him vebêj him jî guhdêr baweriyê çîrokê nakin lê ew bûyerên ku di paşerojê da neqewimîne û tu wextê jî naqewimin, her wekî qewimîne bi jest û mîmîkan tên gotin. Ev dijîtiya di çîrokê da mîzahê diyar dike.¹²⁴ Di hin çîrokan da hêmanên tirsê hene lê çîrokbêj bi vebêja çîrokê guhdêran dide kenandin. Ev rewş jî hêmana dijîtiyê ya di çîrokê da dide xuyakirin.

Guhdêrên çîrokê, kîjan lehengê çîrokê nêzikê xwe bibînin xwe dixin şûna wê/wî. Ev rewşa “wekhevbûnê” di xala jê kêfgirtinê da girîng e. Guhdêrên çîrokê, ji lehengên çîrokê yekî wek mînak dihilbijêrin û di xisletên wê/wî da dest bi jiyînê dikin. Ji bo ku ev” wekhevbûn” bibe divê şêwaza çîrokbêjê serkeftî be. Guhdêr difikire ku ew jî di çîrokê xwe çalak e û ji hevoka “*ew li wir digehin mirazê xwe, tu jî li vir*” ji xwe ra aqil digre. Guhdêr jî dibe şîrkê bextewariya di dawîya çîrokê da. Cezakirina kesên xirab û sehneyên weşetê yên di dawîya çîrokê da li ser guhdêrê tesîr dike. Guhdêr bawer dike ku piştî neheqîyan dê kesên baş bi ser kevin û kesên nebaş û xirab têk biçin û bên cezakirin.

Di perwerdeya zarokan da çîrok xwediyê roleke girîng e. Ew çîrokên ku bala zarokan dikişînin, divê li gorî zarokan bînin nivîsandin û vegotin. Divê zimanê çîrokan fehmbare be. Nivîsandina çîrokên li gorî cihana xeyalî ya zarokan, ji bo wêjeya zarokan xizmeteke mezin e. Zarok, ji çîrokên tevlihev û vegotina wan dirêj hez nakin û ji wan çîrokan fehm nakin. Ji bo zarokan çîrokên kurt û yên lehengên wan heywan in divê bînin bijartin. Ziya Gökalp, li ser girîngiya çîrokan di sekine û dibêje ku di hêvotina zarokan da çîrok girîng in; tenê çîrok bala zarokan dikêşînin û zarok dersên lehengiyê yên yekem ji çîrokan hîn dibin.¹²⁵ Îro di perwerde, hêvotin û pêşketina zarokan da girîngiya çîrokan rastiyeke wisa ye ku nayê inkarkirin. Li gorî Denzler:

Ew zarokên ku çîrokan dixwînin an jî li çîrokan guhdar dikin bi lehengan ra eynî dibin, ji ber ku dizanin dê dawiyê bextewarî çêbe, ji endîşe û

¹²⁴ Propp, *Folklor Teori ve Tarih*, r.35

¹²⁵ Vgz. Saim Sakaoğlu, *Gümüşhane ve Bayburt Masalları*, Weş .Akçağ, Ankara, 2002, r. 12

*nediyariyan ra tehemil dikin. Çîrok soza “her çi dibe bila bibe dê dawiyêda ji aliyê periyekê ve alîkarî û rênîşanî bibînî; cadû û kesên xirab jî dê dawiyê da ji navê rabin” dide.*¹²⁶

Ew dawiya bextewariyê, li ser zarokan tesîreke mezin dike û zarok başbûnê hînî dibin.

Ji bo guhdêran, erkekê çîrokê jî, ji bo kêfê wesitabûna wê ye. Di berî da çîrokên Hindî ji bo kêf û xweşwext derbaskirinê dihatin gotin. Li ba me jî çîrok, di şevên zivistanê yê dirêj da û di ser tenûran da ji bo kêfê tên gotin. Piranî dema karên hevpar çêdikin, ji bo ku kar ji bo wan hêsantir be û zûtir biqede çîrokan dibêjin. Guhdêr dema çîrokan guhdar dikin her çiqas çîrokê bizanibin jî her wekî nû seh dikin guhê xwe didin çîrokê û ew çîrok xweşê wan diçe, kêfa wan jê ra tê. Îro jî di civîneke da heger kesekê/î çîrokbêj hebe yê din ji çîrokbêjê çîrokan dixwazin û bi bîranîna zarokatiya xwe kêfxweş dibin.

3.1.3. Motîfa Dê

Di çîrokan da dê/dêmarî zaf caran dibe mijara sereke. Em ê di vê beşê da li ser taybetmendiyên dayikan û dêmariyan bisekinin.

3.1.3.1. Dê

3.1.3.1.1. Başbûn

Em dikarin bi gelemperî bibêjin ku başbûn taybetmendiya dayikan e û di hemû çîrokan da jî ev taybetî xuya dike.

Di **ÇîrokaDirkê**dadiya Dirkê jineke pîr e û çavên wê nabînin. Dema jinbiraya Dirkê bêbextî li Dirkê dike birayên Dirkê bawer dikin lê diya Dirkê ji wan bawer nake. Diya Dirkê dizane ku neheqî li keça wê dikin, dê li ber xwe dide, keça xwe diparêze lê tu kes guhdariya wê nake. Di vê çîrokê da dê baş e lê nikare nehêle ku kurên wê neheqiyê li keça wê bikin.

Di **ÇîrokaEdlê û Ebbas** da Edlê herçiqas jineke kêmaqil be jî dîsa dêyeke baş e. Piştî keça xwe dide mêr diçe serdana wê û her tim dixwaze ku keça wê bextewartir be. Dawiya kirinên Edlê herçiqas bûyerên xirabbîn jî em dizanin ku armanca Edlê başbûna keça wê ye. Dema Edlê û Ebbas dikevin di nav dikana pertalan da û hemû pertalan

¹²⁶ Vgz: Fatih Ege, *Masallarda Bilincin Dönüşümü ve Dönüştürülmesi*, Weş. Kültür Ajans, Ankara, 2016, r.7

diçirîtînin mebesta wan ew e ku ji bo keça xwe kincên sipehî bidin çêkirin. Niyeta wan baş e lê dawiyê kêfxweşî çênabe.

Di **Çîroka Herdemcanê** da diya Herdemcanê jî jineke baş e. Dayik dema seh dike ku dê mêrê wê keça wan Herdemcanê bide kuştin zaf xemgîn dibe. Dike nake nikare mêrê xwe iqna bike ku keça wan xirabiyê nekiriye. Di dawiya çîrokê da dîsa dayika Herdemcanê derdikeve pêşiya me û li wir jî dayik wek jineke baş xuya dike. Herdemcan xwe wek Keçelo dide nasîn û dibe xebatkarê dê û bavê xwe. Guneha diya Herdemcanê pê Keçelo tê û destûr dide ku Keçelo di mala wan da razê. Dayik dibêje bila Keçelo di nav kulavan da ranezê û ew jî wek me di odeyeke mala padîşahê da razê.

Di **Çîroka Hespa Xweliyê** da dayik xwestina keça xwe bi cih tîne û ji bo ku keça wê biçê li ba birayên xwe ji keça xwe ra hespekê ji xweliyê çêdike. Bi saya wê hespê keçik digehe mirazê xwe û diçe li ba birayên xwe yên dût.

Di **Çîroka Kalikê Têş** da xesûya keçikê keseke baş e. Dema kurê wê dixwaze li gel keçikê bizewice, xwestina kurê xwe qebûl dike û ji bûka xwe ra zaf baş miamele dike. Kalikê Têş dema diçe mala wan her çiqas bûka wê naxweze jî dîsa ji kalikê ra derî vedike û wî mêvan dike.

Di **Çîroka Mîrza Miheme û Şêx Sînem** da, Şêx Zade diya Şêx Senemê ye û jineke baş e. Xwestinên zavayê xwe lib û lib bi cih tîne. Cara pêşî dema Mîrza Miheme diçe li ba Şêx Zade ji wê sicadeya Şêx Senem dixwaze û Şêx Zade jî dide. Cara din Mîrza Miheme ji Şêx Zade ûşûyeke tirî dixwaze û dîsa Şêx Zade dide wî. Cara dawî jî Şêx Zade xwestina Mîrza Miheme bi cih tîne û birayê Şêx Senem dişîne.

3.1.3.1.2. Şîretkirin

Hişê dayikan her tim li ser zarokên wan e. Dayik naxwazin ku tu xirabî bê li serê zarokên wan. Ji ber vê yekê ji zarokatiyê heta mezinbûnê şîretan li zarokên xwe dikin û serguha¹²⁷ wan li ser zarokên wan e. Di çîrokên me da dayik zaf caran bi taybetiya xwe ya şîretkirinê derdikeve pêşiya me.

Di **Çîroka Ehmedê Beyrema** da Beyrema herçiqas keseke xirab be û şîretên wê şîretên baş nebe jî dîsa ew jî şîretan li zarokên xwe dike. Wextê diçin beravê Beyrema ferq dike ku qumikê jibîr kirye. Keça xwe dişîne mal ku qumikê bîne lê pêşiya çûyîne şîretan li keça xwe dike û dibêje: *“Keça min, me qûmikê ji bîr kirye. Here malê û qûmikê hingire bîne. Heger xalê te ji te nan filan bixwaze nede wî. Qûmikê hingire û bi*

¹²⁷ Serguh: guh û çav lê bûn, lê miqate bûn

zû were.” Beyrema cara din şîretan li kurê xwe dike û kurê xwe dişîne malê ji bo sabûnê. Jê ra dibêje: *“Kurê min, me sabûnê jî ji bîr kirye, vê carê dora te ye. Here li mal û sabûnê hingire, bîne. Heger xalê te ji te xwarin bixwaze bêje ez nadim, ti tişt nede xalê xwe, lez bike û were”*. Beyrema bi vî avayî şîretan dike.

Di **Çîroka Herdemcanê** da dê û bavê Herdemcanê dixwazin biçin hecê. Pêşiya ku biçin hecê şîretan li keça xwe dikin ku keça wan heta ew ji hecê vegerin hînî quranê be. Jê ra dibêjin: *“Keça min, haja xwe û mala xwe bimîne, qurana xwe bixwîne heya em vegerin. Ev mal, xulam her tişt emanetê te ye.”* Piştî van şîretan dê û bav rê dikevin.

Di **Çîroka Hespa Xweliyê** da keçik dixwaze ku biçe li ba birayên xwe. Lê ji ber ku gundê birayên wê li wir in dûr e diya keçikê ji keça xwe ra hespekê ji xweliyê çê dike. Dê keçik bi hespa xweliyê rê bikeve. Dayik şîretan keça xwe dike û dibêje, çî dibe bila bibe lê tu ji hespê ra nebêje *“bisekine”*. Heger tu ji hespê ra bêjî *“bisekine”* dê hespa te vegere xweliyê. Pêşiya rêkirina keça xwe dayik bi vî avayî şîretan lê dike. Di çîrokê da em dibînin ku şîretên dayikan çiqas girîng in. Çimkê keçik ji bîr dike û ji hespê ra dibêje *“bisekine”*. Ew çax wekî diya wê jî gotibû hesp vedigere xweliyê.

Di **Çîroka Mîrza Miheme û Qîza Qarqarê Çîne** da dema Mîrza Miheme şîrê pîrê vedixwe êdî dibe kurê wê. Pîra mirovxwar Mîrza Miheme wek kurê xwe dihesibîne û ti zerar nade wî. Mîrza Miheme dixwaze biçe li ba qîza qarqarê Çîne lê hin astengî di wê rêyê da hene. Pîrê libûlib ji Mîrza Miheme ra dibêje gelo divê çî bike an çî neke: *“Kurê min, here dê çemeke avê derkeve pêşiya te. Dema tu ketî di nav wê avê da ew av wekî kêrê û şûrê tûj e, lê tu bêje çiqas aveke nerm e, xweş e, spehî ye, paqij e. Ew çax dê ew av ji bo te bibe aveke nerm û zirar nade te. Bi ser da qemçeke ji wê avê bixe di nav singê xwe da. Bi vî avayî dê ew av li te nerm bibe û tu dabor bî biçî. Dema tu ji avê derbas bî dê zeviyêke dar û dirîkan derkeve pêşiya te. Here û destê xwe bide wan dirîkan û bêje çiqas dirîkên sipehî ne, paqij in, nerm in mîna pembûyê. Bi ser da piçek ji wan dirîkan jî bêxe di nav singê xwe da. Dê ew ji bo te bibe wek pembû. Ji wir jî derbas be tu yê mala qîza qarqarê bibînî. Li ber deriyê malê aliyeke gur girê dane aliyeke jî mih. Giya danîne li ber gurê goşt danîne li ber mihê. Tu giyaya pêşiya gurê bide pêşiya mihê, goştê pêşiya mihê bide pêşiya gurê. Ew çax ew ajal têkilê te nabin û tu jî ji deriyê derbas bibe û here. Dema tu ketiyê hundir heft derî girtiye heft derî vekirî. Wan heft deriyên girtî veke, deriyên vekirî jî bigre. Dema tu ji wir jî derbas bî keça qarqarê*

Çînêli ser cihê xwe razayî ye, li ber serê wê sewîlekê¹²⁸ heye, sêvek sor li ser sewîlê ye û tas jî li wir e. Heger tu bikarî wê tasê bînî zaf baş e.” Mîrza Miheme guhdariyê şîretên pîrê dike û saya van gotinan bi ser dikeve û digehêje mirazê xwe. Dîsa di heman çîrokê da Mîrza Miheme dixwaze vegere biçe warê bavê xwe. Li wir dîsa pîrê rê nîşanê Mîrza Miheme dide û şîretan lê dike. Mîrza Miheme bi alîkariya pîrê digehe mirazê xwe û diçe mala bavê xwe.

Di **Çîroka Mîrza Miheme** da Mîrza Miheme û birayên wî diçin li ba diya xwe û ji diya xwe ra dibêjin em ê biçin li ber dara sêvê nobet bigirin gelo kî ye her sal tê û sêvên me dibe. Diya wan ditirse û dibêje: *“Kurên min, neçin. Dinya ye, belkî li wir yekî we bikujîne. Em nizanin dibe ku karwan sêvên me dixwin. Ji bo sêvekê neçin û xwe nexin di nav talûkê da.”* Dayik bi vî avayî şîretan li zarokên xwe dike û dixwaze wan ji talûkeyan biparêze.

Di **Çîrokên Şengê Pengê Alîçengê, Şengê û Pengê, Zengilo Mengilo** da şîretkirina dayikê gelek eşkere¹²⁹ ye. Ev hersê çîrok ji aliyê mijarê ve dişibin hevdû. Tenê varyantên wan cuda ne wekî din çîrok yek e. Di nav van hersê çîrokan da jî dayik/bizin ji kehrikên/zarokên ra şîretan dikin ku deriyê xwe ji gurê/hirçê ra venekin. Di **Çîroka Şengê Pengê Alîçengê** da bizin dibêje heta hûn van gotinên min seh nekin derî ji ti kesî ra venekin: *“Şengê Pengê Alîçengê/ Diya we çûye zozanan /Tijî şîr e li ber guhanan /Giya li ber sitr û diranan/ Derî ji dadê ra vekin dadê hat”*. Di **Çîroka Şengê Pengê** da bizin ji zarokên xwe ra dibêje heta hûn vê stranê seh nekin deriyê venekin, wekî din dê gur we bixwe. *“Şenga min, penga min/ Diya we çûye zozanan/Xwarîye pelê qizwanan/ Şîr ketîye guhanan/ Zû kin, lez kin werin danan”*. Di **Çîroka Zengilo Mengilo** da jî heman tişt derbas dibin û bizin ji kehrikên xwe ra şîretan dike ku hirç zarokên wê nexwe. Di vê çîrokê da şîretên bizinê bi vî avayî ye: *“Zengilo Mengilo/Derî veke ji dadê re/ Dadê çûye zozanan/ Tijî şîr e guhanan/ Qeftek giya li ber sitr û diranan”*.

Di **Çîroka Xelîl Beg û Tîlî Eyşan** da diya Tîlî Eyşan pêdihese ku Xeloyê mirtip hatiye keça wê dixwaze, ji mêrê xwe ra dibêje ew Xelîl Beg nîn e. Lê mêrê wê jê bawer nake. Ew çax jin ji mêrê xwe ra dibêje: *“Here û jê ra bibêje, heger heft sal ji me ra şivantî bike em ê keça xwe bidin; heger şivantî neke tu keçê danemêr li ba me tune. Heger Xeloyê mirtip bibe dê qebûl bike şivantiyê, lê heger Xelîl Beg be dê bêje “Ez xwediyê çil xulamên im, ezê çawa şivantiyê ji we ra bikim” û dê biçe.”* Piştî van şîretan

¹²⁸ Sewîl: cêr, cer

¹²⁹ Eşkere: berçav, diyar

bavê Tîlî Eyšanê diçe van gotinan ji Xeloyê mirtip ra dibêje û Xelo daxwaziya wan qebûl dike. Bavê Tîlî Eyšanê bi saya jina xwe rastiyan dibîne.

Di **Çîroka Çeleka Zerî** da piştî Fatma siphên serê pîrê paqij dike pîrê hin gotinan ji Fatma ra dibêje û şîretan lê dike. Pîrê ji Fatma ra dibêje: *“Keça min here li newala li ba mala we. Li wir du av hene. Yek reş e yek jî spî. Nêzê ava reş nebe lê bi ava spî tu çiqas dikari xwe bişû.”* Fatma guhdariyê pîrê dike û diçe bi ava spî xwe dişû. Piştî şuştine Fatma sipehîtir dibe. Lê aliyekî din pîrê ji Eyşo dixwaze ku siphên serê wê paqij bike. Eyşo gotina pîrê bi cih nayne. Ew çax pîrê şîretan li Eyşo dike lê ev şîret bi xirabbûna Eyşo dawî dibe. Eyşo bi ava reş xwe dişû û kirêttir dibe.

3.1.3.1.3. Aqilmendî

Di çîrokan da jin bi saya biaqiliyê zaf caran pêşî li xirabiyê digirin. Di **Çîroka Xelîl Beg û Tîlî Eyšanê** da dêya Tîlî Eyšanê ferq dike ku ew kesê hatiye keçxwestinê Xelîl Beg nîn e, xulamê Xelîl Beg e. Jin ji mêrê xwe ra dibêje lê mêrê wê jê bawer nake. Paşê bi saya aqilbûna jinikê mêrê wê jî dibîne rastiye û dizanin ku ew kes Xeloyê mirtip e. Jinik ji mêrê xwe ra dibêje heger xezgînî beriya keçdayînê heft sal ji me ra şivantî bike em ê keça xwe bidin. Heger ew kes Xelîl Beg be daxwaziya me qebûl nake lê heger Xeloyê mirtip be dê qebûl bike û ji bo me heft sal şivantî bike. Gotina jinikê rast derdikeve û Xeloyê mirtip şivantiyê qebûl dike.

Di **Çîroka Şengê Pengê Alîçengê** da bizin ji kehrikên xwe ra dibêje dema yekê derî lêxist guhdariyê bikin gelo strana me dizane an na, dengê wê dişibe dengê min an na û dawiyê li simkê wê binêrin. Heger simkê wê bişibe simkê min paşê derî vekin. Bizin bi vî avayî dixwaze ku kehrikên wê ji guran ra derî venekin.

3.1.3.1.4. Namûs

Namûs ji bo jinan ter him zaf girîng bûye. Gelek çîrokan da jî jin bi xweyîderketina namûsa xwe derdikevin pêşiya me. Zaf caran dayikan ji bo ku namûsa wan nelewite bedelên dijwar dane. Di **Çîroka Herdemcanê** da mijara namûsê bi vê şiklê derdikeve pêşiya me. Dema Herdemcan ji bo hînbûna quranê diçe li ba mela, hîs dike ku armanca mela ne baş e û êdî naçe li ba mela. Wextê dê û bavê Herdemcanê ji hecê dizivirin bavê Herdemcanê diçe li ba mela ku hîs be gelo keça wî xitmequran bûye an na. Li wir mela bêbextiyê li Herdemcanê dike û ji bo namûsa wê gotinên xirab dibêje. Bavê Herdemcanê jî hêrs dibe û ji destê xulamên keça xwe dide kuştin. Xulam Herdemcanê nakûşînin û piştî çend salan Herdemcan jî dibe xweyê du zarokan. Dema

Herdemcan, zarokên wê û xulam di rê da ne vê carê xulam dixwazin ku namûsa Herdemcanê lewitînin. Herdemcan ber xwe dide. Dizane ku çi hatiye serê wê ji meseleya namûsê hatiye. Xulam Herdemcanê tehdît dikin û dibêjin em ê zarokên te bikûşînin lê dîsa jî Herdemcan ber xwe dide, li ber çavên wê zarokên wê dikûşînin lê ew teslîmê wan nabe, ji namûsa xwe nabore.

Di **Çîroka Mîrza Miheme** da, dema Mîrza Miheme ji mala xwe dûr dikeve jina wê dimîne bi tenê. Birayên Mîrza Miheme ji jinbiraya xwe ra dibêjin: *“An tu yê mêr bikî an jî em ê te mehr bikin.”* Jina Mîrza Miheme qebûl nake û bi salan xwe di odeyeke da vedişêre û di destê wê da jî fîncana jehrê heye. Dibêje kê nêzikê min bibe ez ê vê jehrê vexwim û xwe bikuşînim. Jina Mîrza Miheme bi vî avayî ji namûsa xwe nabore û li benda mêrê xwe dimîne.

3.1.3.1.5. Gunehbûn

Piranî di çîrokan da dema jin dimînin bêmer an jî pîr dibin guneh dibin. Hin çîrokan da jî mêr serdest in û jin nikarin li ba mêrê xwe tiştêkî bêjin. Di **Çîroka Dirkê** da diya Dirkê kesê kor û pîr e. Dema jinbiraya Dirkê bêbextî li Dirkê dike diya Dirkê jê bawer nake û keça xwe diparêze. Dizane ku keça wê namûsa xwe nelewitandiyê. Lê birayên Dirkê ji jinbirayê bawer dikin û guhdariya diya xwe nakin. Bira ligel dê û bavê xwe xwişka xwe ya Dirkê di mal da bitenê dihêlin û şevêkê mala xwe bar dikin û diçin.

Di **Çîroka Dara Leyl û Reqqesê** da jina padişahê avis e û cêwîkên wê çêdibin. Pîrê ji hesûdiyê wan cêwîkan xef dike û şûna wan du cewrikên seyê dide nişanê padişahê û ji padişahê ra dibêje jina te cewrikên seyê aniyê. Padişah hêrs dibe û dibêje xulaman ra dibêje: *“Dê jina min heya dawîya emrê xwe li meydanê bisekine, nehêlin ku bimire û kê ji ba wê derbas be dê tûk bike rûyê wê.”* Jina padişahê ewqas guneh e ku nikare xwe biparêze jî. Dayik heta dawîya emrê xwe di wê halê da dimîne û ti wextê cêwîkên xwe nabîne.

Di **Çîroka Herdemcanê** da dema mela bêbextiyê li Herdemcanê dike bavê Herdemcanê ji mela bawer dike lê diya wê jê bawer nake û keça xwe diparêze. Wextê bavê Herdemcanê biryar dide ku keça xwe bide kuştin diya Herdemcanê digirî, hawar dike lê nikare mêrê xwe iqna bike. Tu tişt ji destê dayikê naye.

Di **Çîroka Kalikê Têş** da jî em gunehbûna dayikê dibînin. Dema diya keçan seh dike ku dê mêrê wê keça xwe bide yekî kal, dê zaf xemgîn dibe. Naxwaze ku keça wê

yekî kal bistîne. Çi dike nake nikare mêrê xwe iqna bike û Kalikê Têş tê û keça wê dibe. Dê her çiqas berxwe bide jî nikare wan û keça wê diben.

Di **Çîroka Senem Xanim û Hiseyn** da dema dê û bavê Hiseyn seh dikin ku Hiseyn miriye, diqehirin, dikin girîn û hawar. Dêya Hiseyn ji kerba kurê xwe ewqas digirî, xem dike ku nexweş dibe paşê canê xwe dide, dimiri.

3.1.3.1.6. Xirabbûn

Di çîrokan da di nav taybetiyên dayikan da xirabbûn zêde cih nagire lê belê hin çîrok hene ku di nav wan da dayik baş xuya nake. Piranî divan çîrokan da dayik an pîrê ye an jî jinbira. Pîrê wek “pîra miroxwar”, “pîrhevok”, “pîrhebok” derdikeve pêşiya me. Ew jî ji ber ku insanan dixwin wek dayikên nebaş tên binavkirin. Ya din “jinbira” ne ku piranî neheqiyê li dişa xwe dikin û xirabiya dişa xwe dixwazin.

Di **Çîroka Hespaxweliyê** da dema keçik ji bo agirê diçe malekê li wir keça malê wê keçikê pê dide hesandin ku dêya wê pîrhevtar e û insanan dixwe. Guneha wê li keçikê tê û ji keçikê ra rastiyan dibêje ku diya wê ya pîrhevtar keçikê nexwe. Jê ra dibêje: *“Tu çima hatî li van deran, diya min pîrhevtar e, insanan dixwe, ev sîtil hemû goştê insanan e, niha razayî ye diya min, heger rabe dê bêhna te seh bike û te bigre bikuşe.”* Di vê çîrokê da dayik him pîrhevtar e him jî miroxwar. Em dikarin bibêjin ku li vir dayik bi taybetiya xwe ya xirabbûnê derdikeve pêşiya me.

Di **Çîroka Nîsko** da jî dayik bi heman şiklî derdikeve li pêşiya me. Di vê çîrokê da dayik “pîrhevok” e û insanan dixwe. Pîrhevok bi hîleyan Nîsko dixapîne û dibe mala xwe. Dema keça pîrhevokê pê dihesse ku diya wê zarokê aniyê û dê wî zarokê bixwe ji Nîsko ra rastiyan dibêje. Bi saya keça pîrhevokê Nîsko ji destê pîrhevokê difilite û bi alikariya keça pîrhevokê pîrhevok nagehe mirazê xwe. Di vê çîrokê da jî dayik wek “pîrhevok”ê derdikeve pêşiya me û dibe minaka dayikên xirab.

Di **Çîroka Ehmedê Beyrema** dadema Beyrema dibe dayik zaf xirabiyan li birayê xwe Ehmed dike. Wisa dike ku birayê wê wek seyan li ber deriyê mala xwe dide girêdan û hestiyên goştan diavêje li berê wê. Di vê çîrokê da dayik ne “pîrhevok” e ne jî “jinbira”. Dayik xwişk e û di dawiya çîrokê da zaf neheqiyên li birayê xwe dike.

Di **Çîroka Eysê û Mamê Hirç** da dema birayên Eysê tên û xwişka xwe difilitînin ew çax heft lib têtîk jî li wir hene. Ew zarokên Eysê û Mamê hirç in. Birayên Eysê dixwazin ku têtîkan bikuşînin û Eysê jî qebûl dike. Tenê dibêje ku bila liba piçûk

bimîne. Di vê çîrokê da jî ji ber ku dayik dihêle zarokên wê bên kuştin, em dikarin bibêjin ku ew dayik jî dikeve di nav kategoriya dayikên xirab da.

3.1.3.2. Dêmarî/Jinbav

3.1.3.2.1. Xirabbûn

Dêmarî an jî jinbav di her çîrokê da wek kesên xirab, hesûd, nebaş, fêlbaz, hîlekar xuya dikin. Zaf caran bi hîleyan nevisiyên xwe ji destê bavê wan didin kuştin. Di hin çîrokan da jî hesûdî dikin û dixwazin ku keça wan jinevisiyên wan baştir, sipehîtir, jêhatîtir be. Em dikarin bi gelemperî bibêjin ku dêmarî di çîrokan da ji nevisiyên aciz in her tim.

Di **Çîroka Çêleka Zerî û Fatma Xanim û Lêvres** da motîfa dêmariyê gelek berbiçav e. Ji xwe ev her du çîrok ji aliyê mijarê ve yek in, varyantên heman çîrokê ne. Di **Çîroka Çêleka Zerî** da Fatma nevisî ye. Dêmariya Fatma û zirxwişka Fatma hîç ji Fatma hez nakin. Dema kurê paşê dixwazê pêlava wînda bi Fatma jî bide ceribandîna dêmarî û zirxwişk naxwazin û aciz dibin. Dema xêl tê ku Fatma ji kurê paşê ra bibe dêmarî keça xwe dide li ser mexfûrê û Fatma dide li binê tenûrê ku ji şûna Fatma keça wê bibe bûka paşê. Dêmarî hesûdiyê dike lê dawîya çîrokê da nagehe mirazê xwe. Fêl û leyistokên wê derdikevine li ser rûyê dinê.

Di **Çîroka Fatma Xanim û Lêvres** da jî rewş bi heman awayî ye. Di vê çîrokê da navê keça dêmariyê Lêvres navê nevisiyê Fatma ye. Lêvres keçeke sipehî nîn e lê Fatma ewqas sipehî ye ku zirxwişk û dêmariya Fatma hesûdiyê lê dikin. Dema kurê mîrê îskapîna Fatma dibîne û dixwaze xweyê îskapînê hînî be dêmariya Fatma nahêle ku Fatma biceribîne. Ji xulamên kurê mîrê ra dibêje: *“Ev îskapîn ya Fatma nîn e, ew feqîr e bê kes e. Dê Fatma vê îskapîne ji kû ve bîne?”* Lê dêmarî nagehe mirazê xwe û kurê mîrê îskar dibe ku Fatma jî wê îskapînê biceribîne. Dema Fatma biceribîne îskapîn tam li gorî pê Fatma dibê û wê çaxê dêmarî û zirxwişk diqehirin. Çimkî kurê mîrê dê ligel Fatma bizewice. Piştî zewacê jî hesûdiya dêmariyê dewam dike û rojekê şeheke bijehrî dibe û pê wê şehê pora Fatma şeh dike. Dema şeh li pora Fatma dikeve Fatma dizivire kevokekê û ji pacê difire, diçe. Di vê çîrokê da jî hesûdî û xirabiya dêmariyê eşkere ye.

Di **Çîroka Dêmariyê** da jinbava zarokan yeke pir xirab e û ji zarokan qet hez nake. Ewqas ji zarokan nefret dike ku dixwaze zarokan ji destê bavê wan bide kuştin.

Rojeke ji mêrê xwe ra dibêje: *“Ez çûm li ba mela. Mela ji min ra got kurikê ser jê bikin û bidin li serê zeviyê; keçikê ser jê bikin û bidin li binê zeviyê. Ew çax dê genimê we hêşîn be û çêbe.”* Jinbav bi van gotinan mêrê xwe dixapîne ku mêrê wê zarokan bikuşîne.

Di **Çîroka Ehmedê Beyrema** da jî motîfa dêmariyê heye. Dêmariya Ehmed û Beyrema yeke xirab bûye û her tim li zarokan daye. Rojekê dîsa dêmarî li wan dide û ew jî dixwazin ku ji destê dêmariya xwe xilas bin û rê dikevin diçin. Ji rûyê dêmariyê tiştên xirab têne serê wan zarokan. Di vê çîrokê da jî dêmarî bi xirabbûna xwe derdikeve li hemberê me.

3.1.3.2.2. Hesûdî

Hesûdiya dêmariyan di nav çîrokên me da gelek eşkere ye. Bi taybetî di **Çîroka Fatma Xanim û Lêvres** da dêmariya Fatma zaf hesûdiyê dike. Pêşi gazî li Fatma nake ku Fatma îskapîne biceribîne. Hesûdiyê dike, dixwaze ku îskapîn li gorî pê keça wê be û kurê mîrê keça wê bistîne. Di dawiya çîrokê da Fatma zewicandî ye û diya kurekî ye lê hêj jî dêmarî hesûdîyan dike. Bi şeha jehrîkirî pora Fatma şeh dike ku Fatma bimire. Axir hesûdiya dêmariyê naqede.

Di **Çîroka Çeleka Zerî** da jî dêmarî hesûdiya nevisiya xwe dike. Dema kurê paşê dixwaze bi Fatma ra bizewice û xêlê dişîne mala wan dêmarî hesûdiyê dike û Fatmayê di bin tenûrê da xef dike. Keça xwe ya Eyşo dide li ser mexfûrê ku wek bûk wê bibin. Lê dawiya çîrokê da hîleyên dêmariyê eşkere dibin û dêmarî nagehe mirazê xwe.

Ji xeynî dê û dêmariyê, di hin çîrokan da jin jî (her çiqas em nizanin ku dayik in an ne) xwediyê xisletên xirab in. Em dixwazin bi çend mînakên li ser wan jî bisekinin. Di çîrokên me da jinbira jî hin caran xirabîyan dikin. Bi taybetî di **Çîroka Dirê** da jinbira îftirayeke mezin li Dirê dike. Ji birayên Dirê ra dibêje ku Dirê namûsa xwe lewitandiye. Jinbira bi dek û dolaban birayan iqna dike ku Dirê xirabîyan kiriye. Dema fîstana Dirê bi ava tûtirkan qirêj dibe jinbira wê fîstanê xef dike û dide nîşanê birayên Dirê ku jê bawer bikin. Jinbira bi vî avayî dibe sedema terikandina Dirê. Di vê çîrokê da jinbira bi taybetiya xwe yê xirabî, fesadî, derewkerî derdikeve pêşiya me.

Di **Çîroka Marê** da jî lehenga xirab jinbira ye. Jinbira ji dişa xwe hez nake û naxwaze diş bi wan ra bijî. Ji bo ku dişê ji mal dûr bike di derheqê keçikê da tiştên xirab

ji birayên keçikê ra dibêje. Rojêke jinbira mareke piçûk dixê di nav sewîlê da û keçik ji wê avê vedixwe û mar jî diçe di nava zikê keçikê da. Roj bi roj zikê keçikê mezin dibe û jinbira ji mêrê xwe ra dibêje: *“Xwişka te xwe rezil kirye, ji yekî avis maye, xwişka xwe bikuşîne û namûsa me paqij bike.”* Bira ji jina xwe bawer dixe û xwişka xwe dibe li ser çiyayekî bi tenê dihêle û vedigere.

Di van herdu çîrokan da jinbira dişibin dêmariyan. Neheqî li dişê xwe dikin û dibin sedema tiştên xirab ku têne li serê keçikan.



ENCAM

Em bi hêsanî dikarin bêjin ku dewra çîrokan hema hema qediya. Îro li gundên dût, gundên ku wesât jî naçin di her malekê da televîzyonekê heye. Ev televîzyon jî windabûna çanda çîrokgotinê da rolên sereke dileyîzin. Xêzefilm ji çîrokan zêdetir bala zarokan dikişînin û zarok ji bo guhdarkirina çîrokan li derdorê kal û pîrên xwe nacivin êdî. Kal û pîrên ku wextekî çîrokan dizanîn wan jî ji ber ku ji ti kesî ra nabêjin ji bîr kirine çîrokên wextekî.

Divê li çîrokan tenê wek cureyeke wêjeya gelêrî neyê temaşekirin. Çîrok ji bo zimên gencîneyên gelek girîng in. Zarok bi saya çîrokan peyv û biwêjên nû, gotinên pêşiyar, dab û nêrîtan, jiyana civakê ya wextekî hînî dibin. Çîrok wek mamosteyan, di vegotinê da van tiştan bi zarokan didin hînîkirin ku haja wan jî jê tune ye. Ew zarokên ku bi çîrokan mezin dibin piştî salan xwediyê gencîneyên peyvan dibin û bi saya çîrokan ji çanda xwe dût namînin. Di wextê çîrokberhevkirinê da tiştêkî bala me kêşand. Hin peyv hene ku di jiyana rojane da nayên bikaranîn lê xwerû bi kurdî ne, wekî şareza, xelat, xemgîr, kevanî... Kesên çîrokbêj di axaftina rojane da wan peyvan bi kar naynin lê dema çîrokê dibêjin di çîrokê da wan peyv û gotinan bi kar tînin. Ew peyv di mejiyê wan da mane. Ev jî girîngiya çîrokan careke din berçav dike.

Di berhevkariya çîrokên Hîzanê da me gelek çîrok, efsane, hekayetên gelêrî tomar kirin lê di van da ji ber ku mijara me Çîrokên Hîzanê bûn me çîrokan ji cureyên din bijart. Di nav van çîrokan da jî di her çîrokê da jî motîfa dayikê tune bû lewma me yên ku tê da motîfa dayikê hene bijart. Ew çax tenê 21 lib çîrok man û di nav van çîrokan da jî çend çîrok varyantên hev bûn. Ji ber ku hin guherîn hebûn di nav van varyantan da me varyantên heman çîrokê jî nivîsand. Di berhevkirina çîrokan da me fêm kirku heger ev çîrok neyên qeydkirin wisa xuya dike ku dê demeke kin da yên hene jî bîn jibîrkin. Ji ber ku kesên emrê wan li ser 70an e ji xwe çîrokan bi temamî ji bîr kirine. Kesên navser jî hin çîrokan dizanin lê dema dibêjin tevlihev dikin. Ji xwe yên xort ji kêman kesan pêştir qet çîrok nizanin. Ev rewş jîgirîngiya berhevkirina çîrokan diyar dike. Gelek kesên çîrokbêj ji me ra çîrokan gotin lê hemû çîrok kêra me nehatin. Lewma çîrokbêjên me yên ku çîroka wan hatiye nivîsandin tenê 11 kes in. Ew çîrokên ku me di teze da bikaranî hemû ji aliyê me ve hatin tomarkirin, yek çîrok ji cihekî din nehat wergirtin.

Em dikarin encama teza xwe bi vî awayî şîrove bikin.

- Beriya ku me tezê nivîsand me mînakên xebatên qadî xwend (wek Mehmet Tuğrul, Mahmutgazi Köyünde Halk Edebiyatı; Esmâ Şimşek, *Yukarıçukurova Masallarında Motif ve Tip Araştırması*) û wan ji me ra rêberî kirin. Di nav tezan da mînaka teza me tune bû; belê gelek kes li ser çîrokan xebitîne lê tu kes li ser mijara “di çîrokan da motîfa dê” nesekiniye. Dibe ku teza me jî ji hin kesên din ra bibe mînak.
- Me di berhevkirina çîrokan da dît ku navçeya Hîzanê ji aliyê çanda devkî ve gelek dewlemend e, em dikarin çîrokên ku me di teza xwe da bi kar anî wek mînak bidin nîşan.
- Jin û dayik him di jiyanê rojane da him di çîrokan da lehengên girîng in. Girîngbûna jinê/dayikê di cureyên wêjeyê yên din da jî bi awayekî hêsan xuya dike.
- Divê hêj ku nehatine jibîrkirin, berhemên çanda devkî bi xebatên qadî bîn berhevkirin, mînak bîn qeydkirin û nivîsandin. Berhemên wêjeya devkî bi vî awayî dê bikarin li ber windabûnê ber xwe bidin û bijîn.
- Wek dawî ji bo berhevkirina çîrokan digel nêzikê pêncî kesan hevdiîtin hate kirin lê tenê danzdeh kesan ji me raçîrokên ku tê da motîfa dayikê heye gotin.

ÇAVKANIYÊN DEVKÎ/ÇÎROKBÊJ

Dema di derheqê çîrokbêjan da agahî hatine dayîn ev rêz hatiye şopandin:

1. Nav û paşnavê çîrokbêjê
2. Emrê wê/î
3. Rewşa xwendekariyê
4. Çîrokê ji kê guhdar kiriye
5. Karê wê/î
6. Gundê wê/î

Agahiyên di derheqê çîrokbêjan de:

1. Qiymet Yilgin

52 salî

Xwenda nîn e

Ji diya xwe

Bermalî

Dûrya Merwanan

2. Fehmê Dîkmen

63 salî

Xwenda nîn e

Ji dapîra xwe

Bermalî

Şembelût

3. Semra Yaldiz

27 salî

Xwenda ye

Ji kekê xwe

Bermalî

Giran

4. Mukaddes Kaya

38 salî

Xwenda nîn e

Ji gundiyan

Bermalî

Pelesor

5. Emîne Kaplan

64 salî

Xwenda nîn e

Ji jinxala xwe

Bermalî

Kelhok

6. Hediye Çetin

75 salî

Xwenda nîn e

Ji dapîra xwe

Bermalî

Kemalan

7. Maqbûle Taşyürek

70 salî

Xwenda ye

Ji diya xwe

Bermalî

Kelhok

8. Ayşe Aydemîr

60 salî

Xwenda ye

Ji diya xwe

Bermalî

Çûk

9. Îbrahîm Ceylan

83 salî

Xwenda nîn e

Ji dapîra xwe

Cotkar

Pûrmê

10. Yadîgar Yaraşlı

20 salî

Xwenda ye

Ji dapîra xwe

Xwendekar

Qursinç

11. Necla Yaraşlı

46 salî

Xwenda nîn e

Ji dapîra xwe

Bermalî

Qursinç

12. Safiye Akhan

44 salî

Xwenda nîn e

Ji diya xwe

Bermalî

Nûh/ Nih

ÇAVKANÎ

- Akyol,Hîlmî: *Keçelikê Serdar*, Weşanên Do, İstanbul, 2006
- Alakom,Rohat:*Di Folklorê Kurdî da Serdestiyeke Jinan*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2009
- Albayrak,Nurettin: *Ansiklopedik Halk Edebiyatı Sözlüğü*, Kapı Yayınları, İstanbul, 2010
- Alkan, Abbas: *Çîroka Rovî û Gur*, Weşanên Elma, İstanbul, 2003
- Alptekin, Ali Berat: *Halk Bilimi Araştırmaları*, Akçağ yayınları, Ankara, 2015
- Alptekin, Ali Berat: *Taşeli Masalları*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2002
- Arda, Akîf: *Hirç û Pirç*, Weşanên Dozê, Stenbol, 2010
- Artun, Erman: *Türk Halk Edebiyatına Giriş*, Kitapevi Yayınları, İstanbul, 2009
- Artun, Erman: *Anonim Türk Halk Edebiyatı Nesri*, Kitapevi yayınları, İstanbul, 2009
- Balcı, Ali: *Sosyal Bilimlerde Araştırma*, Akademiya Pegem, Ankara, 2009
- Bedirxan, Celadet Alî: *Ferheng (Kurdî-Kurdî)*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2009
- Bilkan, Ali Fuat: *Masal Estetiği*, Timaş Yayınları, İstanbul, 2009
- Bingöl, Abdulkadir: *Gotinên Pêşiyên û Biwêjên Botan*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2005
- Birinci, Necati: *Türk Edebiyatı Ansiklopedisi*, Tercüman Yayınları, İstanbul, 1985
- Boratav, Pertev Naili: *Az Gittik Uz Gittik*, İmge Kitapevi Yayınları, Ankara, 2009
- Boratav, Pertev Naili: *Halk Hikayeleri ve Halk Hikayeciliği*, Weşanên Adam, İstanbul, 1989
- Boratav, Pertev Naili: *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, Bilgesu Yayınları, Ankara, 2004
- Bozarslan, M. Emîn: *Gurê Bilûrvan*, Weşanên Deng, Stenbol, 2000

- Bozarslan,M. Emîn:*Pepûk*, Weş. Deng, Diyarbekir, 2006
- Bozkurt,Kenan:*Kürt Masallarının Yapısal Özellikleri*, Kimlik Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl, 2013
- Ceylan,Ömür: *Tasavvufî Şiir Şerhleri*, Kitapevi Yayınları, İstanbul, 2000
- Çağbayır,Yaşar:*Ötüken Türkçe Sözlük*, Ötüken Yayınları, İstanbul, 2007
- Çetîn, Nejat:*Pixço*, Weşanên Pêrî, İstanbûl, 2003
- Çiçek,Hasan:“*Hizan'ın Kültürel Zenginliğinin Tarihsel Arka Planı*”,*I. Uluslar arası Düünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu Bildirileri Kitabı*, Weş. Beyan, İstanbul, 2007
- Çiçek, Hasan: *Hizan: İlim ve Alim Havzası*, Müspet Hareket Sayısı, Sal:2016, Jimare: 1
- Çîrokên Kurdî *Senem Xanim*, Berhevkar Hilmî Akyol, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2000
- Çobanoğlu,Özkul:*Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*,Akçağ Yayınları, Ankara, 2005
- Çolpan,Rıza:*Çîrokên Gelî*, Weşanên Dozê, İstanbul, 2007
- Demir,Bünyamin:*Çîrokên Kurdî Li Gorî Motîf Îndeksa Stith Thompson (Bi Nimûneyên Çîrokên Mîrze Mihemed)*,Teza Lîsansa Bilind (Neweşandî), Mêrdîn, 2016
- Deniz,Hüseyin:*Ji Çîrok û Çîvanokên Kurdan*, Weşanên Aram, Stenbol, 2013
- Devellioğlu, Ferit:*Osmanlıca Türkçe Ansiklopedik Lûgati*, Ankara, 1993
- Doğan,D.Mehmet:*Büyük Türkçe Sözlük*, Pınar Yayınları, İstanbul, 2005
- D.Îzolî: *Ferheng (Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî*, Weşanên Deng, Amed, 2007

- Ege,Fatih:*Masallarda Bilincin Dönüşümü ve Dönüştürülmesi*, Kültür Ajans Yayınları, Ankara, 2016
- Elçin,Şükrü:*Halk Edebiyatına Giriş*, Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1986
- Farizov, I.O.:*Türkçe-Kürtçe Sözlük*, Weşanên Özge, Ankara, 1994
- Fidan,Mesut:*Çirokên Gelêrî Ji Herêma Botan*, Weş. Berbang, Stenbol, 2014
- Günay,Umay:*Elazığ Masalları (İnceleme)*, Erzurum, 1975
- Günay,Umay Türkeş: *Elazığ Masalları ve Propp Metodu*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2011
- Günay,Umay:*Türk Dünyası El kitabı, Masal*, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü Yayınları, c. III, Ankara, 1992
- Grûba Xebate ya Vateyê:*Ferhengê Tirkî-Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, Stenbol, 2001
- Jiyan,Adar:*Raveya Peyvan*, Weşanên Pêrî, Stenbol, 2005
- Kabaklı,Ahmet:*Türk Edebiyatı I*, Türk Edebiyatı Vakfı Yayınları, İstanbul, 2008
- Kaya,Doğan:*Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimler Sözlüğü*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2010
- Kunos,İgnacz:*Türk Halk Edebiyatı*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2001
- Kudret,Cevdet:*Örnekli Türk Edebiyatı Tarihi*, T.C Kültür Bakanlığı, 1995
- Mazî,Çiya:*Ferhenga Gotinên Pêşyan*, Weşanên Elma 38, Stenbol, 2005
- Mazi, Çiya:*Baxek Ji Folklorê Kurdî*, Weşanên Berbang,Stenbol, 2014
- Naci,Muallim:*Lugat-i Naci*, Çağrı yayınları, İstanbul, 1995
- Oncu,Mehmet:*Gotinên Pêşyan*,Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2009

- Pertev,Ramazan:*Zarok û Çîrok*, Weşanên Dozê, Stenbol, 2008
- Propp,Vladimir:*Folklor Teori ve Tarih*,Avesta Yayınları, İstanbul, 1998
- Propp,Vladimir:*Masalın Biçimbilimi*, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul, 2011
- Sadinî,M. Xalid:*Çîrokên Gelêrî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2013
- Sakaoğlu, Saim:*Gümüşhane ve Bayburt Masalları*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2002
- Sakaoğlu,Saim:*Masal Araştırmaları*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2007
- Şerefhan:*Şerefname*, wer. M. Emîn Bozarslan, Weşanên Deng, Diyarbakır, 2006,
- Şimek,Esma:*Yukarıçukurova Masallarında Motif ve Tip Araştırması*, T.C Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, 2001, I.Cilt
- Şirin,Mustafa Ruhi:*Klasik Masaldan Sanat Masalına*, Dergah, Sayı: 1, Mart 1990
- Tan, Nail:*Folklor (HalkBilimi) Genel Bilgiler*, Ankara yayınları, İstanbul,1997
- Taner,Nuri:*Masal Araştırmaları*, Art-san Yayınları, İstanbul, 1988
- Tezel, Naki: *Türk Masalları*, Bilge Kültür Sanat Yayınları, İstanbul, 2009
- Türk Dünyası Edebiyat Kavramları ve Terimleri Ansiklopedik Sözlüğü*, Atatürk Kültür Merkezi Başkanlığı Yayınları, Cilt 4, Ankara, 2004
- Türkçe Sözlük*, TDK Yayınları, Ankara, 1988
- Türkçe Sözlük*, Weş. Türk Dil Kurumu, Ankara, 2005
- Tuna,Sibel Turhan:*Türk Masallarının Varoluşçuluk Açısından İncelenmesi*, Muğla Sıtkı Koçman Üniversitesi Yayınları, Muğla, 2014
- Turgut, Harun:*Türkçe-Zazaca Sözlük*, Do yayınları, İstanbul, 2008
- Uslu,Mustafa:*Ansiklopedik Türk Dili ve Edebiyatı Terimler Sözlüğü*, Yağmur Yayınları, İstanbul, 2007

Xamo,Zinarê:*Hebû Tunebû Antolojiya Çîrokên Zarokan*, Weş. Rupel, Stenbol, 2014,

Yardımcı,Mehmet:*Malatya Masalları*, Malatya Kitaplığı Yayınları, Malatya, 2012

Yener,Cemil:*Türk Halk Edebiyatı Antolojisi*, İnkilap Yayınevi, İstanbul, 1989

Yıldırım, Ali;Şimşek, Hasan:*Sosyal Bilimlerde Nitel AraştırmaYöntemleri*, Weş. Seçkin, Ankara, 2004

Yolcu, Mehmet Ali:*Azerbaycan Masallarında Formeller ve Formel Unsurlar*, NEÜ

Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi1, Nevşehir, 2011

Zinar, Zeynelabidin*Kewê Çîrokbêj*, Weş Sîtav, Wan, 2011

PÊVEK

Çîroka Çêleka Zerî

Hebû tunebû rehma li dê û bavê guhdaran bû. Wextekî mêrekî û du jinê wî hebûne. Ji herdu jinên wî jî keçikên wî hebûne. Navê keçeke Fatma navê ya din jî Eyşo bûye. Piştî salan diya Fatma rehma bûye lê diya Eyşo maye. Diya Eyşo ji Fatma ra xirab bûye. Diya Eyşo her roj yekî ji wan dişand li ber dewaran û gilokeke rîs jî dida wan. Dema dor dihata Fatma çêleka wê ya Zerî nedihêşt ku dewar tu derê ve biçin. Liwê pîrekê dihat û ji Fatma ra digot:

- Were sphên li serê min bikuje. Fatma jî gotina pîrê bi cih dianî. Ew çax pîrê ji Fatma ra digot:
- Keça min here li newala li ba mala we. Liwê¹³⁰ du av hene. Yek reş e yek jî spî. Nêzê ava reş nebe lê bi ava spî tu çiqas dikari xwe bişû.

Fatma jî bi wê ava spî xwe dişû û spehîtiya wê zêdetir dibe. Dibe êvar Fatma giloka rîsê jî xilas dike û dizivire mala xwe. Roja din Eyşo diçe li ber dewaran. Lê çêleka zerî nahêle ku Eyşo yek deqîqe rûne û giloka xwe biqedîne. Liwê dîsa ew pîr tê li ba Eyşo û jê ra dibêje:

- Keça min ka sphê serê min bikuje. Eyşo jî dibêje:
- Welleh ez nakujim. Dewar nahêlin ku ez rûnim û giloka xwe biqedînim. Ez ê çawa sphê serê te bikujim. Ew çax pîrê jê ra dibêje:
- Keça min here newala li ba mala we. Liwê du av hene. Yek ji wan spî ye, yek jî reş. Bi ava spî na lê bi ava reş tu çiqas dikari xwe bişû.

Eyşo jî diçe newala li ba mala xwe û bi wê ava reş xwe dişû. Çiqas kirêt be ewqas zêdetir kirêt dibe û qirêj dibe. Çend roj wiha derbas dibin û rojekê Eyşo diçe mala xwe ji diya xwe ra gazindan dike, dibêje:

- Dayê, çêleka zerî nahêle ez rûnim. Diya wê ji keça xwe ra dibêje:
- Mereq neke keça min, em ê çêleka zerî ji bo xêra diya Fatma ser jê bikin û tu yê ji Çêleka Zerî xilas bibî.

Dem a ew diaxivin Fatma xeberdana wan seh dike û zaf xemgîn dibe. Roja din dema diçe li ber dewaran Çêleka Zerî dibîne ku Fatma zaf xemgîn e, ji Fatma dipirse:

- Fatma tu çima xemgîn î îro? Fatma jî jê ra dibêje:
- Dê diya Eyşo te ser jê bike, ez lewma xemgîn im. Çêleka zerî dibêje:

¹³⁰ Liwê: li wir, li wê derê

- Xem neke! Dema wan min ser jê kirin ez ê goştê xwe li wan tehl bikim tenê li te şîrîn bikim. Simkê min, ûrûvîyên¹³¹ min, serê min hemû tiştên min bibe, bêxe derekî û veşêre. Dema cîranan goştê min xwarin hestiyên min jî bîne û veşêre. Paşê dema hefteyeke li ser derbas bû were li min binêre.

Çêleka Zerî ser jê dîkin û goştê Çêleka Zerî Fatma li cîranan belav dike. Dema cîran goştê çêlekê dixwin Fatma hestîyan ji wan distîne û wan hestîyan jî dibe, vedişêre. Goşt ji bo Eyşo û diya wê ra tehl dibe û nayê xwarin. Dêya Eyşo dibêje bila Fatma vê gošta tehl û bêtam bixwe belkî bimire. Lê belê ew nizanin ku gošta çêlekê ji Fatma ra şîrîn e.

Hefteyekê li ser vê buyerê derbas dibe û dibe daweta kurê paşê. Eyşo û diya wê diçin dawetê lê nahêlin ku Fatma jî biçe û Fatma ligel xwe nabin dawetê. Fatma jî diçe ew cihê ku hestiyê Çêleka Zerî veşartibû. Liwê dibîne ku ew hestî, simik, ûrûvî hemû bûne cil, pêlav, zêr... Fatma wan cilan li xwe dike û berê xwe dide dawetê. Li dawetê Eyşo Fatma dibîne û ji diya xwe ra dibêje:

- Ew Fatmaya me nîn e? Diya wê dibêje:
- Naa, ev keç çawa dibe Fatma be.

Şev dibe dereng û Fatma pêşiya wan dibeze ku biçe malê. Dema li ser pirê derbas dibe pêlavê Fatma ji pê wê dikeve li ser pirê. Roja din kurê paşê wê pêlavê dibîne û xeber dişîne li nav bajêr, dibêje: “Çiqas keç û bûk hene bila hemû bîn û vê pêlavê biceribînin gelo li gorî pê kê ye?” Diya Eyşo dema vê dengê seh dike keça xwe hindigire û dibe lê Fatma ligel xwe nabe. Eyşo diceribe lê pêlav jê ra nabe. Liwê ji diya Eyşo ra dibêjin:

- Me seh kirye nevsîyekê te jî heye, ew li kû ye? Te çima wê neanîye?

Dema diçin Fatma tînin Fatma diceribe ku pêlav tam li gorî pê wê ye. Liwê Fatma ji wan dixwazin û Fatmayê nîşan dîkin. Dema ji bo Fatmayê xêl tê Eyşo didanin li ser mexfûrê Fatma didianin di nava tendûrê da. Dîkekî wan jî heye. Dîk dibîne ku Fatma xistine di bin tendûrê da, tê li ba xêlê û dibêje:

- *Qîqlîtûûûût*
Wê Fatma xanim binê tendûrê
Lêwreşa lêwgulik li ser mexfûrê

¹³¹ Ûrûvî: rûvî

Diya Eyşo dibêje herin wê dîkê bikujin, lê nava wan da yekî şareza dibêje ez ê biçim devê tendûrê vekim. Dema diçe devê tendûrê vedike dibîne ku Fatma liwêye û şewq daye tendûrê. Fatma ji tendûrê derdixînin û diben.

Ew liwê digehin mirazê xwe, em jî liha¹³²...

Fehmê Dikmen

63 salî

Xwenda nîn e

Ji dapîra xwe

Bermalî

Şembelût

Çîroka Dara Leyl û Reqqasê

Hebû tunebû wextekî di warekî zaf mezin da padîşahê hebûye. Tenê diltengiya wê padîşahê bêzarokbûna wî bûye. Padîşahê ji jina xwe zaf hez kirye û ji bo ku zarokekî wî çêbe ligel keseke din nezewiciye. Rojekê jina padîşahê çûye li ba pîrekê û ji pîrê ra gotiye:

- Pîrê, tu zana yî, her kes li ba te şîfa dibîne ka tiştêkî bike ku ez ji bo padîşahê him qîzekê him kurekî bînim.

Pîrê jî wextekî xwestiye ku padîşah keça wê bistîne, lê padîşah keça pîrê nesitandiye. Ew maye di dilê pîrê da û pîrê xwe bi xwe ra gotiye ez ê ewda xwe bikim. Ji jina padîşahê rê gotiye:

- Ez ê dermanekê bidim te lê tenê yek şertê min heye. Dema te hemla xwe danî ez ê bêm li ba te. Jina padîşahê qebûl dike, diçe mala xwe û haja wê ji tu tiştê tune.

Piştî mehan jina padîşahê avis dibe û dizanin ku dê cewîkên wê çêbin. Dema jina padîşahê dikeve li ber welidandinê gazî li pîrê dîkin. Pîrê du heb cewrikên seyan ku nû jidayîk bûne dixwe paxila xwe da, xef dike û diçe qesrê li ba jina padîşahê. Dema jina padîşahê hemla xwe danî wan her du cewrikê seyê li şûna cewîkan da dide nîşanê padîşahê. Pîrê ji padîşahê ra dibêje:

- Jina te yekê wiha ye û wan cewrikên seyê ji te ra aniye. Padîşah zaf aciz dibe û dibêje:

¹³² Liha: li vir, li vê derê

- Dê jina min heya dawiya emrê xwe li meydanê bisekine, nehêlin ku bimire û kê ji ba wê derbas be dê tûk bike rûyê wê.

Jina padîşahê diben û li meydanê girê diden; kê ji wê derê derbas be tûk dike rûyê jina padîşahê.

Pîrê, wan her du cêwîkan dixê di nav sandoqekê da û dibe li ber devê behrekê, diavêje di nav behrê da. Ew sandoq li ser avê diçe û dûr dikeve.

Mêrikekî hebû û debara xwe ji masîgirtîne qezenç dikir. Mêrik zaf feqîr bû û yanzdeh lib zarokên wî jî hebûn. Mêrik rojekê li ser behrê sandoqekê dibîne û dibêje teqez ev sandoq ji keştiyan ketiye, belkî rizqê me tê da hebe. Dema sandoqê dibe û devê sandoqê vedike dibîne du zarokên nû ji diya xwe ra bûne di nav sandoqê da ne. Mêrik wan zarokan dihingire û dibe mala xwe. Jina wî qêrîn dide û dibêje:

- Ez nikarim van cêwîkan xweyî bikim, ji xwe yanzdeh lib zarokên me hene ezê çawa tamaşê sêzdehan bikim. Mêrik jina xwe mafdar dibîne û jê ra dibêje:
- Bila, lê pêşî serê wan bişû, kincan li ber wan bike paşê em ê zarokan bibin û bidin kesekî dewlemend ku bikare temaşê wan bike.

Jinik teştikekê tîne û serê zarokan dişû. Dema serê kurikê dişû teşt hemû dibe zêr; dema serê keçikê dişû teşt hemû dibe zîv. Şaş dimînin û êdî zarokan nadin tu kesî, bi xwe xweyî dikin. Ew malbat pir dewlemend dibe û heya zarok dibin panzdeh salî wan zarokan xweyî dikin. Navê kurikê Mîrza Ehmed navê keçikê Fatma didanin.

Rojekê Mîrza Ehmed û zirbirayên wî li derve dileyîzin û paşê şer dikin. Zirbirayê wî dibêje:

- Tu birayê me yê helal nîn î, bavê me we bi zorî xweyî kir, em ji we hez nakin, herin ji mala me.

Mîrza Ehmed zaf aciz dibe û dibêje heger wisa be ez û xwişka min Fatma em ê biçin warekî din. Mîrza Ehmed û Fatma rê ketin û çûn çûn çûne warekî mezin. Ew war warê dê û bavê wan e lê haja wan jê tune. Li hemberê qesra padîşahê wan jî qesrekê mezin çêkirin. Di qesra xwe da mêvanan xweyî kirin, kerwanan mêvan kirin, hatin, çûn... Rojekê pîrê pê dihesê û dibêje ev her du cêwîk ew cêwîk in.

Pîrê rojekê diçe li ba Fatma. Fatma li qesrê bi tenê ye û birayê wê Mîrza Ehmed çûye nêçîrê. Pîrê ji Fatma ra dibêje:

- Fatma, keça min. Bêhna teng nabe? Tu her tim bi tenê liha disekinî. Çawa sebra te tê?

- Naa pîrê, sebra min nayê lê ez mecbûr im. Çi bikim, birayê min her roj diçe nêçîrê û ez jî heta êvarê li benda wî disekinim. Birayê min gotiye dernekeve li derve. Tu li van deran nas naki. Lewma ez jî ji mal dernakevim.
- Heger tu nikarî derkevî derve ew çax darekê heye. Navê wê darê “Dara Leyl û Reqqasê” ye. Ew dar darekê wisa ye ku dema tu bêjî stranan bêje stranan dibêje, dema tu bêjî reqs bike reqs dike, tu çi jê bixwazî wisa dike. Tu wextê naqerime, naweste.

Ev fikr xweşê Fatma diçe. Dema êvarê Mîrza Ehmed ji nêçîrê vedigere Fatma mehdekirî ye. Mîrza Ehmed ji xwişka xwe dipirse:

- Xwişka min, çima tu îro mehdekirî yî? Çi bû?
- Min tiştêkî ji te divê.
- Çi?
- Min Dara Leyl û Reqqasê divê. Mîrza Ehmed şaş dimîne û dibêje:
- Fatma, ew rê rêya çûn û nehatinê ye, em ê çawa bikin?
- Naa, çi be çi nebe min wê divê.
- Bila xwişka min, ez ê sibê rê kevim û ji bo te wê darê bînim.

Roja din Mîrza Ehmed dikeve rê û pir diçe hindik diçe ji warê xwe dûr dikeve. Mîrza Ehmed diçe li ser hewzekê disekine. Liwê dibîne ku di nav hewzê da gustîlkekê ronak heye, dibiriqe. Mîrza Ehmed dibêje ez ê vê gustîlkê ji xwe ra bibim. Dema gustîlkê ji hewzê derdixîne ew gustîlk dibe zilamekî pîr û li pêşiya wî disekine û jê ra dibêje:

- Li min sihr kirine, ez ketime şiklê gustîlkê û ketime di nav vê hewzê da. Te min ji wê rewşê xilas kir. Niha tu çi ji min bixwazî ez ê bikim.
- Ez diçim ji bo Dara Leyl û Reqqasê. Ez ê çawa wê darê ji xwişka xwe ra bînim?
- Tu diçî rêya çûn û nehatinê. Ew rê zaf dijwar e.
- Dizanim lê tenê bila xwişka min şah be. Ez ê biçim.
- Dema tu nêzikê wê darê bî ji ser hespa xwe peya nebe û li pêşiya xwe nenêre, li paşiya xwe nenêre, tenê rasterast here heya tu bigihî wê darê. Dema tu gihayî darê çiqilek jê veke û dîsa li derdora xwe nenêre. Serê xwe bide li ser hespê û bi lezelez ji wê derê bizivire û were.
- Bila, ez ê wisa bikim.

Mîrza Ehmed dewam dike û diçe. Li ser rêya wî hemû dar û ber xeber didin, gazî Mîrza Ehmed dikin lê Mîrza Ehmed serê xwe ranake, tamaşê wan nake, bersiv nade wan. Mîrza Ehmed serê xwe daniye li ser hespê, çûye. Dema çûye li ba darê çiqilek jê vedike û bê bela dizivire. Dema tê malê li ber paceya Fatma wê darê didane, ew dar hêşîn dibe, mezin dibe, ligel Fatma xeber dide. Ji Fatma ra sohbet dike, çîrokan dibêje, stranan dibêje, dileyîze... Êdî bêhna Fatma teng nabe. Her kes methê Dara Leyl û Reqqasê seh dike, kê seh bike tê û lê temaşe dike. Pîrê jî seh dike û dibêje rast e ku Mîrza Ehmed çûye wê darê ji Fatma ra aniye, ez ê biçim dîsa hişê Fatma tevlihev bikim belkî navbera wê û birayê wê xirab bibe. Pîrê diçe li ba Fatma û jê ra dibêje:

- Fatma, tu çawa idare dikî? Ev heya êvarê hiş nabe, diaxive. Ma serê te gêj nake?
- Ez çi bikim? Te ji min ra got Dara Leyl û Reqqasê bixwaze. Birayê min anî lê hiş nabe. Hin caran bêhna min teng dike lê çi bikim.
- Fatma, Dara Çengalê heye. Dema tu dibêjî hişşş ew dar hiş dibe; dema tu bêjî xeber da xeber dide tu çi bêjî ew xeberê te dike.

Dîsa gotina pîrê dikeve hişê Fatmayê, êvarê dema Mîrza Ehmed tê Fatma jê ra dibêje:

- Mîrza Ehmed, min Dara Çengalê divê. Mîrza Ehmed pê dihesse ku yekê tê û van tiştan dixê hişê xwişka wî.
- Ez ê biçim ji bo te Dara Çengalê jî bînim.

Dara çengalê jî li çiyayekî zaf dûr e. Li wê çiyayê daristanekê heye. Li daristanê gurekî heye. Kê biçê wê daristanê ew gur wî parçe parçe dike.

Mîrza Ehmed dîsa dikeve rê, diçe li ser wê hewzê û dibêje belkî ez dîsa wê kalikî bibînim û ew kal alîkarî bide min. Lê wê carê zarokakî piçûk li ser hewzê bûye.

Mîrza Ehmed ji zarokê ra dibêje:

- Tu li vir çi dikî?
- Ez birçî me.

Mîrza Ehmed çi xwarina li ba wî hebe dide zarokê û ji zarokê dipirse:

- Tu li vir çi dikî?
- Ez li benda te me. Min seh kirye ku tu diçî Dara Çengalê.
- Belê rast e.
- Dema tu biçî li ba Dara Çengalê tu yê gurekî bibînî. Heger tu tişteki bikî ew gur te naxwe.

- Divê ez çi bikim. Mîrza Ehmed zaf meraq dike.
- Dema ew gur hate li ba te jê netirse. Heger tu jê bitirsî dê ew hartir bibe. Jê netirse, destê wî bigre û wê bivê.

Mîrza Ehmed dibêje baş e û dewam dike. Pir diçe hindik diçe ji Dara Leyl û Reqqasê derbas dibe û diçe nava daristanê. Liwê gurekî derkeve pêşiya wî. Gurekî mezin. Mîrza Ehmed jê natirse, destê xwe dirêjê destê wî dike. Destê gurê miz dide û ew gur dibe keçeke zaf rind, ciwan, spehî. Mîrza Ehmed çawa keçikê dibîne aşiq dibe. Him keçikê him jî dara çengalê dide li ser piştê hespê û vedigere mala xwe. Dara Çengalê dide Fatma û ligel vê keçikê dizewice.

Rojekê jina Mîrza Ehmed pê dihese pîrê tê li ba Fatma û ji Fatma ra gotinan dibêje. Dema Mîrza Miheme tê malê jina wê jê ra dibêje:

- Hal û mesele wiha ye. Pîrekê tê û Fatma dixapîne. Mîrza Ehmed diçe wê pîrê dihingire û tîne mala xwe, ji pîrê ra dibêje:
- Tu kê yî, çima wiha dikî, çi ji me dixwazî?
- Ev warê ku hun hatine warê bavê we ye. Bavê we padîşah e û lib û lib her tiştî ji wan ra dibêje.

Mîrza Ehmed pîlanekê çêdike, li qesra xwe ziyafetekê mezin amade dike û dibêje ez ê îro padîşahê nas bikim. Mîrza Ehmed gazî li padîşahê dike û padîşah tê ziyafetê. Li nava ziyafetê ji padîşah ra dibêje:

- Padîşah, jinekê te tune bû? Li kû ye jina te? Padîşah xemgîn dibe û dibêje:
- Rast e, jina min hebû. Rojekê jina min avis bû, du heb cewrikê seyan anî, min jî wê li meydanê girê da heta ew mirî.
- Ew her du cewikên seyê bûn an ez û Fatma bûn?

Padîşah şaş dimîne, nizane dê çi bêje. Diçin pîrê tînin û pîrê hemû rastiyan lib û lib dibêje û îtiraf dike. Fatma, Mîrza Ehmed, padîşah dibin yek û pîrê dikujin.

Ew liwê digehin mirazê xwe, em liha digehin mirazê xwe.

Yadîgâr Yaraşlı

20

Xwenda ye

Ji dapîra xwe hîn bûye

Xwendekar

Çîroka Dêmariyê

Hebû tunebû mêrikekî xweyî du zarokan hebû. Zarokekî wî kur ya din jî keç bûye. Wexta diya zarokan dimire bavê wan dîsa dizewice. Jinbava zarokan yeke xirab bûye û ti wextê ji zarokan hez nekiryê. Zarok jî zaf guneh û hêsr bûne. Jinbav û bavê zarokan her tim genim dikelandin û direşandin li nav zeviyê lê tu wextê ew genim hêşîn nedibûn. Jinik jî derewan dike û ji mêrê xwe ra dibêje:

- Ez çûm li ba mela. Mela ji min ra got kurikê ser jê bikin û bidin li serê zeviyê; keçkê ser jê bikin û bidin li binê zeviyê. Ew çax dê genimê we hêşîn be û çêbe. Bavê zarokan ji jina xwe bawer dike û jê ra dibêje:
- Ji wexta ku zarokên min bê dê mane heta niha te tu carî tişteke xweş ji wan ra çenekiryê. Ji zarokan ra hin kadeyên xweş çêbike û bila bixwin paşê em ê gotina mela bi cih bînin.

Jinik jî radibe û ji zarokan ra du heb kadên xweş çêdike û dide wan. Haja zarokan ji tiştê tune ye. Zarok kadên xwe dihingirin û diçin li serê banê malê ku bixwin. Li wir çûkekê tê li ba wan û dibêje:

- Çilwîlwîl... Piçek bidin min ez ê xebereke bêjim ji we re. Kurik nade lê keçik piçek ji kadeya xwe dide çûkê. Çûk ji wan ra dibêje:
- Dê bav û jinbava we we ser jê bike, birevin û herin.

Keçik û kurik ditirsin û direvin, diçin. Pir diçin hindik diçin li wan dibe şev dibînin ku agireke ji dûr ve xuya dike. Dema diçin li ba wê agirê dibînin ku pîra mirovxwar liwê ye. Pîr dema wan dibîne:

- Werin werin. Hûn ser çevê min hatine, dibêje.

Liwê tenûreke mezin heye. Pîra mirovxwar jî nan dipêje û nanekî diavêje aliyê, nanakê diavêje aliyê din. Dema nanan diavêje, li du aliyan jî du heb ga di nav afirê xwe da ne. Pîrê dibêje:

- Ev nan Çalo ra ev nan Beşo re.

Zarok dema pîrê dibînin jê ditirsin lê nikarin biçin cihekî din jî. Pîra mirovxwar zarokeke diavêje kara¹³³ mewîjan ya din diavêje kara hejîran. Pîrê dixwaze ku zarok li wir têr bixwin û zexim bibin paşê pîrê wan bixwe. Zarok pê dihesin û dibêjin hevdu dê

¹³³ Kar: cihê dextê

pîre me bixwe. Zarok diçin li ber kêranan û li wir hêlanek li ser tendûrê çêdikin û pîrê jî agira li tenûrê geş dike ku zarokan bipêjinê û bixwe. Pîrê ji wan dipirse:

- Dadê qurban, ez ê çawa bêm li ba we?
- Were li ser hêlanê tu yê bê li ba me.

Pîra mirovxwar diçe û li ser hêlanê rûdine. Di wê demê da zarok taya hêlanê dibirin û pîrê dikeve di nav tenûrê da, dişewite û dimire. Ew mal, zêr, ga hemû ji zarokan ra dimînin û zarok dewlemend dibin. Bav û jimbava wan jî hêj feqîr in û tiştek tune ku bixwin. Keçik ji birayê xwere dibêje:

- Birayo, em biçin bav û jimbava xwe jî bînin bila ew jî ligel me bijîn.

Bira qebûl nake lê keçik israr dike û diçin bav û jimbava xwe jî tînin li ba xwe. Jinik poşman dibe ji bo kirinê xwe. Ji zarokan efûkirin dixwaze û zarok jimbava xwe efû dikan. Bi hev ra bi dilşadî dijîn. Ew liwê digêhin mirazê xwe, em liha digehin heqê xwe.

Fehmê Dîkmen

63 salî

Xwenda nîn e

Ji dapîra xwe

Bermalî

Şembelût

Çîroka Dirê

Hebû tunebû wextekî keçekê hebû. Navê keçikê Dirê bû. Heft birayên Dirê hebûn. Birayê mezin dizewice û jinbiraya Dirê qet ji Dirê hez nake, ji Dirê aciz e.

Rojekê Dirê û jinbiraya wê bi hev ra diçin beravê¹³⁴. Dema diçin li ba avê ji bo beravê Dirê hin tûtirkan dibîne û diçe ku wan tûtirkan berhev bike. Dirê fistanekê spî li xwe kirye. Dema Dirê tûtirkan berhev dike wan tûtirkan dixwe di nav pêşa xwe da û hemû fîstana wê ya spî ji ava tûtirkê mîna xwînê sor dibe. Jinbira jî ji ber ku zaf ji Dirê aciz e dibêje ez ê bêbextiyê li Dirê bikim. Jinbira fîstana Dirê xef dike û naşû. Çend roj şunde jinbira wê fîstanê dibe û dide nîşanê bav û birayên Dirê û ji wan ra dibêje:

- Dirê namûsa we lewitandiye, Dirê ji keçintiyê ketiye.

¹³⁴ Berav: Şuştina cilan

Bira bawer dikin û li Dirke didin, qer dikin dibêjin te namûsa me lewitand. Her çiqas Dirke digirî û dibêje min namûsa we nelewitandiye dîsa jî birayên wê bawer nakin. Dêya Dirke yekê pîr e û çavên wê kor in. Jinik dizane ku neheqî li keça wê dikin lê tu tişt ji destê wê nayê.

Du sê roj li ser vê bûyerê derbas dibe. Şevê morika xewê dixin di nav guhê Dirke da û mala xwe bar dikin, diçin. Dirke li wir dihêlin bi tenê. Seyekê, pîşkekê û dîkekî Dirke hebûye. Dema malbata Dirke mala xwe bar dikin se û pîşîk di derdorê Dirke diçin û tèn, dixwazin Dirke hişyar bikin lê Dirke ranabe. Dîk jî li derdora Dirke dizivire, nêkila xwe dixê guhê Dirke û morika xewê ji guhê Dirke derdixîne. Dirke dema hişyar dibe dibîne ku malê li ser wê bar kirine û çûne. Dirke radibe hawar dike, digirî lê bê feyde... Birayên wê, dê û bavê wê hemû malê bar kirine û çûne. Dirke ji se û pîşîka xwe ra dibêje:

- *Pîşî te ça¹³⁵ miyaw nekîr*

Seyê te ça ew ew nekîr

Te Dirka dirmendan ji xew ranekîr

Ka malê bavan kû ve bar kir

Dirke radibe dikeve çolan deran dibêje ez ê dê û bavê, birayên xwe bibînim. Kê dibîne jê pîrs dike lê tu kes nizane ka malbata Dirke çûne li kû. Dirke dikeve rêyan gund gund digere ji ser da sal derbas dibin lê Dirke tu xeber ji malbata xwe nastîne, salûxê¹³⁶ wan nade.

Rojêke Dirke diçe gundekî, dibîne yekî di nav zeviyê da dixebite. Dema Dirke nêzikê wî dibe dibîne ku ew birayê wê ye. Bira jî dema Dirke dibîne xwişka xwe nas dike lê berê xwe dizivirîne û bi Dirke ra naaxive ku Dirke wî nas nake. Dirke jê dipirse.

- Bira, malbabê min min berdane û çûne, ez li malbabê xwe digirim, birayên xwe digirim. Te tu salûxa wan nedaye? Tu nizanî ew li kû ne?

- Kê ne malbabê te, tu kê yî?

- Navê min Dirke ye, dibêje û dewam dike:

Dirke dir çênîne

Pêşka xwe danîne

Jinbirê lê kir xwîn e

Dirka min mendane

¹³⁵ Ça: çima

¹³⁶ Salûx: salix, xeber

Xwişka heft bira ne

Dayê pîr e kor e

Babo kal e şal¹³⁷ e

Dema Dir kê wiha got birayê wê serê xwe qur kir û got na, min malbata te nedîtiye. Dir kê dewam dike rêya xwe û diçe. Vê carê jî birayekî xwe dibîne û nas dike. Ji wê ra jî heman tiştan dibêje û ew bira jî dibêje ez nas nakim. Dir kê diçe li ba birayên xwe yên din lê yek ji wan xwe nade naskirin. Dir kê heft birayê xwe dibîne lê her heft bira jî xwe nadin naskirin. Dir kê vê carê diçe li ba bavê xwe. meseleya xwe ji bavê xwe ra dibêje. Bavê wê jê bawer dike û dibêje ez bavê te me. Keça xwe himbêz dike û gazî li kurên xwe dike. Bav ji kurên xwe ra dibêje:

- Xwişka we rast dibêje, bûka me bêbextiyê lê kirye. Me neheqî li Dir kê kir, wê bi tenê hişt li malê...

Bira ji xwişka xwe bawer dikin û dibêjin em wê nahêlîn li ba jinbirayê. Hespên xwe du roj du şev birçî û tî dihêlin. Lingekî bûkê hespekê ve, lingekî hespeke din ve girê didin. Giya û av dixin du aliyên cuda. Hespan berdidin. Hespêkê diçe aliyekî ve hespa din diçe aliyekî dîtir ve û bûk ji navendê dibe du tîş.

Çîroka me çû diyaran, rehme li dê û bavê guhdaran.

Semra Yaldiz

27 salî

Xwenda ye

Ji birayê xwe guhdar kiriye

Bermalî

Giran

Çîroka Edlê û Ebbas

Hebû tunebû mêrikekî û jinekê hebû. Navê wan Edlê û Ebbas bû. Edlê jî Ebbas jî piçek kêmaqil bûne. Keçekê wan jî hebûye. Keça xwe mezin kirine û dane kurê axê. Mehekê piştî dawetê biryar didin ku biçin heftûka keça xwe. Dema diçin li ba keça xwe kêfxweş dibin, sohbet dikin, xwarin dixwin û dibe êvar. Wextê razana Edlê û Ebbasê tê. Keça wan li qata binî cihê razanê ji bo dê û bavê xwe amade dike û Edlê û Ebbas

¹³⁷ Şal: felç

dimînin bi tenê. Li cihê razana wan agir digirtê û li ser agirê sîtileke mezin dims heye. Edlê û Ebbas dileyîzin û pê wan li sîtila dimsê dikeve û sîtila dimsê dirêje li ser wan. Piştî rijandina dimsê pişta wan bi hev digire û nikarin ji hev vebin. Heta sibê dimînin di wê rewşê da. Dema keça wan diçe qata binî dibîne ku pişta dê û bavê wê bi hev ve girtiye. Keça wan av lê dike û wan ji hev diveqetîne. Paşê diçin qata jor xwarina xwe dixwin, diaxivin, dikenin û ew roj jî dibe şev û wextê razana wan tê.

Keça wan jî difikire ku çi bike çi neke, dawiyê dibêje bila dê û bavê min îşev li dikanê razên. Dê û bavê xwe dibe dikanê, cihê wan amade dike û vedigere mala xwe. Dema dê û bavê wê li dikanê dimînin bi tenê, li derdora xwe dinêhirin ku tijî pertalên rengîn hene liwê. Ji hev ra dibêjin keça me xwediyê evqas pertalên xweşik e lê cilên keça me li xwe dike sipehî nîn in. Em ê van pertalan bi meqesê amade bikin paşê bila keça me ji van pertalan ji xwe ra fistanên xweşik bide çêkirin. Edlê û Ebbas dikevin di nav pertalan da û hemû pertalan parçe parçe dikin. Dibe sibê û keçik diçe ku dê û bavê xwe bibe mal ji bo xwarinê lê dibîne ku hemu pertal parçe parçe bûne. Dibêje ji dê û bavê xwe ra we çi kir, ew jî dibêjin me van pertalan kerî kir ku tu ji xwe ra bi van pertalan fistanan bidî çêkirin. Keçik radibe pere dide xulamên xwe ku biçin heman pertalan bistînin, bînin û danin cihê wan daku mêrê wê nebîne. Xulam diçin pertalan tînin didin cihê wan, ew roj jî dibe êvar.

Keçik difikire gelo ez ê dê û bavê xwe li kû razînim ku zerer nedin dîsa. Keçik dibe dê û bavê xwe li hewşê¹³⁸ radizîne. Edlê û Ebbas nîvê şevê radibin dibînin ku mirîşkên li ser tar¹³⁹ xwe dixurînin. Edlê û Ebbas dibêjin, axx keça me çi kirye, siphan daye serê mirîşkan, serê mirîşkan neşûştiye. Radibin sîtileke tijî av dikin û wê avê dikelijînin. Hemu mirîşkan lib û lib dixin di nav ava kelijandî da û derdixînin. Dema mirîşkan xistine di nava ava kel da hemû mirîşk mirine û wan mirîşkan dîsa dane li ser tara wan. Ji hevdu ra gotine serê mirîşkan paqij bû lewma mirîşk ji xwe ra razane. Dibe sibê dema keça wan tê dibîne ku hemû mirîşk mirine, çûne. Keçik disa dimîne di tengasiyê da lê nikare tiştekî bike.

Roja din wextê çuyina Edlê û Ebbas hatiye. Keça wan dibêje:

- Axa got bila dê û bavê te biçin li nav pez, kîjan beran têrgoşt be bila ji xwe ra bibin.

Edlê û Ebbas jî diçin li ba şivanê axê, ji şivên ra dibêjin:

¹³⁸ Hewş: hell, axur

¹³⁹ Tar: pûnika mirîşkan

- Axa gotiye kîjan beran spehî ye, têrgoşt e bila şivan bide we.

Şivan jî dikeve nav pez û kîjan beran têrgoşt be wî tîne dide wan. Edlê û Ebbas dibêjin:

- Me vê libê navê.

Şivan dîsa dikeve nav pez kîjan mezin û zexim be wê tîne lê wê jî naecibînin. Şivan dîsa diçe û tîne lê Edlê û Ebbas wê jî naecibînin. Dawiya dawî şivan dibêje:

- Kerem bikin hûn bijêrin.

Edlê û Ebbas dikeve di nav pez kîjan jar be wê dibêjirin û dibêjin rûn ji pozê wê te, ev lib sipehî ye.

Edlê û Ebbas peza xwe dihingirin û vedigerin mala xwe. Peza xwe ser jê dikan, goştê xwe dipêjînin, tenûrê kel dikan, bi qasî teştê nanê xwe dipêjînin, sîtila goştê didanin di nav tenûrê da û Ebbas ji Edlê ra dibêje:

- Kapika xwe amade bike em ê biçin zilkan kom bikin ku dema me goşt xwar em ê pê zilkan diranê xwe paqij bikin.

Rêdikevin û diçin ji bo zilkan, li ser rê du sê heb mirtip tê pêşiya wan. Mirtip ji wan pirs dikan:

- Hûn kû ve diçin? Edlê bersiv dide:
- Em diçin ji bo zilkan berhevkerinê. Dema me goşt xwar em ê bi wan zilkan diranê xwe paqij bikin. Hûn diçin li kû?
- Em ê biçine gund.
- Neçin mala me.
- Em çi zanin mifteha we li kû ye?
- Mifteha me di bin gurza çilûyê da ye.
- Em çi zanin goştê we li kû ye?
- Goştê me di nav tendûrê da ye.
- Em çi zanin nanê we li kû ye.
- Nanê me jî di nav teştê da ye.

Piştî van axaftinan Edlê û Ebbas diçin zilkan û mirtip jî diçin li mala Edlê û Ebbas. Mirtiban mifteha wan ji binê gurza çilûyê derxistine, deriyê vekirne, goştê ji tendûrê derxistine, teştê nanê anîne hemû xwarine û çûne. Bûye êvar Edlê û Ebbas zilkan berhev kirine û hatine mala xwe ku goştê xwe bixwin. Dema tîne deriyê mala wan vekirî; ne goşt maye ne jî nan. Dikevin nav malê dibêjin gelo kê goştê me û nanê me xwariye.

Dibînin ku mêşeke di nav malê da ye. Dibêjin hebe tunebe vê mêşê xwarina me xwariye. Her yekî baltekî digire destê xwe û dikevin nav malê ji bo ku mêşê bikujin. Mêş xwe dide li ser pozê Edlê, Ebbas baltekê pozê jina xwe dide ku mêşê bikujîne. Piştî baltê him mêş dimire him jî jina wê. Ebbas jî dibêje tiştê nabe, yek ji me mir yek ji wan...

Piştî mirina jina wî Ebbas difikire ku jina wê jî miriye û maye bi tenê. Dibêje ez ê ji van deran biçim. Radibe deriya malê jê derdixîne, pişt dike û diçe. Rêya wî dikeve li ser çemekê. Ava çemê zehf bûye Ebbas jî hêrs dibe û pê baltê çokê xwe dişkîne û dikeve di nav avê da û dimire.

Mukaddes Kaya

37 salî

Xwendina wê heye

Ji dapîra xwe guhdar kiriye

Xanimtiya malê

Pelesor

Çîroka Ehmedê Beyrema

Hebû tunebû xwişk û birayekî hebû. Navê keçikê Beyrema, navê kurikî Ehmed bû. Dema diya van zarokan rehmî dibe bavê wan dîsa dizewice. Dêmarîya van zarokan yekê pir xirab bûye û her tim li zarokan daye.

Rojekê dîsa dêmarîya wan li wan dide û zarok jî ditirsin ji mala xwe direvin û diçin li ser çiyayên dûr. Dixwazin ku ji destê dêmarîya xwe xilas bin. Rojekê, du roj, sê roj dimînin li wan deran; giyayekî be fêkiyekî be çî derkeve pêşîya wan wê dixwin û bi vî awayî dijîn. Şevan xwe didin di nav şikeftê da û li nav rojan jî rê dikevin, diçin.

Rojekê merxeb rû digire û şikefteke mezin dibînin, dibêjin em ê îşev di nav vê şikeftê da bisekinin, dema bû sibe em ê dîsa rê bikevin. Ew şikeft şikefta dêwan e lê haja wan jê tune. Diçin li nav şikeftê rûdinin, dema dibe êvarekî dereng dengê dêwan tê. Ew jî xwe di nav tîşa kevirê da xef dikin ku dêw wan nebînin. Dema dêw dikevin hundir mezinê wan dibêje bêhna insanan tê. Ji ber ku êvar e û tarî ye tu kesê nabînin. Dêwên din dibêjin insanê çî halê çî? Tu insan li van deran tune. Di nav şikeftê da wê tariyê da insanan digerin û destê mezinê wan diçe li ser serê Ehmed. Ji wan ra dibêje,

min gotibû bêhna insanen tê. Hinek jî digerin vê carê jî Beyrema dibînin. Dêw dibêjin îşev şîva me derket. Xwişk û bira zehf ditirsîn û nizanin dê çi bikin. Keçik jî dibêje:

- Me nexwin, ez ê xwarina we pêjim, cihê we paqij bikim, kincên we bişûm û birayê min jî bila li ma min be ku sebra min bê.

Dêwê mezin -birayê mezin e jî- qebûl dike û dibêje:

- Me jî tiştêkî wiha dixwest. Her roj yek ji me liha disekine û xwarina me çêdike, lê heger ev keç xwarina me çêbike em ê hemû bi hev ra biçin nêçîrê û zêdetir nêçîr bikin.

Ev fikr xweşê wan diçe û wan zarokan naxwin.

Her roj keçik radibû taştêya wan amade dikir û dêw diçûn nêçîrê. Dema dêw diçûn nêçîrê kevîrên mezin didan li ber deriyê şikeftê ku Ehmed û Beyrema nerevin, neçin. Dema dibû êvar her yekî ji wan tiştêkî daniya: yekî teyrekî, yekî kîvroşkekî, yekî rûviyekî... Beyrama xwarinê amade dikir û bi hev ra dixwarin.

Çend sal li ser vê bûyerê derbas dibe rojekê dêwê mezin dibêje ez ê vê keçikê li ser xwe mehr bikim. Keçik naçar qebûl dike û dibe jina dêwî. Sal derbas dibin, keç û kurekî Beyrema ji dêwê çêdibe. Piştî salan Beyrema rikê xwe ji birayê xwe tîne û dibêje dêwan birayê min min aciz dike, dema hûn diçin qêran dide min û ji min nehewe. Birayê min bînin û li ber deriyê şikeftê girê bidin. Bila wek seyan li ber deriyê me bisekine. Dema me xwarina xwe xwar em ê hestiyên goştê bidin wî. Dêw gotina Beyrema bi cih tînin û Ehmed li ber deriyê şikeftê bi zîncîran girê didin.

Rojekê Beyrama ligel keça xwe û kurê xwe diçin li çem ji bo beravê¹⁴⁰. Beyrema dixwaze ku kincên dêwan bişû. Dema diçin li ba çem Beyrema ferq dike ku qûmikê¹⁴¹ ji bîr kirye. Beyrema ji keça xwe ra dibêje:

- Keça min, me qûmikê ji bîr kirye. Here malê û qûmikê hingire bîne. Heger xalê te ji te nan filan bixwaze nede wî. Qûmikê hingire û bi zû were.
- Baş e, dadê.

Keçik diçe mal ku qûmikê bîne xalê wî jê nan dixwaze lê keçik nade xalê xwe. Keçik qûmikê dihingire û bilez diçe li ba diya xwe. Diya wê jê pirs dike:

- Te tu tişt neda xalê xwe, ne wisa keça min?
- Naa dadê, xalê min ji min nan xwest lê min tu tişt neda xalê xwe.

¹⁴⁰ Berav: şûştina kincan

¹⁴¹ Qûmik: mîna kulindirê ye, wek tasê dihat bikaranîn

Beyrema bi qûmikê av tijî sîtilê dike û avê dikelijîne. Dema av dikeliye jinik ferq dike ku sabûnê jî ji bîr kirye. Beyrema vê carê ji kurê xwe ra dibêje:

- Kurê min, me sabûnê jî ji bîr kirye, vê carê dora te ye. Here li mal û sabûnê hingire, bîne. Heger xalê te ji te xwarin bixwaze bêje ez nadim, tu tişt nede xalê xwe, lez bike û were.
- Baş e, dadê.

Kurik diçe mal ku sabûnê bîne xalê wî jê ra dibêje:

- Xwarziyê min tu hatî çî?
- Diya min sabûnê ji bîr kirye xalo, ez hatim ku sabûnê bibim.
- Xwarziyê min, ka gezeke nan bide min, ez ji birçîbûnê mirîm.
- Baş e xalo.

Kurik çû ji xalê xwe ra nan anî. Xalê wî jê ra got:

- Xwarziyê min, ka destê min piçek sist bike.

Destê Ehmed ji piştê ve girê dabûn. Xwarzî zîncîrê ji destê xalê vedike ku xalê wî bikare nanê xwe bixwe. Dibêje ji xalê xwe re:

- Xalo dema te nanê xwe xwar destê xwe disa bide li piştê xwe ku nezanin min zîncîrê jê vekiriye.
- Erê xwarziyê min lê heger diya te ji te pirs bike, bejê min tu tişt neda xalê xwe.

Kurik sabûnê dihingire û diçe li ba diya xwe, diya wî jê dipirse:

- Kurê min te çima evqas xwe mijûl kir, te çî dikir, nebe te xwarin da xalê xwe?
- Naa dadê, min tu tişt neda xalê xwe. Xalê min ji min nan xwest lê min têr dijûnan lê kir û ez hatim.
- Baş e kurê min.

Beyrema ligel zarokên xwe kincan dişûn û dizivirin diçin mala xwe. Dibe êvar, dêw tîn, hemû bi hev ra xwarina xwe dixwin û hestiyên goştê diavêjin li berê Ehmedî.

Şev dibe dereng, wextê razanê tê. Çil dêw, Beyrema û zarok radizên. Beyrema ji cihê xwe radibe, diçe ji binê serê dêwî tifengê dihingire, deh dêwan dikuşîne, sî dêw dimînin û tê cihê xwe rûdine. Dêwa mezin (birayê mezin, zavayê Ehmed) ji Ehmed dipirse:

- Ehmedê Beyrema!
- Haa!
- Şev çî çû çî ma?

- Hêj êvar e, xêr e, tu çima pirs dikî?
- Birayê min, min xewneke dît?
- Te çi dît?
- Min didît çil kevokan xwe dida li ser vî çiyayî. Min deh liban dikuşt sî lib diman.
- Xwedê xêr bike, xewn e, tu tişt nabe. Tu razê.

Dîsa xew dikeve çavê dêwî, dêw xirexir dike û Ehmed dîsa ji cihê xwe radibe û diçe deh lib ji dêwan dikuje dimînin bîst dêw. Ehmed dizivire li cihê xwe rûdine. Dîsa dêwê mezin gazî li Ehmed dike:

- Ehmedê Beyrema!
- Haa!
- Şev çi çû çi ma?
- Xêr e tu îşev ranazê?
- Min dîsa xewneke dît?
- Te çi dît?
- Min didît ku sî kevok xwe didan li ser vî çiyayî. Min deh lib dikuşt bîst lib diman.
- Xwedê xewna te xêr bike. Tu tişt tune, ji xwe ra razê.

Dêw dîsa xirexir dike, radizê. Ehmed ji cihê xwe radibe û diçe tifengê distîne, deh lib dêw dikuşîne, dizivire li cihê xwe rûdine. Dimînin deh dêw. Dêwê mezin dîsa gazî li Ehmed dike:

- Ehmedê Beyrema!
- Haa!
- Şev çi çû çi ma?
- Hema hema dê bibe sibe, dîkên berê sibê bang didin. Xêr te tu çima dîsa rabî?
- Min xewneke xirab dît?
- Te çi dît?
- Min didît ku bist kevok xwe didan li ser vî çiyayî. Min deh liban dikuşt, deh lib diman.
- Xwedê xewna te xêr bike. Razê, hindik ma ji sibê re.

Dêw dîsa radizê, xirexir dike û Ehmed diçe deh liban jî dikuje, hemû dêw dimirin. Ehmed tê li cihê xwe rûdine.

Dibe sibe, Beyrama radibe û dinihêre ku hemû dêw hatine kuştin, laşên wan li erdê hatine dirêjkirin. Beyrema dizane ku birayê wê wan dêwan kuştiye. Ji birayê xwere dibêje:

- Wêy ez qurbana te bim, te min ji destê van dêwan xilas kir.
- Naa na, qurbana min nebe. Ew hestiyên ku te dida li berê min hêj di bîra min da ye. Ne ez birayê te bûm. Ew dêw bûn, xwarina wan zaf bû, te piçek xwarin dabûya min dê çi bûya? Te çima min wek seyan liha girê da.

Ehmed radibe xwişka xwe û xwarziya xwe dihêle di nav şikeftê da û keviran dide li ber deriyê şikeftê ku nekarin derkevin. Ehmed xwarziyê xwe dihingire û diçe cihekî dût. Deh roj paşê dibêje xwarziyê xwe:

- Em biçin li diya te û xwişka te binêrin gelo çi dikin. Dibe ku heya niha ji birçîbûne mirîne.

Ehmed ligel xwarziyê xwe diçe li ba şikeftê. Li şikeftê kulekeke piçûk heye û ji wê ronahî dikeve hundir. Ehmed li ber wê kulekê disekine û dibêje:

- Xwişka min, rewşa te çawa ye?
- Wêyy ez qurbana te bibim, ka were derî veke ez têr rûyê te maç bikim.
- Naa, qurbana min nebe. Min wan rojan ji bîr nekir ku te hestiyên diavêt li pêşiya min.

Beyrema û keça wê ji birçîbûnê êrişê hev dikin, goştê hev gez dikin. Ehmed wan di wê halê da berdide û ligel xwarziyê xwe diçin cihekî dût.

Ew liwê digehin heq û mirazê xwe, em jî liha...

Emîne Kaplan

64 salî

Xwenda nîn e

Ji jinxala xwe hînî bûye

Bermalî

Kelhok

Çîroka Eysê û Mamê Hirç

Wextekî li gundekî hinek keçik diçin pincarê. Her yekê ji wan tûrika xwe tijî dike û dibe êvar. Hirçekî tê û diçe di nav tûrika Eysê da xwe xef dike. Dema dibe êvar keç lib û lib dizivirin û diçin mala xwe. Eysê jî tûrika xwe tijî dike û dixwaze ku vegere

lê nikare tûrika xwe ji erdê rake. Eyšê ji hevalên xwe alîkarî dixwaze lê tu kes xwe lê nake xweyî, alîkarî nade Eyšê û hemû keç tûrikên xwe pişt dikin, diçin. Li ser wî çiyayî Eyšê dimîne bi tenê. Dema êvar dibe dereng û ji xeynî Eyšê tu kes liwê namîne hirç ji tûrika Eyšê derdikeve, Eyšê dide li ser piştê xwe û dibe. Eyšê dike qîrîn û hawar lê bê feyde kes dengê wê seh nake.

Keçên din hemû diçin mala xwe lê Eyšê nikare biçe. Diya Eyšê ji wan dipirse dibêje Eyšê ma li kû, ew jî dibêjin em nizanin, me nedîtiye filan û bêvan. Dêya Eyšê, birayên Eyšê, gundî li pê Eyšê digerin, diya wê hewar dike qîrîn dike lê salûxê¹⁴² wê nadin. Du sê sal li pê Eyšê liha û liwê digerin lê êdi hêviya xwe jê dibirin.

Hirç Eyšê dibe, dixwe di nav şikefta xwe da, her roj keviran dide li ber şikeftê ku Eyšê nereve û neçe. Hirç, her roj diçe nêçirê û tiştêkî tîne. Eyšê pêşî naxwe lê piştî rojan mecbûr dimîne, zaf birçî dibe û ew jî goştê nepêjandî dixwe.

Sal pê ve diçin û li ser revandina Eyšê heft sal derbas dibe. Eyšê dibe jina Hirçê û heft lib têtjikên wan jî çêdibe.

Rojekê şivanê gundê mala bavê Eyšê garana heywanan dibe li nêzikê şikefta ku Eyšê tê da ye. Şivan li ser tehtekî rûdine û nizane ku kes li binê tehtê heye. Şivan bilûra xwe dide û Eyšê seh dike. Dema Eyšê dengê bilûrê seh dike dibêje:

- *Herê şivano bilûrvano*

Gupalê li zendano, kulavê li milano

Wezê Eyšê me xwişka heft birano

Îsal heft salê min temam bû ezê girtiyê hirçano

Şivan şaş dimîne dibêje ev dengê insanekê bû, heywanekê bû, dengê çi bû? Şivan dikesine, ji ser da hinek zeman dibore şivan dîsa bilûra xwe lêdide. Eyšê dema dengê bilûrê seh dike dîsa gazî li şivên dike û dibêje:

- *Herê şivano bilûrvano*

Gupalê li zendano, kulavê li milano

Wezê Eyšê me xwişka heft birano

Îsal heft salê min temam bû ezê girtiyê hirçano

Şivan ji wê derê wedigere, pezan dibe beriyê û dibêje:

- Gelî berîvanan! Werin li ba min. Ez ê ji we ra tiştêkî bibêjim. Berîvan hemû diçin li ba şivên disekinin û dibêjin:

¹⁴² Salûx: salix, xeber

- Xêr e, çi bû? Şivan ji wan berfvanan dipirse:
- Heft sal pêşiya niha tu kesê we winda nebûye?

Diya Eyšê dibêje keça min, xwişka Eyšê dibêje xwişka min, meta Eyšê dibêje biraziya min, xaleta Eyšê dibêje xwarziya min winda bûye û dewam dikin:

- Heft sal beriya niha keça me çûye pincarê û êdî neziviriye.
- Navê keça te Eyšê ye?
- Erê.
- Min saluxê keça we daye. Herin bêjin birayên wê bila tifengên xwe hingirin em ê biçin û Eyšêya we bînin.

Her kes şaş dimîne, nizanin ka dê çi bikin? Yek ji wan ji şivên dipirse:

- Eyšê li kû ye?
- Hirçekî Eyšê birye û xistiye di nav şikeftê da. Keviran daye li ber deriyê şikeftê ku Eyšê nekare bireve. Min nedizaniya. Ez çûm li ser kevirê û min bilûra xwe da. Dema min bilûra xwe da keçikekê li nav wê şikeftê ji min ra got:

Herê şivano bilûrvano

Gupalê li zendano, kulavê li milano

Wezê Eyšê me xwişka heft birano

Îsal heft salê min tamam bû ezê girtiyê hirçano

Malbata Eyšê dibêjin teqes ew keça me ye û birayên Eyšê tifengên xwe hildigirin û diçin şikeftê. Dema bira diçin li ber deriyê şikeftê dibêjin:

- Eyšêêêê!
- Lebêêê!
- Hirç li şikeftê ve ye?
- Naaa, hirç çûye nêçîrê. Lez bikin. Hindik ma dê hirç ji nêçîrê bizivire.

Birayan kevirên li ber şikeftê avêtin û deriyê vekirin. Xwişka xwe himbêz kirin û dîtin ku heft lib têjik jî li wê ne. Ji têjikan şeş lib kuştin û ya piçûk tenê ma. Eyšê got:

- Kekê min, vê libê nekuşînin. Em ê vê libê bibin mala xwe û xweyî bikin.

Bira dibêjin bila û rê dikevin ku biçin gundê xwe. Xalo têjikê dide li ser milê xwe û di nivê rê da têjik dibêje “Xalo goçik ep” û guhê xalê xwe gez dike û jê vedike. Xal li wê hêrs dibe û wê têjikê li erdê dide û ew lib jî dimire.

Eyšê digehe mala xwe, diya xwe, xwişka xwe... Hemû nas û cîran tên li ba Eyšê, şah dibin. Dibe dereng Eyšê ji birayên xwe ra dibêje:

- Teqez dê hirç li ser şûna me bê, tifengê xwe amade bikin, li ber derî bisekinin, dema hirç hat wî bikuşinin. Wekî din dê ew me hemûyan bikuşîne.

Dibe êvar û hirç diçe şikefta xwe dibîne ku hemû kevirên li ber deriyê şikeftî hatine avêtin, têjikên wê hatine kuştin, Eysê hatiye birin. Hirç digirî û dikeve pê wan, li ser şûna wan diçe, di nivê rêyê da têjika xwe ya piçûk jî dibîne. Heya li gundê Eysê diçe û li ser banê mala Eysê disekine, dibêje:

- Waaa Eysêê were bebelo digirî, were bebelo digirî. Eysê ji hirçê ra dibêje:
- Mamê Hirç were were. Ez hatime babaniyê. Em ê bi hev ra bizivirin.

Hirç kêfxweş dibe û diçe li ber deriyê wan. Li wir bira bi tifengê li hirçê diden û hirç dimire.

Ew liwê digehin heqê xwe, miraz û meqsedê xwe; em jî liha...

Emîne Kaplan

64 salî

Xwenda nîn e

Ji jinxala xwe hînî bûye

Bermalî

Kelhok

Çîroka Fatma Xanim û Lêvres

Wextekî mêrekî û jinekê hebûne. Xwedê keçikek dide wan û ew jî navê keça xwe didanin Fatma. Piştî salan jinik rehmet dibe û mêrik dîsa dizewice. Ji vê zewacê jî keçekê wan çêdibe û navê wê jî didanin Lêvres. Fatma, gellekî rind û bedew e, keçekê pir baş e; lê Lêvres him spehî nîn e him jî baş. Ji ber vê yekê Lêvres û diya wê ji Fatma hez nakin û hesûdiyê lê dikin. Karên malê yên giran hemû bi Fatma didin kirin. Her roj Fatma dişîne li ber dewaran.

Rojeke Fatma dîsa diçe li ber dewaran, dêmariya wê gûrifeka rîs û teşiyekê dide wê û dibêje tu yê wan bibî, badî û êvarê ji min ra bînî. Keçik dema diçe li ber dewaranguîrifa wê ji destê wê dikeve, tere dibe û diçe. Keçik li pê gûrifa xwe diçe û dibîne ku gûrifa wê di destê pîrikekê da ye. Pîrik ji Fatma ra dibêje:

- Heger tu li pora min nenêrî, siphên li serê min nekujînî ez gûrifê nadim te.
- Fatma gotina pîrikê bi cih tîne û pîrê jî gûrifa wê dide Fatma û jê ra dibêje:

- Keça min, here li jêr. Liwê sê av hene. Ya reş na, ya sor na, bi ya ava spî rûyê xwe bişû.

Fatma diçe li ba wan avan û bi ava spî rûyê xwe dişû. Hingê spehî ye piştî wê avê sê qat zêdetir spehî dibe. Fatma gûrifa xwe digire û dizivire mala we. Dema dêmariya wê û Lêvres Fatma dibînin hesûdiya wan zêdetir dibe çimkî Fatma rindtir bûye. Roja din Fatma dîsa diçe li ber dewaran. Li ber dewaran ajaleke mirarbî dibîne û ji Xweda ra dia dike û dibêje:

- Ya Rabbilalemîn, tu dûvkê vê heywanê ji min ra bikî kezî, çermê wê ji min ra bikî fistan, simikê wê ji min ra bikî îskapîn.

Xwedê Teâla her sê xwestinên wê bi cih tîne û dide Fatmayê. Dîsa dibe êvar, Fatma vedigere mala xwe. Ew şev li gund dawetek hebûye û Fatma jî diçe wê dawetê. Dema keç govend dikin destmala yekê li çirayê dikeve û çira ditefe. Keç jî ji dawetê derdikevin û diçin li ba bîrê. Li wir îskapîna Fatma dikeve di nava bîrê da.

Roja din kurê mîrê hespê xwe dibe li ser bîrê lê hesp ji wê bîrê av venaxwe. Kurê mîrê gazî li xulamên xwe dike û dibêje:

- Li bîrê binêrin, çima hesp ji bîrê av venaxwe?

Dema xulam lê dinêhirin dibînin ku îskapînek di nava bîrê da ye. Îskapînê ji bîrê derdixînin û kurê mîrê dibêje:

- Ev îskapîn ya kê be ez ê wê keçikê ji xwe ra bînim û bi wê ra bizewicim.

Kurê mîrê û xulamên wî li nava gund digerin lê îskapîn li gor pê tu keçê nabe. Tenê Fatma dimîne ku îskapînê neceribandîye. Dipirsin û dibêjin Fatma li kû ye. Dêmariya Fatma dibêje:

- Ev îskapîn ya Fatma nîn e, ew feqîr e bê kes e. Dê Fatma vê îskapîne ji kû ve bîne?

Lê kurê mîrê israr dike ku Fatma jî bê û biceribîne. Gazî li Fatma dikin, Fatma tînin û îskapînê didin ceribandî. Îskapîn li gor pê Fatma dibe û kurê mîrê bi Fatma ra dizevice. Li ser zewacê salek derbas dibe û Xwedê kurekî dide Fatma. Dêmariya Fatma hêj jî hesûdiyê dike û şeheke jehrîkirî dihingire û diçe mala Fatma. Dibêje ez ê pora te şeh bikim. Fatma her çiqas nexweze jî dêmarî bi zorî Fatma tazî dike û dibe ku pora Fatma şeh bike. Dema ku şeh li pora Fatma dikeve, Fatma dibe kevokekê û ji pacê difire û diçe serê darekê. Dêmarî û Lêvres jî dizivirin, diçin mala xwe. Dema Fatma diçe li serê darê cotyarekî liwê cot dike. Fatma dibêje:

- *Cotyaro cotyaro*

Mîr'm li mal e?

Pûçikê dayê

Çi hal e?

Cotyar jî dibêje:

- Were çîqa xwartir, were çîqa xwartir. Ez ker im, seh nakim.

Fatma dema tê çîqa xwartir cotyar destê xwe diavêje kevokê û kevok dibe insan. Sîhra wê betal dibe. Cotyar kincê xwe dixê li ber Fatma û Fatmayê dibe mala wê. Fatma digêhije mala xwe û kurê xwe.

Ew liwê digehin mirazê xwe, em liha digehin heqê xwe.

Hediye Çetin

75 sali

Xwendan nîn e

Ji diya xwe guhdar kiriye

Bermalî

Kemalan

Çîroka Herdemcanê

Rehmet li dê û bavê hazirguhbaran ji xeynî fesat û şeytanên li qulêlê dîwaran. Di wextekî ne diyar da mêrek û jinek hebûn. Ew mêr jî padîşah bûye û tenê yek keçê wî hebûye û navê wê jî Herdemcan bûye. Padîşah û jina wî biryar didin ku biçin hecê lê dixwazin heya ew ji hecê bizivirin keça wan jî quranê xitme bike. Padîşah ji mela ra dibêje:

- Em ê biçin hecê. Keça min a Herdemcan emanetê te ye. Tu yê quranê hînî wê bikî û heya em ji hecê bizivirin dê keça me xitmequran bibe.

Mela jî qebûl dike. Beriya ku biçin hecê dê û bavê Herdemcanê li keça xwe şîretan dikin dibêjin:

- Keça min, haja xwe û mala xwe bimîne, qurana xwe bixwîne heta em vegerin. Ev mal, xulam her tişt emanetê te ye.

Keçik li mal dimîne bi tenê û dê û bavê wê jî diçin hecê. Rêya wan dûr e.

Keçik rojek du roj sê roj diçe li ba mela lê paşê dibîne ku armanca mela nebaş e, xirab e. Keçik jî êdî naçe li ba mela ji bo xwendinê û li mala xwe disekine heya ku dê û

bavê wê ji hecê vegerin. Herdemcan tiştên ku jê ra hewce dibin bi xulamên xwe dide standin û qet ji mal dernakeve. Nêzikê saleke li ser derbas dibe û dê û bavê Herdemcanê ji hecê vedigerin. Padîşah ji keça xwe ra dibêje:

- Keça min! Xwedê hez bike te qurana xwe xitim kir?
- Na bavo. Min nexend.
- Çima qîza min? Te çima nexwend?
- Çi bikim bavo. Tu jî diya min jî li vir nebûn. Li ser van xulam û xîzmetkaran kes tune bû. Min jî encax pêk anî û ez neçûm li ba mela, min nexwend.

Padîşah radibe diçe li ba mela û ji mela dipirse dibêje:

- Çima keça min nexwend, te çima keça min hînî quranê nekir, ne min keça xwe emanetê te kiribû? Mela jî dibêje:
- Padîşahê min, keça te keçeke xirab e, bê namûs e. Lewma nehat qurana xwe nexwend. Ez çî bikim?

Padîşah vedigere tê mala xwe pir hêrs dibe û gazî li du xulamên xwe dike. Ji wan ra dibêje:

- Herdemcanê bibin li serê çiyayeke dût, li wir wê bikujînin û cilê wê yên bixwînin ji min ra bînin ku ez jê bawer bim Herdemcan miriye.

Jina padîşahê dike nake nikare padîşahê îqna bike ku keça xwe nede kuştin.

Padîşah ji biryara xwe venagere.

Xulaman Herdemcanê hingirtin û çûn. Pir çûn hindik çûn dût çûn welhasilê birin li ser çiyayekî. Xulaman ji hev ra gotin, em Herdemcanê nakujin, keçik bê guneh e, em ê şûna wê heywaneke bikujin û xwîna heywanê li cilên Herdemcanê bidin û ji padîşahê ra bêjin me Herdemcanê kuşt û ev jî nîşana wê ye. Xulam kîvroşkeke dikujin û kirasê keçikê li xwîna kîvroşkê didin û ji keçikê ra dibêjin:

- Tu azad î, here rêya te vekirî be.

Xulam dizivirin tèn li ba padîşah û kirasa bixwînin didin nîşan, padîşah jê bawer dike ku keça wê miriye. Diya Herdemcanê şîn, girîn... Dibêje we çawa keça min a bêguneh kuşt lê êdî zaf dereng e. Xulam jî ditirsin ku bêjin me nekuştîye.

Herdemcan du sê meh dimîne li çiyayan, pora wê geval¹⁴³ dibe, nêynikên wê dirêj dibe, dikeve di nav dirikan da kincên wê diqelişin, diçiritin, qirêj dibin...

¹⁴³ Geval: lihevketî, tevhevbûyî

Rojeke kurê paşekî diçe nêçîrê. Tajiya kurê paşê diçe li ba deviyêke direyî direyî û vedigere. Tajî bi vî avayî du sê car diçe li ba deviyê û dizivire. Kurê paşê ecêbmayî dimîne û dibêje çawa tajiya min wê heywanê nagire. Kurê paşê hespê xwe li aliyê deviyê ve diajo û dibîne ku benîademek e liwê. Ji destê wê dihingire û dibe mala xwe. Xulamên kurê paşê serê wê dişûn paqij dikin, kincê paqij lê dikin. Dema kurê paşê lê dinihêre keçeke ewqas sipehî, bedew... Kurê paşê bi dileke na bi hezar dilan dihevîne û pe ra dizewice. Sal derdas dibin û Xwedê du kur dide wan. Lê heya wê demê ne kurê paşê ne jî yeke din dengê Herdemcanê seh nekirine. Herdemcanê yek peyv xeber nedaye bi tu kesî ra.

Rojeke kurê paşê diçe li ba remldarekê û jê ra dibêje:

- Ev 7 sal e ez bi yekê ra zewicîme lê hêj ji min ra yek peyv xeber nedaye. Lal e, ker e, gêj e nizamim. Remldar jî dibêje:
- Here sêveke bistîne û bide destê kurê xwe yê piçûk, dê kurê te yê mezin ji bo sêvê bigirî. Paşê xwe li derekê xef bike ka dê çi biqewime.

Kurê mîrê sêveke distîne û dide destê kurê piçûk û xwe xef dike. Kurê mezin jî ji bo sêvê digirî. Dema Herdemcan dibîne ku kurê mezin digirî ji zarokan ra dibêje:

- Heger bavê we yekî baş bûya dê du sêv bîstandiya û daya we, nedihêşt tu bigirî.

Kurê paşê dema dengê jina xwe seh dike ji cihê ku xwe xef kiribû derdikeve û destê jina xwe digire û jê dipirse:

- Ev heft sal e em zewicîne, bi hev ra ne, çima te yek car ji min ra xeber neda?
- Te yek car ji min pirsîyar nekir ka derdê te çi ye kula te çi ye, tu ins î an cîn î. Te ji min pirsîyar nekir û min jî behsa xwe nekir ji te ra.
- De baş e xanim, ka bêje derdê te kula te çi ye?
- Tenê derdê min ew e ku tu min bişînî li mala bavê min. Ez li gel hevalên xwe yê keç çûbûm seyranê, ji xulamên qetiyam û wînda bûm.

Herdemcan liwê derew dike û rastiyan nabêje mîrê xwe. Mîrê wê ji Herdemcanê ra dibêje:

- Bila, ez ê te sibê bişînim li mala bavê te.
- Dibe sibe, kurê paşê ji du xulamên xwe ra dibêje:

- Dê hûn jina min û zarokên min bibin li mala bavê wê.

Kurê paşê xurceke zêr dide wan û jin û zarokên xwe ligel du xulamên dişîne. Pir diçin hindik diçin dibe şev li ciheke disekinîn ku rakevin û roja din dîsa rêya xwe

bidomînin. Liwê dema disekinin ew çax jî xulam xirabiyê li Herdemcanê dikin û jê ra dibêjin heger tu bi me ra nebî em ê kurê te yê mezin ser jê bikin. Herdemcan dibêje:

- Hûn kurê min jî bikujin, min jî bikujin ez bi we ra nabim û namûsa xwe nalewitînim.

Xulam radibin serê kurê mezin li ber çavê Herdemcanê jê dikin. Xulam dibêjin:

- Tu aqil bûy? Nebe em ê kurê te yê piçûk jî bikujin. Herdemcan dibêje:
- Hûn çi jî bikin ez ji namûsa xwe naborim, teslîmê we nabim.

Ji ber ku Herdemcan dizane çi hatiye serê wê ji vê meseleya namûsê hatiye û lewma ji biryara xwe venagere. Xulam radibin serê kurê piçûk jî jê dikin. Xulam dibêjin erd bibe asiman tu yê bi me ra bibî yek. Jinik naçar dimîne û dibêje:

- Ji min bisekinin, ezê biçim destnimêj bigrim û du rekat nimêj bikim û dia ji Xwedayê xwe ra bikim ku rêyeke bide nîşanê min.

Xulam radibin tayeke destê Herdemcanê ve girê didin ku Herdemcan nereve. Herdemcan ji wan dûr dikeve û wê demê Xweda xewekê dixê çavê xulaman û xulam radizên. Dema xulam radizên Herdemcan taya di destê xwe da diqetîne û dikeve nav çiyayan diçe. Herdemcan heya dibe sibe gellekî rê diçe. Dema xulam radibin dibînin ku kes liwê tune, Herdemcan çûye, ew jî vedigerin tên mala kurê paşê. Kurê paşê ji wan pirs dike:

- We çawa kir? We jin û zarokên min bir li mala bavê jina min? Xulam jî dibêjin:
- Me xanima te bir mala bavê wê û em zivirîn, hatin.

Herdemcan diçe û diçe... Dema nêzikê gundê mala bavê xwe dibe şivanekî dibîne û ji şivên ra dibêje:

- Ezê zêreke bidim te, tu jî kincên xwe bide min.

Şivan qebûl dike û cilên xwe dide Herdemcanê. Herdemcan cilê mêran li xwe dike. Dîsa ji şivan ra dibêje:

- Ezê zêreke bidim te û tu jî bizinekê bide min. Êrê bizinê ji min ra goştê wê ji te ra.

Şivan vê jî qebûl dike. Bizinê ser jê dikin û êrê wê didin Herdemcanê. Herdemcan diçe li ser çemekê wê êrê dişû paqij dike û pora girê dide û wê êrê dide li ser serê xwe û dibe keçel.

Herdemcan diçe li mala bavê xwe. Jê dipirsin, dibêjin:

- Tu kî yî çî dixwazî? Herdemcan jî dibêje:
- Ez feqîrekî, bêkesekî, keçelekî me. Heger hûn qebûl bikin ez ê biçim li berê qazê we. Ji Herdemcanê ra dibêjin:
- Tu çiqas pere dixwazî? Herdemcan dibêje:
- Ez pere filan naxwazim, tenê sibe û êvar xwarin bidin min û zikê min têr bikin bes e.

Ew jîqebûl dikan û Herdemcan rojekê du roj sê roj diçe li ber qazan û dema dibe êvar tê di nav kurtanên keran da ji xwe ra radizê. Roj bi vî awayî derbas dibin rojekê xulam ji bo jina padîşahê qehwe çêdikin. Herdemcan jî dibêje ez ê îro qehwe çêkim, qehwa ez çêdikim zaf xweş e filan, ew jî dibêjin bila. Herdemcan qehwe çêdike û ji jina padîşahê ra diben. Dema jina padîşahê qehwê vedixwe dibêje:

- Bêhna destê Herdemcana min ji vê qehwê tê. Xulam jî dibêjin:
- Keçelo vê qehwê çêkirye.

Çend roj derbas dibin, xanim rojê ji Herdemcanê dibêje:

- Keçelo êdî di nava kulavan da ranezê, were di odekê mala me da razê.

Keçelo jî tê û di odên padîşahê da radizê. Wexta ku Herdemcanê kuştine heya wê rojê jina padîşahê ehd kirye ku neçe di dîwanê da rûnene.

Bi qasî meheke li ser wê bûyerê derbas dibe û kurê paşê dibêje ez ê biçim jin û zarokên xwe bînim. Kurê paşê siwarê hespa xwe dibe, xurceke zêr jî dide li ser hespê ligel wan her du xulamên xwe dikeve rê. Kurê paşê ligel xulamên xwe diçin li dîwana padîşahê. Ew roj mela jî di wê dîwanê da ye. Dema Herdemcan seh dike ku kurê paşê hatiye dibêje ev roj roja min e. Keçelo jî diçe dîwanê û kilaman, çîrokan dibêje û mêvanan dide kenandin. Xulam jî diçin li ba xanimê û dibêjin tu jî here dîwanê, keçelo zaf tiştên xweş dibêje. Israr dikan û xanim jî diçe dîwanê.

Keçelo li ber deriyê rûdinê û ji padîşahê ra dibêje:

- Padîşahê min! Ez ê ji we ra çîrokeke bêjim lê emê pêşi miqaweke bikin. Heya çîroka min neqede tu kes ji vê odê dernekeve. Dê celad jî li ber derî bisekine. Tu kes dê neçe li ser destavekê jî.

Padîşah jî qebûl dike û keçelo dest bi çîroka xwe dike. Serî û heya binî jiyana xwe tiştên ku hatine serê wê, kirinên mela, alîkariya xulaman, dîtina xwe ya ji aliyê kurê paşê ve, serjêkirina zarokên xwe, keçelobûna xwe... Hemû lib û lib qise dike. Dema behsa mela dike mela dibêje:

- Divê biçim li seraveke, lê padîşah nahêle û dibêje:
- Heya çîroka keçelo neqede tu kes ji wê odê dernakeve.

Keçelo dewam dike. Padîşah ji keçelo ra dibêje were nêzikê min ez te baş seh nakim. Keçelo nêzikê padîşahê dibe û dewam dike. Dema behsa xulaman dike ku serê zarokên wê jê kiribûn xulam dibêjin:

- Destûr bidin emê biçin lê padîşah destûr nade.

Xulam dizanin ku behsa wan dike. Keçelo dîsa dewm dike û dibêje jinik diçe li ba şivan, bizineke jê distîne û rûviyê bizinê dide li ser serê xwe û dibe keçel. Wê demê rûviya li ser serê xwe radike û dibêje ew keçik ez im. Ez Herdemcan im. Her tişt eşkere dibe.

Radibin hespekê tî dihêlin yeke din jî birçî. Av didanin alîyekî giya didanin alîyekî. Pê mela jî yek bi hespa tî ve girê didin pêya din bi hespa birçî ve girê didin. Wan hespan berdidin. Hespekê diçe aliyê avê ve ya din diçe aliyê giyayê ve û mela dibe du tîş.

Kurê paşê dibêje ezê xulamên xwe bi şûra xwe qet û qet bikim û goştê wan bidim seyan. Çawa wan her du zarokên min ser jê kirine û wê zilmê ji jina min ra kirine. Kurê paşê jî xulamên xwe qet û qet dike û goştê wan dide seyan.

Liwê ji nû ve heft roj û heft şev dawet dikin.

Xwedê mirazê wan liwê bike ya me jî liha.

Meqbûle Taşyürek

70 salî

5 sal çûye dibistanê

Ji diya xwe

Bermalî

Kelhok

Çîroka Hespa Xweliyê

Wextekî jinek û heft kurên wê hebûn. Jinikê kurên xwe mezin kirye û ji bo xebatê şandiye gundekî dûr. Piştî salan keçikekê jinikê jî çêbûye. Ew keçik mezin bûye û rojeke ji diya xwe pirs kirye û gotiye:

- Dayê, zaroka te ez tenê me, qet xwişk û birayên min tune? Li vê malê ji xeynî min çimakes tune? Diya wê jî ji keça xwe ra gotiye:

- Keça min, heft birayên te hene û ev çend sal in ji bo xebatê çûne gundeke dûr û qet venegerane. Lewma te birayên xwe nedîtiye. Keçik jî meraq dike û dibêje diya xwe:

- Ez dixwazim biçim li ba birayên xwe.

Ji bo çûyîna li ba birayên xwe keçik israr dike û diya wê jî dibêje:

- Ew çax ez ê ji bo te hespeke ji xweliyê çêbikim lê bi ti awayî divê tu ji hespê ra nebêjî “bisekine”. Heger tu ji hespêre bibêjî “bisekine” dê ew hesp vergere xweliyê û tu nikarî biçî li ba birayên xwe.

Keçik guhdariyê diya xwe dike û diya wê jê ra hespeke ji xweliyê çêdike û keçik siwar dibe diçe ji bo dîtina birayên xwe. Keçik di rê da rastî li morikeke tê û dibêje hespa xwe:

- Bisekine!

Dema keçik dibêje bisekine, hesp disekine ji bo keçik wê morikê bistîni. Di wê demê da hesp vedigere xweliyê û gotina diya wê tê bîra keçikê û keçik naçar vedigere mala xwe. Keçik ji diya xwe ra dibêje:

- Dayê, min gotina te ji bîr kir û ji hespê ra got bisekine û hesp jî dîsa bû xwelî.

Diya wê dîsa ji bo keçika xwe hespeke ji xweliyê çêdike û şîretan li keça xwe dike ku çî dibe bila bibe dîsa jî dê ew ji hespê ra nebeje “bisekine”. Keçik dîsa li ser hespa xwe siwar dibe, dikeve rê û digihêje mala birayên xwe. Keçik lê dinihêre ku tu kes li mal tune. Keçik jî radibe dibêje birayên min ji bo xebatê çûne, dê ew teqez êvarê bizivirin, ez ê ji bo wan xwarin amade bikim heya ew bèn. Keçik tamaşê derve dike, liwê tifikê dibîne û di nav tifikê da jî piçek pizot heye. Keçik jî dibêje ji bo xwarin çêkirinê hêj zû ye pêşî ez ê mala birayên xwe paqij bikim paşê ji bo wan xwarin bipêjînim. Di nav mala birayên wê da pisîkeke heye û edetekê wê pisîkê jî ev e ku heger kesek li ba wê tiştêkî bixwe û nede wê hêrs dibe û diçe agira di nav tivikê da vedimirîne. Keçik jî nizani û dema malê paqij dike şekirekê li erdê dibîne û diavêje devê xwe. Pisîk jî dibîne ku keçik tiştêkî dixwe û nade wê ew jî hêrs dibe û diçe agira di nav tivikê da vedimirîne. Keçik jî haja wê ji tu tiştê tune û mala birayên xwe paqij dike. Dema paqijkirina wê diqede dibêje wexta xwarinçêkirinê ye û diçe li ba tifikê dibîne ku tifik vemirîye, qet agir nemaye tê da. Li derdora xwe dinihêre keçik û dibîne ku li ser

çiyayekî dûr dûman dixûyê. Keçik dibêje ez ê biçim wê derê û piçek agir bînim ji bo tifika xwe.

Keçik ji bo agirê ber bi dûmanê ve diçe dibîne ku li ser wê çiyayî keçikek li ber tifikê sekiniye. Li ser agirê sîtileke mezin heye û agir jî xweş digirtê. Keçika li ber agirê jê ra dibêje:

- Tu çima hatî li van deran, diya min pîrhevtar e, insanan dixwe, ev sîtil hemû goştê insanan e, niha razayî ye diya min, heger rabe dê bêhna te seh bike û te bigre bikuje.

Keçika li ber agirê bi lez merika¹⁴⁴ keçikê tijî pizot dike û sabûnek û şehek jî dide keçikê û jê ra dibeje:

- Dê qederek şûn da diya min rabe, bêhna te seh bike, bikeve pê te, dema diya min nêzikê te bibe vê şehê bavêje dê ev şeh bibe çiyayeke, daristaneke û derkeve pêşiya diya min. Heta diya min wê çiyayê, daristanê xilas bike û nêzikê te bibe ew çax jî vê sabûnê bavêje, dê ev sabûn jî bibe çamûr, kûr û dê diya min jî bikeve nava tê da. Heya diya min xwe ji wê kurê xilas bike tu yê bigehijî mala xwe.

Keçik jî agira xwe digre, şeh û sabûnê jî bixwe ra dibe. Dema keçik piçek rê diçe dibîne ku pîrhevtar li piştê wê ve ye. Keçik pêşî şehê diavêje erdê û ew şeh dibe çiya û daristan, dikeve navbera wan. Keçik direve û li piştê xwe dinihêre ku pîrhevtar nêzikê wê bûye vê carê jî sabûnê diavêje erdê. Ew sabûn jî dibe kur dikeve navbera keçik û pîrhevokê. Keçik bi vî awayî xwe digihijîne mala birayên xwe. Pîrhevok jî pê keçikê ve tê û ji keçikê ra dibêje:

- Keça min, deriyê veke ji min ra.

Keçik ditirse û deriyê venake. Ji keçikê ra dibêje tiliya xwe ya piçûk li ber deriyê dirêj bike, ez piçek ji xûna te bimêjim wekî din ez ji liha naçim û ez ê liha bisekinim heya birayên te bîn ezê wan jî bixwim.

Keçik ji tirsê xwe tiliya xwe ya piçûk li ber derî dirêj dike û pîrhevok tiliya keçikê dimêje û dimêje xwîn tê da hanê. Paşê hişê keçikê diçe û keçik dirêjê erdê dibe. Pîrhevok jî vedigere diçe. Qasek şun da birayên keçikê tîn mala xwe, deriyê vedikin û dibînin ku keçikeke li nava mala wanli erdê dirêj kirî ye. Keçikê nas nakin, şerbet çêdikin didin keçikê paşê hişê keçikê tê li serê wê. Ji keçikê dipirsin û dibêjin:

¹⁴⁴ Mer: bêr, bêrik, merbêr

- Tu kî yî, ji kû ve hatî mala me, çi hate serê te? Keçik jî dibêje:
- Ez xwişka we me û tiştên ku hatiye serê wê lib û lib ji birayên xwe ra dibeje.

Birayên keçikê radibin diçin wê pîrhevokê dikûjin û vedişêrin paşê xwişka xwe ra dibêjin:

- Dê li ser vê qebrê giya hêşîn bibe, wê giyayê neyne û nepêje ji bo me. Ji ber ku ew pîrhevok heywan bû heger em giyaya li ser qebra wê bixwin em ê jî bibin heywan.

Keçik jî dibêje tamam. Saleke li ser derbas dibe, dibe bihar giyayeke li ser qebra pîrhevokê hêşîn dibe û keçik wê giyayê dibîne dibêje tiştê nabe, ez ê bi vê giyayê ji birayên xwe ra xwarin çêbikim. Keçik bi wê giyayê xwarin çêdike û birayên wê jî dixwin. Piştî xwarinê her heft birayên wê jî dibin berxik. Keçik zaf poşman dibe. Birayên xwe her roj dibe li ser çiyayê, wan diçêrîne û her tim ji bo wan digirî. Rojêke dîsa birayên xwe dibe, diçêrîne û ji bo wan digirî wê demê dibîne ku camêrekî kal ber bi wê ve tê. Camêr jê dipirse, dibêje:

- Keça min, tu çima digirî? Keçik jî dibêje:
- Ev her heft berxik birayên min bûn û meseleya ku hatiye serê wan ji camêrê ra dibêje.

Ew camêr jî hz. Xizir e û ji keçikê ra dibêje:

- Xem neke keça min, ezê birayên te dîsa bikim insan.

Hz. Xizir bi şepika di destê xwe da şepîkek li piştê her yekî dide û ew berxik dibin insan.

Ew liwê gihane mirazê xwe, tu jî liha...

Ayşe AYDEMİR

60 salî ye

2 sal çûye dibistanê

Ji mezinên gundê

Xanimtiya malê

Çûk

Çîroka Kalikê Têş

Hebû tunebû jin û mêrekî hebû. Ew jin û mêr xwediyê sê keçan bûn. Rojêke bavê keçan ji wan ra dibêje:

- Ez ê sibe biçim bajêr. Hûn çî dixwazin ji min ra bêjin. Ez ê sibe ji we ra xwestinên we bînim.

Keç pir kêfxweş dibin û her yekî ji wan tiştêkî dixwaze. Yek ji wan laçik dixwaze, yek neynik ya din jî şeh. Bavê wan roja din diçe bajêr, karên xwe diqedîne û dikeve rêya vegeînê. Dema rêya mêrikê nîvî dibe mêrik dibêje ez ê li wir bêhna xwe bidim û disekine. Dema mêrik barê xwe didane û lê dinihêre dibîne ku xwestinên du keçên xwe sitandiye lê ya yekê ji bîr kirye. Mêrik zaf xemgîn dibe û dibêje:

- Têêşş. Min daxwaza keça xwe ji bîr kir. Mêrik çawa dibêje “Têş” kalikekî tê li ba mêrikê. Kalik ji mêrikê ra dibêje:
- Te çima gazî li min kir?
- Min gazî li te nekiryê. Ez te nas nakim ji xwe. Tu kî yî?
- Navê min “Têş” e. Te aniha gazî li min kir. Ka bêje te çima got têş. Heya tu nebêjî ez te bernadim.
- Min xwestinên du keçên xwe sitandiye lê min ya yekî ji bîr kirye. Lewma min got têş.
- Heger wisa be tu dê wê keça xwe ya ku te daxwaza wê ji bîr kirye bidî min. Ez ê roja çarşemê bêm mala we. Xêlê min jî seyêkê, pisîkekê û qijîkekê ye. Ez ê li pêşiya wan bibim. Pey min ve se, pey seyê ve pisîk, pey pisîkê ve qijîk. Emê bi vî avayî bêm mala we. Ez ê bêm, keça te hingirim û bibem.

Mêrik çî dîke nake nikare xwe jê xilas bike û dibêje baş e. Mêrik diçe mala xwe lê pir xemgîn e, pir meraq dîke. Jina wî pê dihesê ku tiştêkî heye. Ji mêrê xwe ra dibêje:

- Xêr e, tu çima ewqas xemgîn î. Tu hatî heya niha devê te venabe û me dengê te seh nekiryê. Tiştêkî xirab hate serê te?
- Xwezî bihataya serê min lê nehataya serê keça min.
- Çî bûye ji keça te ra? Keçên te hemû li mal in, baş in. Tiştêkî nehatiye serê wan. Ma te xewn dît?

Mêrik jî dibêje, hal û meseleya min wiha... Lib û lib ji jina xwe ra dibêje. Dibêje, dê Kalikê Têş roja çarşemê bê û keça me bibe. Diya keçîkê şîn, girîn didane, xwe li erdê dide dibêje ez keça xwe nadim. Dibe çarşem dibînin ku Kalikê Têş tê. Se pey kalikê ve, pisîk pey seyê ve, qijîk pey pisîkê ve. Kalik tê bi zorî keçîkê dihingire û dibe. Dê û xwişkên keçîkê ewqas digirîn, keçîk ewqas digirî naxwaze biçe lê feyde nake û Kalikê Têş keçîkê dibe.

Kalikê Têş keçikê dibe mala xwe û çil miftehan dide keçikê. Dibêje ev çil mifteh miftehên deriyên tijî zêr û ava zêrê ne. Heger tu destê xwe bixî di nava ava zêrê da dê destê te jî hemû bibe zêr. Ez ê biçim sûkê. Ha ji te ra çiçekê insanan. Vê bixwe heta ku ez bêm. Heger tu bixwî ez ji te ra tiştêkî nakim lê heger tu nexwî ez ê te wek van cesedan ser jê bikim û te jî biavêjim li ba wan. Kalikê Têş deriya odekê vedike û keçik dibîne çil cesedên serjêkirî liwê ne. Keçik zaf ditirse.

Dema kalikê Têş diçe sûkê keçik radibe wê çiçika insanan diavêje çaviya tenûrê. Dema kalik dizivire û tê ji keçikê dipirse:

- Te xwar?
- Erê, min xwar.
- Ez gazî li wê çiçikê bikim?
- Erê.

Kalik ji çiçikê ra dibêje:

- Waaa çiçika insanan.
- Heft kul û heft mirin...
- Tu li kû yî?
- Ez li çaviya tenûrê me û min sirr bir.

Kalika Têş radibe serê keçikê jê dike û diavêje li ba wan cesedan. Paşê radibe diçe li mala mêrikê û ji wan ra dibêje:

- Keça we nexweş bû û mirî. Dê hûn keçeke din bidin min.

Kalikê Têş wan iqna dike, keçek jî ji wan distîne û diçe. Heman tişt tîn serê wê keçikê jî û Kalikê Têş dîsa diçe mala mêrikê û keçika piçûk jî bi zorî ji wan distîne û diçe. Keça piçûk xwe aqil dike û dibêje ezê hîn bibim gelo xwişkên min çawa mirîn. Dema keçik li odeyan dinêre dibîne ku laşê herdu xwişkê wê liwê ne, hatine serjêkirin.

Kalikê Têş çiçika insanan dide keçika piçûk jî. Keçika piçûk wê çiçikê dide pisîkê û pişik wê çiçikê dixwe. Dema dibe êvar Kalikê Têş vedigere malê û ji keçikê pirs dike:

- Te xwar?
- Belê min xwar. Kalikê Têş ji çiçikê dipirse:
- Waaa çiçika insanan.
- Haa.
- Tu li kû yî?

- Ez di nava rûvîyê kel da me û behicîm.

Kalikê Têş jê bawer dike ku keçikê çîçika insanen xwariye. Keçik sebir dike û roj pê ve diçin. Keçik rojekê radibe hemû pora xwe dibire û eyar¹⁴⁵ okekê têxe serê xwe, xwe dike keçel. Desteke cilên mêran li xwe dike û ji mal direve diçe. Diçe diçe ji mala Kalikê Têş dûr dikeve û diçe gundekî din. Liwê jê dipirsin:

- Tu kî yî? Çi dikî li van deran? Keçik jî dibêje:
- Ez yekê bêkes im, ji bo şivantiyê hatime liha. Kes min nake şivanê xwe? Malbatekê dibêje:
- Ji me ra şivanekî hewce ye. Ji xwe tenê yek kurê me heye û ew jî encax karên mala me diqedîne.

Keçik dibe şivanê mala wan. Her roj pezên wan dibe çiyê û tîne. Ji ber ku şiklê mêran da ye tu kes nizane ew keç e. Her roj nîvro kurê malê xwarina şivên dibe û bi vî avayî roj derbas dibin.

Rojekê havîn e û hêj wext maye ku kurê malê xwarina şivên bîne, keçik cilên xwe derdixîne û xwe dixê avê. Dibêje heya kurê malê xwarina min bîne ez ê serê xwe bişûm û ji avê derkevim, cilên xwe li xwe bikim. Keçik çawa xwe dixê avê kurik jî xwarina wê tîne. Dema kurik tê li ba avê dibîne ku keçekê zaf sipehî di nav avê da ye. Kurik jê dipirse:

- Tu lihayî lê şivanê me liha nîn e. Şivan li kû ye? Tu kî yî, ji kû yî? Keçik wiha dibe û tîne lê nikare kurê malê iqna bike. Dawiyê dibêje:
- Ez çî ji te û ji Xwedê xef bikim. Şivanê we ez im. Were ez ê ji te ra meseleya xwe bêjim. Kalikê Têş herdu xwişkên min bir û kûşt. Paşê hat min ji bavê min xwest û bir mala xwe. Min liwê dît ku herdu xwişkên min ser jê kirye û ez tirsîyam jê revîm hatim gundê we.

Kurik şaş dimîne, nizane ka dê çî bêje. Paşê li keçikê dizivire û dibêje:

- Bila! Min te bê cil di nav vê avê da dîtiye, êdî tu namûsa min î. Ez ê bi te ra bizewicim. Ez êdî nahêlim tu ti derê ve biçî.

Kurik keçikê dihingire dibe mala xwe û ji dê û bavê ra dibêje:

- Min keçikekê aniye. Ez ê pê ra bizewicim. Şivanê me jî çûye. Ji xwe ra şivanekî din bibînin.

¹⁴⁵ Eyar: post, çerm, pîst

Malbata kurikê qebûl dikin ji ber ku tenê yek kurê wan heye ji gotina kurê xwe ra dibêjin erê û ew keçika spehî dibe bûka wan. Çend meh ser da derbas dibe û bûka wan avis dibe.

Kalikê Têş dema tê malê dibîne ku keçik reviyê, çûye. Kalikê Têş dikeve pê keçikê, li her derê keçikê digere. Rojekê bûk, xesû û xwezûr li mal rûdinin û ew çax keçik jî avis e. Keçik dibîne ku Kalikê Têş ji dûr ve tê. Keçik digirî û dibêje:

- Nehêlin ew mêrik bê mala me. Xesû û xwezûrê wê dibêjin:
- Keça min. Tu çima wiha dikî? Mêrik kal e, guneh e. Mêvan e. Bila bê mala me.
- Naa, ew mêvan nîn e. Kalê mirovxwar e. Dê me bixwe. Lê bûk ji wan ra nabêje ew Kalikê Têş e û wî nas dike.

Kalikê Têş tê mala wan heya êvarê disekine. Dema dibe êvar dibêje:

- Ez ê biçim lê bila gopala min li wir bimîne. Bûk, ji xesû û xwezûrê xwere dibêje:
- Gopalê wê sihr e û dê şevê ji Kalikê Têş ra derî veke. Bila liha nesekine. Bûk çi bêje jî jê bawer nakin û gopal dimîne li mala wan. Bûk ji mal derdikeve û diçe li ba pîrekê û jê ra dibêje:
- Kalikê Têş hatiye mala me, gopala xwe hiştiye li mal û çûye. Ez jê ditirsim. Dê şevê gupala wî jê ra derî veke û dê serê me hemûyan jê bike. Pîrê dibêje:
- Keça min, ez ê şîretekê li te bikim û hûn ê jê bifilîtin. Lê divê tu sozekê bidî min.
- Çi soz e?
- Dema zaroka te ji ra bû tu yê zaroka xwe bînî û bidî min. Heger tu qebûl bikî ez ê şîreke li te bikim.
- Baş e. Soza min li ber soza Xwedê be. Tu hema rêyekê bide nîşanê min û em ji Kalikê Têş bifilitin, dema zaroka min bî ezê zaroka xwe bidim te.
- Keça min, here li mala xwe ve û xwe xef bike. Dema bû şev dê ew bê û ji gopalê xwe ra bêje derî veke. Dê gulapa wî jê ra derî veke. Dê Kalikê Têş pêşî morika xewê bixe nav guhê xesû û xwezûrê te. Paşê dê biçê derê malê agirekê girtîne û sîtileke tijî av bide li ser wî agirî. Dê wê avê bikelijîne û we jî biavêje di nav wê ava kelijandî da.
- Ez çi bikim?

- Tu jî here binê cêra xwe bişkîne û binê sîtila xwe qûl bike. Dê ew sîtila qûlkirî bide li ser agirê, cêra şikestî bibe avê. Her çiqas cêrê bibe avê dema vegere bê, dê ava di cêrê da xilas bibe. Heger avê bixe di sîtilê da dê av ji sîtilê vala be û sîtil tijî nabe. Tu jî here li ser devê kara dexl xwe xef bike. Dema ew çû avê tu here morika xewê ji guhê xesû û xwezûrê xwe derxîne. Ew çax dê ew hişyar bibin û ji wan ra bêje Kalikê Têş hatiye. Dê ew êdî ji te bawer bikin.

Bûk diçe mala xwe, binê cêrê dişkîne, binê sîtilê qûl dike û diçe li ser kara dexl xwe xef dike. Dibe şev Kalikê Têş tê û ji gopala xwe ra dibêje derî veke. Gopala wî derî vedike û Kalikê Têş morika xewê dixê guhê xesû û xwezûrê. Cêrê dihingire û dibe ku av bîne. Ji wextê razanê heya sibê nikare sîtila xwe tijî bike. Bûk jî tê morika xewê ji guhê xesû û xwezûrê xwe derdixîne. Ji wan ra dibêje:

- Rabin û lê binêrin. Ew gopala Kalikê Têş e û jê ra derî vekir. Kalikê Têş hat û morika xewê avêt guhê we û niha jî çûye bi cêrê av dikêşe ku bikelijîne û me di nav wê avê da bikuje. Min ji we ra gotibû lê we ji min bawer nekir. Lê min binê cêrê şikand ku nekare avê tijî bike.

Xesû û xwezûr radibin û dibînin ku gotinên bûka wan rast e. Bi hev ra Kalikê Têş dikujînin. Çend hefte paşê zaroka bûkê jê ra dibe. Bûk gorekê dixê pêyekê zaroka xwe peyekê zarokê dihêle bê gore. Morikan dixê destekî zaroka xwe destekî wê dihêle vala. Cilên paqij û sipehî lê dike û diçe li ba pîrê. Ji pîrê ra dibêje:

- Min soz dabû te û min zaroka xwe anî ji te ra. Bi saya te em ji destê Kalikê Têş filitîn û nemirîn.

Pîrê ji zarokê ra şah dibe, pê dileyîze û dibêje:

- *Tete¹⁴⁶ morî yek bê morî*

Pepe¹⁴⁷ gore yek bê gore

Ka dapîr kur e te bistîne

Pîrê zarokê maç dike û dîsa dide diya wê. Ji diya wê ra dibêje:

- Keça min. Te soza xwe nexwar û bi cih anî. Ha ji te ra zaroka te û ji xwe ra bibe.

Ew liwê gihane mirazê xwe, em jî liha gihane heqê xwe.

Ayşe Aydemir

¹⁴⁶ Tet: dest, lep

¹⁴⁷ Pep: pî, ling

60 salî

2 sal çûye dibistanê

Ji mezinên gundê

Xanimtiya malê

Çûk

Çîroka Mîrza Miheme û Qîza Qarqarê Çînê

Hebû tunebû padîşahê û sê kurê wî hebû. Navê kurên padîşahê Ehmed, Mihemed, Mîrza Miheme bûne. Çavê padîşahê kor bûye. Zarokên padîşahê diçin li ba remîldaran ku remildar dermanekê bidin û çavê bavê wan vebe. Remîldar jî dibêjin:

- Divê hûn biçin tasa qîza qarqarê Çînê bînin û ava tê da dê çavê bavê we veke. Wekî din bi tu awayî çavê bavê we venabe.

Birayê mezin Ehmed tifeka xwe dihingire û di rêyekê da diçe. Birayê navîn Mihemed jî tifeka xwe dihingire û di rêyekê da diçe. Biraya piçûk ji ber ku piçûk e û tifeka wî tune ew jî darekê dihingire û dikeve rê.

Mîrza Miheme pir diçe hindik diçe rastê yekî tê. Ew kes ji Mirza Miheme dipirse:

- Ya tîfal! Tu ji kû tê, diçî li kû? Ev der daristan e, tu hatî welatekî xerîb.
- Çavê bavê min kor bûye. Ez hatime dermanê çavê bavê xwe.
- Heger wisa be dema tu çûyî dê pîreke mirovxwar derkeve li ser rêya te. Çiçikên wê ewqas mezin in ku çiçika rastê avêtiye li ser milê çep, çiçika çepê avêtiye li ser milê rast. Xwe di nav mala wê da xef bike. Dema ew hate mala xwe, bi xefî çiçika rastê ya ku li ser milê çepê ye bimêje. Dema te ji çiçika wê şîr mêjand êdî tu dibî zarokê wê û ew te naxwe. Dê ew rêyekê bêje ji te ra. Heger ew nebe tu kes nikare alîkarî bide te.

Mirza Miheme dibêje baş e û dikeve rê. Diçe li mala pîra mirovxwar û xwe vedişêre. Pîrê tê û li bermala xwe dimale. Mîrza Miheme ji piştta wê ve tê û çiçika wê ya li ser milê çepê dimêje. Pîrê dibêje:

- Tu ins î cîn î kî yî? Çiçika min berde vere li ber çavê min. Ez soz didim ku têkilê te nabim. Çi mirazê te hebe heger ji destê min bê ez ê pêk bînim. Te ji şîrê min vexwar êdî ez diya te me û tu jî zarokê min î.

- Çavê bavê min kor bûye. Ez li pê dermanê çavê bavê xwe ve hatime. Ji min ra gotin, here tasa qîza qarqarê Çînê bîne, ji wê tasê av bixe li ser çavên bavê xwe û dê çavên wî vebin. Em sê bira ne. Her yek ji me ji aliyekî ve çûye û ez jî vê aliyê ve hatim.
- Kurê min, here dê çemeke avê derkeve pêşiya te. Dema tu ketî di nav wê avê da ew av wekî kêrê û şûrê tûj e, lê tu bêje çiqas aveke nerm e, xweş e, spehî ye, paqij e. Ew çax dê ew av ji bo te bibe aveke nerm û zîrar nade te. Bi ser da qemçeke ji wê avê bixe di nav singê xwe da. Bi vî avayî dê ew av li te nerm bibe û tu dabor bî biçî. Dema tu ji avê derbas bî dê zeviyêke dar û dirîkan derkeve pêşiya te. Here û destê xwe bide wan dirîkan û bêje çiqas dirîkên sipehî ne, paqij in, nerm in mîna pembûyê. Bi ser da piçek ji wan dirîkan jî bêxe di nav singê xwe da. Dê ew ji bo te bibe wek pembû. Ji wir jî derbas be tu yê mala qîza qarqarê bibînî. Li ber deriyê malê aliyêke gur girê dane aliyêke jî mih. Giya danîne li ber gurê goşt danîne li ber mihê. Tu giyaya pêşiya gurê bide pêşiya mihê, goştê pêşiya mihê bide pêşiya gurê. Ew çax ew ajal têkilê te nabin û tu jî ji deriyê derbas bibe û here. Dema tu ketiyê hundir heft derî girtiye heft derî vekirî. Wan heft deriyên girtî veke, deriyên vekirî jî bigre. Dema tu ji wê derê jî derbas bî keça qarqarê Çînê li ser cihê xwe razayî ye, li ber serê wê sewîlekê¹⁴⁸ heye, sêvek sor li ser sewîlê ye û tas jî liwê ye. Heger tu bikarî wê tasê bînî zaf baş e.

Mîrza Miheme gotinên pîrê lib û lib cih tîne û dawîya dawî diçe li ba qîza qarqarê Çînê. Liwê ji sewîlê av vedixwe, gezekê dide sêvê, rûyê qîza qarqarê Çînê jî maç dike û tasê digire û ji wê derê derdikeve. Dema Mîrza Miheme rûyê wê maç dike, qîza qarqarê Çînê bixwe dihese û radibe li neynikê dinihêre ku şûna maça Mirza Miheme xuya dike. Keça qarqarê Çînê şaş dimîne dibêje ew kîjan benîadem e ku heya mala min hat û rûyê min maç kir. Heya niha tu kesî nekarî vê yekê bike. Qîza qarqarê Çînê dixwaze ku hîn be û emir dike:

- Deriyê girtî bigir, deriyê girtî bigir!
- Kul û kurreder e. Ez ê çî bigrim. Va heft sal e te min girtibû û venekirbû. Wî min vekir û çû.
- Deriyê vekirî bigir. Deriyê vekirî bigir!

¹⁴⁸ Sewîl: cêr, cer

- Kul û kurreder e. Ez çi bigrim. Va heft sal e te min vekiribû û nedigirt. Wî min girt û çû.
- Mihê bigir, mihê bigir!
- Kul û kurreder e. Ez ê çi bigrim. Va mehekê ye te goşt daniye beriya min, giya daniye beriya gurê. Wî giya danî beriya min û çû.
- Gurê bigir, gurê bigir!
- Kul û kurreder e. Ez ê çi bigrim. Va mehekê ye te giya daniye beriya min, goşt daniye beriya mihê. Wî goşt danî beriya min û çû.
- Zeviya dirikan bigir, zeviya dirikan bigir!
- Kul û kurreder e. Ez ê çi bigrim. Va 70 sal e ez li wir im. Tu her tim dibêjî wekî şûran î wekî kêran î, tûj î. Wî gote min tu wekî pembû yî û hinek ji min vekir û xist di nav singê xwe da.
- Avê bigir, avê bigir!
- Kul û kurreder e. Ez ê çi bigrim. Ew ji nava min derbas bû û got çiqas aveke xweş e, paqij e. Kulmeke ji ava min xist di nava singê xwe da û çû.
- Pîrê bigir, pîrê bigir!
- Kul û kurreder e. Ez ê çi bigrim. Şîrê min xwariye û bûye zarokê min. Ez ê çawa îxanetî lê bikim.

Mîrza Miheme ji hemû tengasiyan difilite û diçe li ba pîrê. Ji ber ku Mîrza Miheme şîrê pîrê vexwaribû pîrê êdî wek diya wî bû. Pîrê zaf xem dike û jê ra dibêje:

- Kurê min, tu hatî cihekî pir dûr, ev der daristan e, va mehekê ye tu di rêyan da yî. Tû dê çawa biçî warê bavê xwe.

Pîrê difikire û paşê ji Mîrza Miheme ra dibêje:

- Kurê min here filan cihê li wir darekê heye. Li ser wê darê hêlîna teyra Sîmurg heye. Teyra Sîmurg her sal çûçikên xwe derdixîne lê mareke ziha muselet bûye û her sal wan çûçikan dixwe. Lewma teyra Sîmurg maye bê weled. Ha ji te ra vê şûrê û beranê jî ligel xwe bibe. Bi şûrê wê marê bikuşîne. Heger tu marê bikuşînî dê teyra Sîmurg te bibe warê bavê te. Dema teyra Sîmurg birçî bû goştê beranê parçe parçe bike û bide wê.

Mîrza Miheme diçe li bin darê xwe xef dike û dema mara ziha diçe ku çûçikan bixwe Mîrza Miheme wê marê bi şûra pîrê dabû parçe parçe dike û dikuje. Mîrza Miheme li binê wê darê disekinê û dimîne li benda teyra Sîmurgê. Dema teyra Sîmurg

tê dibîne ku di bin darê kesekî heye. Teyra Sîmurg hêrs dibe, qêrin dike û dizane ku ew kesê çûçikên wê dixwe ew e. Teyra Sîmurg hewl dide ku Mîrza Miheme bikuje çûçikên wê qêr dikin û ji diya xwe ra dibêjin:

- Wî me ji mara ziha xilas kir. Heger ew nebûya dê mara ziha me bixwariya.

Ew çax teyra Sîmurg diçe li ba Mîrza Miheme û jê ra dibêje:

- Te zarokên min parast, êdî tu çi dixwazî bixwaze ji min. Wê marê va heft sal e hemû zarokên min xwariye. Tu çi mirazê ji dinyayê bixwazî ez ê pêk bînim ji bo te.
- Tenê yek tişt dixwazim ku tu min bibî mala bavê min.
- Dibe lê divê tu beraneke bikî parçe parçe û ligel xwe bînî. Dema min serê xwe fetiland li aliyê rastê ve tu yê parçekê bavêjî devê min, dema min serê xwe fetiland li aliyê çepê ve tu yê parçekê jî bavêjî devê min. Heya rêya me biqede em ê bi vî avayî biçin. Dê ew goşt qewet bide min û ez ê te li ser pišta xwe bibim.

Mîrza Miheme dibêje erê û dikevin rê. Pir diçin hindik diçin rêya wan hindik dimîne lê goştê beranê xilas dibe. Cara dawî ku teyra Sîmurg serê xwe dizivirîne Mîrza Miheme ji ranê xwe parçekê vedike û diavêje devê teyra Sîmurg. Teyra Sîmurg pê dihesse ku ew goşteke cuda ye, goştê benîademan e, wê goştê naxwe û di bin zimanê xwe da vedişêre. Tê nêzikê mala bavê Mîrza Miheme, Mîrza Miheme ji ser pišta teyra Sîmurg tê xwarê û dema rê ve diçe dikulîne. Teyra Sîmurg dibêje:

- Mîrza Miheme, çima dema tu rê ve diçî dikulî? Mîrza Miheme pêşî rastiye nabêje û dibêje tiştek tune. Lê teyra Sîmurg israr dike û ew çax Mîrza Miheme jî:
- Dema goştê beranê xilas bû min parçekê ji ranê xwe vekir û avêt li nav devê te. Pê min diêşi lewma wiha rê ve diçim, dibêje. Teyra Sîmurg jî ji Mîrza Miheme ra dibêje:
- Min texmîn kir ku ew gošta te ye. Min wê goştê nexwar.

Teyra Sîmurg wê parçeya goştê ji devê xwe derdixîne û didane li ser ranê Mîrza Miheme. Piçek tûka devê xwe jî dixwe li ser wê goştê û ranê wî sax dibe û dibe wekî berî.

Mîrza Miheme diçe li ba bavê xwe û bi ava tasa qîza qarqarê Çînê çavê padîşahê vedibe û êdî padîşah dibîne. Pêşiya Mîrza Miheme birayên wî jî hin tasan tînin lê ew tas çavên padîşahê sax nakin, xirabtir dikin.

Qîza qarqarê Çîne biryar dide ku bikeve rê û hîn bibe gelo kî wê maç kirye. Qîza qarqarê Çînê kerwanan amade dike û dikeve pê Mîrza Miheme. Dawiya dawî tê gundê Mîrza Miheme. Çend roj şun da seh dikin ku karwanekê hatiye gundê wan, konê xwe danîne li gund û bi hezaran jî siwar hatine. Dema diçin ji wê karwanê pirs dikin gelo ji bo çi hatine, ew jî dibêjin yekî tasa qîza qarqarê Çîne birye û em jî dixwanin wî kesî bibînin ji ber ku dê qîza qarqarê Çînê ligel wî bizewice. Çend kes çûn û gotin me tasê birye lê ji wan bawer nekirin. Ya dawî Mîrza Miheme darê xwe digire û diçe li ba wê karwanê û dibêje:

- Ez im! Min tasa qîza qarqarê Çînê birye.
- Te bi çi awayî birye?

Mîrza Miheme lib û lib ji qîza qarqarê Çîne ra dibêje. Ew jî jê bawer dike û bi Mîrza Miheme ra zewacê qebûl dike. Li wê gundê heft şev heft roj dawet didanin, şahî dikin.

Ew liwê ghiştin mirazê xwe, em liha...

Meqbûle Taşyürek

70 salî

Pênç sal çûye dibistanê

Ji meta xwe guhdar kiriye

Xanimtiya malê

Kelhok

Çîroka Mîrza Miheme û Şêx Sînem

Wextekî padîşahê hebûye û ew padîşah jî xweyî sê kuran bûye. Rojekî wan kuran ji bavên xwe xwestine ku bavê wan daweta wan bike. Bavê wan jî ji wan ra gotiye: “Baş e kurên min. Herin tîrkevan¹⁴⁹ a xwe biavêjin. Tîrkevanên we biçe li ba mala kî ez ê keça wê malê ji bo we bixwazim.”

Kurên padîşahê çûne li serî milekî û tîrkevanên xwe avêtine. Tîrkevana yekî çûye li banê qazî, ya yekî çûye li banê miftî ya din jî çûye li ser qalka piştî kûselê. Padîşahê keça qazî û miftî ji kurên xwe ra xwestiye û aniye lê ya din maye di cihê xwe da. Piştî çend rojan Mîrza Miheme dikeve pê tîrkevana xwe û wê kûselê dibe mala xwe û didane li ser kulekê. Roja din Mirza Miheme ji malê dedirkeve û dema dibe êvar

¹⁴⁹ Tîrkevan: dar, çûv

vedigere mala xwe. Dema diçe mala xwe, dibîne ku xwarina wî pêjandî, bermala wî miştî, nanê wî amade, cilên wî şuştî ye... Mîrza Miheme şaş dimîne û dibêje ecêp kê tê mala min paqij dike, xwarina min amade dike filan û bêvan... Rewşa malê çend rojan bi vî awayî didome. Rojekê Mîrza Miheme biryar dide û wextê çûyîne xwe li piştta derî xef dike. Dibîne ku keçekê ji qalka kûselê derdikeve û mala wî paqij dike, xwarina wî çêdike û berê xwe dide kulekê ku biçe nava qalka kûselê. Ew çax Mîrza Miheme li piştta wê ji keziyê wê digre û jê dipirse:

- Tu kî yî? Ew jî dibêje:
- Ez Şêx Sînem im. Dema ku te tîrkevana xwe avêt û tîrkevan ket li ser piştta kûselê ew çax ez jî bûm nesîbê te û navê diya min jî Şêx Zade ye. Mîrza Miheme jî dibêje:
- Baş e.

Mîrza Miheme pir kêfxweş dibe.

Demekî dirêj Mîrza Miheme naçe li ba bavê xwe. Padîşah jî meraq dike û dibêje wezîrê xwe:

- Çima Mîrza Miheme êdî nayê li ba min, here hînî bibe û were ji min ra bibêje.

Wezîr jî diçe mala Mîrza Miheme û dibîne ku Mîrza Miheme û keçekê li ba hev rûniştine; lê keç ewqas spehî ye ku hişê wezîr diçe û wext ber wextê hişê wî nayê serê wî. Padîşah dinêre ku wezîr venagere vê carê jî çend xulamên xwe dişîne ji bo kurê xwe. Dema xulamên padîşahê dizivirin dibêjin Mîrza Miheme li mal e û jineke ewqas spehî li ba wî rûniştiye ku hişê wezîr çûye û liwê maye. Vê carê jî padîşah meraq dike û diçe ku Mîrza Miheme û jina li ba wî bibîne. Dema padîşah digehe liwê û wan dibîne hişê wî jî diçe ji spehîtiya jinikê.

Padîşah hêcetan digre û dibêje kurê xwe:

- Ez ê 2 cereban bidim te. Heger tu van cereban pêk neynî ez ê serê te jê bikim. Cereba yekem, tu yê sicadeyek ji min ra bînî. Dê ew sicade wisa be ku ez pêçim û bêxim di nav devê xwe da û alîyeke devê min tijî nebe; lê dema tu bînî û rast bikî li vê bermalê çiqas milete me hebe têra wan bike ku li ser wê nimêj bikin û aliyekê sicadê jî li ber dîwarê ve rabe. Heger tu wê sicadê neynî ez ê serê te jê bikim.

Mîrza Miheme pir xemgîn dibe û diçe li ba jina xwe û ji jina xwe ra dibêje:

- Xanim, padîşah ji min sicadeyek xwestiye. Lê ew sicade divê ewqas piçûk be ku dema meriv pêçe û bixe di nav devê xwe da aliyeke devê wî tijî neke û divê ewqas mezin be ku dema li bermalê hate rast kirin hemû millet bikarin li ser wê nimêj bikin û aliyeke sicadê jî li ber dîwarê ve rabe. Heger wê sicadê ji bavê xwe ra nebim dê serê min jê bike.

Sînem ji mêrê xwe ra dibêje:

- Ev sicadeya ku padîşah xwestiye dîtina wê zaf hêsan e. Here wê cihê ku te min dîtibû. 2 daran li wê derê bide û dara sisêyan bêje “Ya Şêx Zade, Şêx Sînem sicadeya xwe ya piçûk dixwaze û hingire bîne.

Mîrza Miheme jî diçe û heman tiştan dike û Şêx Zade sicadeya Sînemê dide wî. Ev jî tîne li ba bavê xwe û rast dike li nav malê û çiqas milletên wan leşkerên wan hebe nimêj dikin hêj jî cihê vala dimîne li ser seccadê û aliyekê seccadê jî li dîwarê odê ve radibe.

Padîşah vê carê cerebeya diduyan dibêje kurê xwe:

- “Tu yê biçî ûşûyeke¹⁵⁰ tirî bînî. Ez û leşkerên xwe em hemû bi hev ra wê tiriye bixwin lê ew tirî dîsa jî xilas nebe.

Mîrza Miheme dîsa xemgîn dibe, tê li ba jina xwe û daxwaziya padîşahê ji jina xwe ra dibêje. Sînem ji mêrê xwe ra:

- Xem neke, here ew ciha ku te min dîtibû. Li wê derê du car dara xwe li erdê bide cara sisêyan bêje “Yaa Şêx Zade, Şêx Sînem ûşûyeke tirî dixwaze.” Dê diya min ûşûyeke tirî bide te û wê hingire were, dibêje.

Mîrza Miheme heman tiştê dike û ûşûya tirî hindigire tîne li ba Sînemê û bi hev ra ji wê tiriye dixwin paşê Mîrza Miheme wê tiriye dibe li ba padîşahê. Padîşah û leşkerên wî ji wê ûşûya tirî dixwin lê tirî dîsa jî xilas nabe. Ev cerebe jî pêk tê. Lê padîşah dîsa cerebeyek din dibêje kurê xwe:

- Tu yê biçî yekî bejna wî yek bost rihê wî du bost bînî û ew jî wek bilbilê çengil ji min ra biaxive. Heger tu neynî ez ê serê te jê bikim.

Mîrza Miheme dîsa xem dike û diçe li ba jina xwe û xwestina bavê xwe jê ra dibêje. Jina wî ji Mîrza Miheme ra dibêje:

¹⁵⁰ Ûşû: gûşî

- Here heman cihê, du daran li erdê bide û di dara sisêyan da bêje “Ya Şêx Zade, Şêx Sînemê birayê xwe yê piçûk xwestiye.” Dê diya min birayê min ê piçûk bide te û wî hingire were.

Mirza Miheme jî çawa jina wî gotî wisa dike û birayê wî î piçûk hindigire û tîne. Mîrza Miheme wî dibe dîwana padîşahê û ew jî xeber dide xeber dide û padîşah nikare wî. Ji padîşahê ra dibêje:

- *Here padîşah*

Bilbilê çengil

Dila mefling

Dibejim te

Heta navtenga xwe bibe kevir

Heta navtenga xwe padîşah û leşker dibin kevir. Disa xeber dide û dibêje:

- *Bilbilê çengil*

Dila mefling

Dibejim te

Winda be bibe kevir

Padîşah, leşker hemu bi hev ra dibin kevir.

Kıymet Yılgin

52 salî

Xwenda nîn e

Ji bapîrê xwe guhdar kiriye

Bermalî

Dûrya Merwanan

Çîroka Nîsko

Rehmet li dê û bavê guhdaran ji xeynê fesat û şeytanan. Hebû tunebû jinikekê bêweled hebû. Rojekê mêrikekê kal diçe li mala jinikê. Kalik ji jinikê ra dibêje:

- Xwişka min, tu zarok li van deran xuya nakin. Zarokên te tune?
- Na welleh tu zarokên min tune.
- Ka tu ji min ra qemçekê nîskan bîne, ez ê pif bikim li wan nîskan û dê ew nîsk ji te ra bibin zarok însela.

Jinik pir şah dibe, diçe qemçeke tijî nîsk tîne û dide kalê. Kalê hin diayan dixwîne, pif dike nîskan û nîskan direjîne di nav malê da. Hemû nîsk dibin zarok. Her zarokê tiştêkî din digot. Yekî got ez birçî me, yekî got ez tî me, yekî got kincên min li min bike, yekî got kincên min qirêj in... Jinik şaş dimîne û hêrs dibe; dibêje:

- Ev çi ne, ez nikarim ligel van hemûyan mijûl bim, van zarokan min gêj kirin.

Jinik bi kûnişkê wan zarokan dimale û diavêje di nav tenûrê da. Jinik paşê poşman dibe û dibêje:

- Xwezî min yekî bihiştiya, dê niha xwarina bavê xwe birya zeviyê. Dema jinik wisa dibêje yekî dengê diya xwe seh dike dibêje:

- Dayê, heger tu min nekujî ez dikarim xwarina bavê xwe bibim.

- Nîsko li çewiya tenûrê xwe xef kirbû û jinik jê ra pir şah bû. Jinik ji Nîsko ra dibêje:

- Naa kurê min, ez te nakujim were xwarina bavê xwe bibe zeviyê.

Nîsko xwarina bavê xwe dihingire û dibe. Bavê wî ji Nîsko ra dibêje:

- Kurê min, ji gayan dûr bisekine ku rêx nekin li ser serê te.

Nîsko dileyîze li derdora gayan diçe û tê. Pê Nîsko dikeve di nav rêxê da û Nîsko digirî. Bavê Nîsko jê ra dibêje:

- Kurê min, here li ba kehniyê¹⁵¹ dest û pê xwe bişû paşê were. Dema tu çûy li ser kehniyê serê xwe raneke û temaşê li jor neke.

Nîsko diçe li ba kehniyê dest û pê xwe dişû. Paşê gotina bavê wî tê bîra wî û mereq dike serê xwe radike, li jor dinêre. Dibîne ku dareke mezin û tijî hêjîr. Nîsko diçe li ser dara hêjîrê û dixwe. Paşê pîrhevokekê¹⁵² jî tê li ser dara hêjîrê. Pîrhevok ji Nîsko ra dibêje:

- Kurê min kurê miiin! Hişkilokan bixwe nermokan bide dapîra xwe, diranên min tune.

- Dapîrê hêj negihane, hişk in.

- Kurê min, ka tu were li ser vê çika jêr, hemû gihane zer bûne.

Nîsko tê dara jêr, pîrhevok wî digire û dixwe di nav tûrika xwe da. Pîrhevok devê tûrikê girê dide û diçe. Bi qasekî diçin pîrhevok dixwaze ku biçe li ser destavekê tûrika xwe dide li erdê û diçe cihekî dûr. Nîsko ji tûrikê derdikeve, tijî keviran dixwe di nav tûrikê da û dizivire, diçe li ser dara hêjîrê. Pîrhevok dema dizivire tûrika xwe pişt dike û

¹⁵¹ Kehnî: kanî

¹⁵² Pîrhevok: Pîrhebok

diçe mala xwe. Dema diçe mal devê tûrikê vedike dibîne ku tu Nîsko tê da tune, hemû kevir in. Pîrhevok dibêje hebe tunebe Nîsko dîsa çûye li ser dara hêjîrê. Pîrhevok jî dizivire û diçe li ba dara hêjîrê, dibîne ku Nîsko li ser darê ye. Ji Nîsko ra dinêje:

- Kurê min kurê miiin! Hişkilokan bixwe nermokan bide dapîra xwe, diranên min tune.
- Dapîîr hêj negahane, yên gihayî pê ve tune.
- Kurê min ka li vê çikê binêre çiqas yên gihayî pê ve hene, çiqas zer in, sipehî ne.

Pîrhevok dîsa Nîsko dixapîne, Nîsko tê li ser wê çiqê, pîrhevok wî digire û dixê di nav tûrika xwe da. Devê tûrika xwe girê dide û rê dikeve. Heya nêzikê mala pîrhevokê diçin liwê dîsa pîrhevok diçe li ser destavekî. Pîrhevok dibêje tu tişt nabe, êdî rê nas nake û naçe. Dema pîrhevok diçe li ser destavê. Nîsko jî tûrikê derdikeve û dizivire diçe li ser dara hêjîrê. Pîrhevok dizivire û tûrika xwe pişt diçe mala xwe. Li malê devê tûrikê vedike dibîne ku Nîsko di nav tûrikê da nîn e. Tûrik tijî dirî ne. Nîsko tûrikê tijî dirî kirye û çûye. Pîrhevok dîsa tê li ba dara hêjîrê, dibîne ku Nîsko li ser darê ye. Ji Nîsko ra dibêje:

- Kurê min kurê miiin! Hişkilokan bixwe nermokan bide dapîra xwe, diranên min tune.
- Dapîîr tu dîsa hatî û bûyî belayê serê min. Ez dibêjim hêj negihane tu dibêji nermokan bide min.
- Kurê min ka li vê çiqê binêre çiqas nerm in, zer in, hemû gihane.

Pîrhevok dîsa Nîsko dixapîne. Dema Nîsko tê li ser çika jêr Nîsko digire û dixê di nava tûrika xwe da. Pîrhevok devê tûrikê baş girê dide û rê dikeve. Pîrhevok dibêje vê carê heya ez neçim malê ez li tu derê nasekinim. Pîrhevok heya malê li tu derê nasekine. Dema tèn li ber deriyê pîrhevok tûrikê dide liwê û diçe seravekê. Pîrhevok jî keça xwe ra dibêje:

- Keça min devê tûrikê veneke heya ez bêm.

Keça pîrhevokê mereq dike û piştî çuyina diya xwe devê tûrikê vedike. Keçik dema Nîsko dibîne dilê wê dikeve Nîsko. Ji nîsko ra dibêje:

- Dê diya min tê bikuje û bixwe lê heger tu guhdariyê min bikî ez ê te ji diya xwe xilas bikim.
- Çawa?

- Diya min tenûrê girtandiyê, dê te biavêje di nav tendûrê da û bixwe. Lê heger tu bi min ra bizewicî ez ê te xilas bikim.

Nîsko qebûl dike û keça pîrê ji Nîsko ra dibêje:

- Tu here li ber kêranan xwe xef bike. Dema diya min hat û pîrsa te kir ez ê bêjim Nîsko çûye li ber kêranan. Dê diya min bêje em ê çawa bikin? Ez ê bêjim tayekê kêranan ve girê bide û here li ser tayê, dê tu Nîsko bigirî. Dema diya min çû li ser tayê tu bi dasê tayê bibire û dê diya min bikeve di nav tenûrê da.

Nîsko diçe li ber kêranan xwe xef dike. Diya keçikê tê û dibêje:

- Keça min, Nîsko li kû ye?
- Nîsko çûye li ber kêranan û xwe xef kirye.
- Em ê çawa bikin keça min?
- Tayekê bi kêranan ve girê bide û here li serê tayê. Wisa tu dikarî Nîsko bînî.

Pîrhevok diçe tayekê tînê û kêranan ve girê dide. Dema pîrhevok diçe li ser tayê Nîsko bi dasê tayê dibire û pîrhevok dikeve di nav tenûrê da, dimire.

Nîsko û keça pîrhevokê digehin mirazê xwe. Hemû zêr û perên pîrhevokê jî diben û dewlemend dibin.

Çîroka me çû diyaran, rehmet li dê û bavê guhdaran.

Emîne Kaplan

64 salî

Xwenda nîn e.

Ji jinxala xwe hînî bûye

Bermalî

Kelhok

Çîroka Şengê Pengê Alîçengê

Hebû tunebû bizinekê û sê heb kehrikên wê hebûn. Bizin navê kehrikên xwe didane Şengê, Pengê, Alîçengê. Bizin her roj kehrikên xwe di nav şikeftê da dihêle û diçe çêrînê. Hêj ku ji şikeftê dernakeve ji kehrîkan ra dibêje deriyê ji tu kesî ra venekin, heke hûn deriyê vekin dê gur we bixwe. Wexta ez vegeyriyam ez ê ji we ra bêjim:

Şengê Pengê Alîçengê

Diya we çûye zozanan

Tijî şîr e li ber gihanan

Giya li ber sitr û diranan

Derî ji dadê ra vekin dadê hat

Piştî van gotinên min deriyê vekin. Bizin her roj van şîretan li kehrikên xwe dike û keviroke dide li ber şikeftê û diçe çêrînê.

Çend hefte bi vî awayî dewam dike lê rojekê gur pê dihesê. Bi xefî guhdariyê wan dike û gotinên bizinê jî ji ber dike. Rojekê piştî çûyîna bizinê gur tê li ber deriyê kehrikan û ji wan ra dibêje:

Şengê Pengê Alîçengê

Diya we çûye zozanan

Tijî şîr e li ber gihanan

Giya li ber sitr û diranan

Derî ji dadê ra vekin dadê hat

Gur dixwaze ku dengê xwe bişibîne dengê bizinê lê nikare. Ji kehrikan du heb dibêjin ev diya me ye, em ê jê ra derî vekin lê yek jiwan dibêje na, dengê wê namîne dengê diya me. Tê bîra wan ku diya wan şîret li wan kiribû û gotibû kê bê li ber deriyê we jê ra bêjin simkê te çawa ye. Li simkê wê binêrin dê hûn bizanin ka ez im an na. Kehrik ji gurê ra dibêjin ka em li simkên te binêrin. Dema simkê gurê dibînin dizanin ku ew diya wan nîn e û jê ra derî venakin. Gur ji wir vedigere û diçe sûkê li wan deran digere û li cihekî simkê bizinan dibîne û dibe. Roja din dîsa diçe li ber deriyê kehrikan û ji wan ra heman gotinan dibêje. Kehrik jî dixwazin ku simkê wê bibînin. Dema gur simkê di destê xwe da bilind dike û kehrik dibînin dibêjin diya me hat û derî ji gurê ra vedikin. Çawa ew derî vedikin gur yekser wan hersêyan jî dixwe û ji wê derê diçe.

Wextê hatina bizinê tê, dema bizin tê li ber derî şikeftê dibîne ku derî vekiriye û ti zarokên wê liwê tune. Bizin difikire û dibêje ev bibe nebe karê gurê ye û dikeve rê diçe li ser banê mala gurê dike riperip. Gur jî ji riperipê aciz dibe û dibêje:

- *Ew kî ye li ser banê min dike riperip tipetip*

Xwelî serê xwe û heft bavê xwe dike

Jina min hevîr dike

Bûka min nexşan çêdike

Kurê min tûtînê hûr dike

Ez jî qelûnê vedixwim

Bizin bersiv dide:

- *Ez im ez*

Ez xwelî serê te û heft bavê te dikim

Te xwariye Şenga min

Te xwariye Penga min

Te xwariye Aliçenga min

Were gul û cenga min

Bizin û gur şer dikan û dibêjin em ê biçin şerîat. Gur hebana¹⁵³ xwe tijî tiştên xirab dike lê bizin di dîskê da şîr dimeyîne û dike mast ji mela ra diben. Mela dema hebana gurê dibîne dibêje ev hebe tunebe mewîj in. Heger mewîj be ez ê alîgirê gurê bim mewîj ji mastê xweştir e. Dema mela devê hebanê vedike bêhneke xirab jê derdikeve. Ew çax mela hêrs dide û dibêje:

- Herin ji min ra kilbetîn¹⁵⁴ bînin û hemû diranên gurê derdixîne. Mela dîsa dibêje:

- Herin ji min ra kartûkê¹⁵⁵ bînin û pê kartûkê sitrê bizinê tûj dike. Dibêje ji bizin û gurê ra:

- Herin li serê banê şer bikin.

Bizin û gur çûn li ser banê û gurê got:

- Pêşî dora min e.

Gurê kir nekir nekarî ku bizinê gez bike ji ber ku mela diranên wê kêşabû. Paşê dor hate bizinê. Bizin bi strihên xwe yên tûj zikê gurê çiritand. Şengê, Pengê, Aliçengê ji zikê gurê derketin. Bizin dema kehrikên xwe dibîne ji wan dipirse:

- Hûn çûbûne li kû? Kehrik jî dibêjin:

- Em çûbûn mala xalê xwe, me bi kevçiyên qûtik savar dixwar.

Bizin zarokên xwe dihingire û diçin mala xwe.

Ew liwê digehin mirazê xwe, em liha digehin heqê xwe.

İbrahim Ceylan

83 salî

Xwenda nîn e

Ji bavê xwe guhdar kiriye

¹⁵³ Heban: tûrik

¹⁵⁴ Kilbetîn: aleta diran kêşandinê

¹⁵⁵ Kartûk: katîk

Cotkar
Pûrmê

Çîroka Şengê û Pengê

Hebû tunebû, bizinek û du kehrikên wê hebûn. Rojekî bizin ji kehrikên xwe ra dibêje:

- Ez ê herim derve biçêrim ji bo ku şîr bikeve gihanên min û hûn jî bikaribin têr ji gihanên min bimêjin. Lê heta ku ez vegerim derî ji ti kesî ra venekin. Dema ku ez vegerîm ez ê ji we ra vê stranê bibêjim:

Şenga min, penga min

Diya we çûye zozanan

Xwarîye pelê qizwanan

Şîr ketîye guhanan

Zû kin, lez kin werin danan

Piştî ku min vê stranê got, wê demê hûn ê derî vekin, baş e? Zarok jî dibêjin:

- Baş e dayê! Û bizin diçe çiya jibo çêrînê.

Dema bizin û kehrikan xeber didan gurekî ji bi xefî guhdariya wan dikir. Piştî ku bizin diçe dehlê gur tê li deriyê wan lêdixe. Şengê û Pengê dibêjin:

- Ew kî ye? Gur bersiv dide:
- Ez im ez, ez dîya we me!
- Naa, tu ne diya me yî. Dengê dîya me ne wiha ye. Ji xwe tu strana diya me jî nizanî.

Gur vedigere ji wê derê û diçe mala xwe.

Roja din gur baş guhdariya wan dike. Piştî ku bizin diçe dehlê û çêrînê, gur tê li deriyê wan lêdixe. Şengê û Pengê dibêjin:

- Ew kî ye? Gur dengê xwe zirav dike û dest bi stranê dike:

Şenga min, penga min

Diya we çûye zozanan

Xwarîye pelê qizwanan

Şîr ketîye guhanan

Zû kin, lez kin werin danan

Şengê û Pengê ji dengê gurî bawer dikin ku ew diya wan e. Derî vedikin, oyyy çî bibînin! Gur e! Gur hema yekser wan dixwe û diçe.

Dibe êvar bizin ji çêreyê tê mal lê çî bibîne. Mala wê giş tevî hev bûye. Şengê û Pengê jî tune ne. Bizin digrî û dibêje:

- Şenga min Penga min, hûn li ku ne? Lê tu deng ji derekê nayê. Bizin difikire, dibêje, hebe nebe ev karî gurê ye!

Bizin yekser diçe ser xaniyê gurê û riperip dike. Gur dibêje:

- Ew kî ye li ser xaniyê min riperip dike. Qab û kevçiyên min tijî toz dike, ez gopalan çêdikim, bûka min nexşan çêdike, jina min hevîr dike!

Bizin dibêje:

- *Ez im, bizina bizêrî*
Kê xwarîye Şenga min?
Kê xwarîye Penga min?
Were qal û cenga min”

Gur dibêje:

- *Min xwarîye Şenga te*
Min xwarîye Penga te
Ez tîm qal û cenga te”

Gur û bizin li rasta mala gur dest bi şer dikin. Êrişê hev dikin. Bizin qoçê xwe li zikê gurî dixwe, zikê wî didirîne, Şengê û Pengê ji zikê gurî derdixîne.

Şengê û Pengê diçin li himbêza diya xwe.

Bizin wan maç dike û diçin mala xwe.

Çîroka me çû dîyaran

Rehme li dê û bavê guhdaran.

Emîne Kaplan

64 salî

Xwenda nîn e

Ji jinxala xwe

Bermalî

Kelhoc

Çîroka Zengilo Mengilo

Rojekê bizineke avis hebûye. Bizin nexweş ketiye û xwe daye li ber zinarekê. Liwê du heb kehrikên wê çêbûne. Bizinê navê kehrikên xwe daniye Zengilo û Mengilo. Bizinê her roj Zengilo û Mengilo dixiste di nav şikeftê da, derî li ser wan çêdikir û diçû ji xwe ra diçêriya heta nîvro paşê diziviriya dihat li ba zarokên xwe û şîr dida wan û ji bo çêrînê dîsa diçû dehlê. Rojekê hirç pê wan dihesa û diçe ku wan bixwe. Hirç diçe li ba şikeftê ber deriyên wan kehrikan disekine û dibêje:

- *Zengilo Mengilo*
- Derî veke ji dadê re*
- Dadê çûye zozanan*
- Tijî şîr e gihanan*
- Qeftek giya li ber sitr û diranan*

Mengilo dibêje ev diya me ye ez ê jê ra derî vekim lê Zengilo dibêje na, diya me nîn e em derî venakin. Zengilo xwe di nav kêranan da xef dike, Mengilo jî diçe derî vedike. Çawa derî vedike hirç wî dixwe û diçe. Dibe êvar bizin vedigere û tê şikeftê li ba zarokên xwe. Dema tê li ber deriyê şikeftê dibêje:

- *Zengilo Mengilo*
- Derî veke ji dadê re*
- Dadê çûye zozanan*
- Tijî şîr e gihanan*
- Qeftek giya li ber sitr û diranan*

Zengilo dengê diya xwe nas dike û jê ra derî vedike. Diya wî li derdora xwe dinêhêre lê Mengilo nabîne. Pirsê Mengilo dike. Zengilo jî dibêje:

- Hirçê wî bir û çû.

Bizin derdikeve derve dikeve pê hirçê. Liha û liwê pê hirçê digere û dawiya dawî hirçê dibîne. Bizin dema hirçê dibîne dibêje:

- Te çima Mengiloka min xwariye? Hirç jî dibêje:
- Na! Min Mengiloka te nedîtiye û nexwariye.

Ew çax jî Mengilo di nav zikê hirçê da dilepîte û dileyîze. Bizin ji hirçê ra dibêje:

- Were ez û tu em ê qirên bikin.

Bizin sitireke zikê hirçê dide û zikê hirçê dibe du tîş û Mengilo ji zikê hirçê derdikeve. Bizin ji Mengilo dipirse:

- Kurê min tu çûbûy li kû? Mengilo jî dibêje:
- Ez çûbûme mala dapîra xwe, min liwê tirşî dixwar.

Emine Kaplan

64 salî

Xwenda nîn e

Ji jinxala xwe hînî bûye

Bermalî

Kelhok

Çîroka Xelîl Beg û Tîlî Eyaşan

Hebû tune bû, Xeloyekî mirtip hebû. Ev Xeloyê mirtip xulamê Xelîl Beg bû. Xelo salek, du sal, sê sal xulamtiya Xelîl beg dike, cihê heywanan paqij dike, hespan timar dike, dikene, dileyîze, çîrokan dibêje û hwd. Di demsala payîzê da rojekê Xelo diçe di nav hêla bavê xwe da. Liwê jê ra dibêjin:

- Kuro Xelo, tu xulamê Xelîl Beg i, çima Xelîl Beg heta niha te hêştiye bê dawet? Xelo jî dibêje:
- Çi bikim, şerm dikim bibêjim daweta min bikin. Ew jî ji Xelo ra dibêjin:
- Dema tu çûy li ba Xelîl Beg nekene, bê keyf bisekine dê ew ji te bipirse “Çima tu xemgîn xuya dikî” ew çax jê ra bêje ‘Xelîl Beg, ez çûme di nav hêla bavê xwe da, yê ji min piçûktir hemû zewicîne, jina wan zarokên wan mala wan hene. Ji min ra dibêjin tu xulamê Xelîl Beg î çawa Xelîl Beg heta niha deweta te nekirye.

Xelo jî dibêje baş e û vedigere diçe li ba Xelîl Beg. Roj derbas dibin lê Xelo, nakene, tinazan nake, xwarin naxwe û rewşa wî bala Xelîl Beg dikêşîne û Xelîl Beg jê dipirse:

- Xeloyê mirtip ka were derdê te çi ye? Tu çima bê kêf î?

Xelo jî heman gotinên ku jê ra gotibûn dibêje û dixwaze ku Xelîl Beg deweta wî bike. Xelîl Beg jî dibêje:

- Xeloyê mirtip, tu mirtip î. Ez li xwe nagrim ku ji bo te biçim keçan bixwazim, heger di dilê te da yekê hebe ha ji te ra xurceke zêr, here bi van zêran deweta xwe bike û jina xwe bigire û bîne.

Xeloyê mirtip dibêje baş e, zêran dihingire û bi hespa xwe dikeve rêyan û diçe mala bavê Tîlî Eyşanê. Ji wan ra dibêje:

- Ez Xelîl Beg im. Ez hatime daxwaziya mirofatiyê. Keça we ji xwe ra dixwazim. Ew jî dibêjin:
- Ser çavên xwe, yekî wekî Xelîl Beg hatiye daxwaziya keça me, em çawa keça xwe nedin û bêjin na.

Dibe şev bavê Tîlî Eyşanê diçe mala xwe û ji jina xwe ra dibêje:

- Xanim, Xelîl Beg ji bo mirofatiyê hatiye û keça me dixwaze. Tu çi dibêjî? Dêya Tîlî Eyşan jî dibêje:
- Ew Xelîl Beg nîn e, Xelîl Beg ji bo keçxwestinê nayê mala me. Xulamekî wî heye û navê wî jî Xelo ye. Ew e hatiye keça me dixwaze. Mêrik dibêje:
- Naa, li kincê wî binêre, li îskapînên wî binêre, xurceke zêr jî li ba wî ye. Ew teqez Xelîl Beg e. Jina wî jî dibêje:
- Here û jê ra bibêje, heger heft sal ji me ra şivantî bike em ê keça xwe bidin; heger şivantî neke tu keçê danemêr li ba me tune. Heger Xeloyê mirtip bibe dê qebûl bike şivantiyê, lê heger Xelîl Beg be dê bêje “Ez xwediyê çil xulaman im, ezê çawa şivantiyê ji we ra bikim û dê biçe.

Bavê Tîlî Eyşanê diçe li ba Xeloyê mirtip û jê ra dibêje:

- Dema Tîlî Eyşan ji dêya xwe ra bûye diya wê gotiye ew kesê ku daxwaziya keça min bike divê berî heft sal şivantî û xulamtiya me bike, paşê ez ê keça xwe bidim wî.

Xeloyê mirtip vê xwestinê qebûl dike û dibêje:

- Belê ser çavan, ez ê deh sal şivantî û xulamti ji we ra bikim. Hûn Tîlî Eyşanê bidin min bes e.

Bavê Tîlî Eyşanê dizivire diçe mal û jina xwe ra dibêje:

- Rast e jinik, xebera te ye. Ew Xeloyê mirtip e û daxwaziya me qebul kirye.

Roja din Xeloyê mirtip radibe çova xwe, gupalê xwe dihingire û diçe li ber dewarên mala bavê Tîlî Eyşanê. Saleke, du sal, sê sal... Heft sal şivantî û xulamti ji

wanra dike. Di vê navberê da Xelîl Beg tu xeber di derheqê Xeloyê mirtip da seh nake û dibêje mirtip e, xurca zêran girt û winda bû, çû.

Rojekê xalet û metên Tîlî Eyşanê diaxivin û dibêjin va heft sal e Xelo şivantî û xulamtiya me dike lê em naxwazin Tîlî Eyşanê bidine wê, em ê hecetekî bigrin û Xelo bişînin bila ji van dêran raqete û biçê. Roja din jin bi Xelo ra dikevin şerê dibêjin:

- Te çima pezan dereng anî, hecetan digrin qêr dikin û Xelo jî tê malê sarê hespa xwe dibi û diçe li ba Xelîl Beg.

Xelîl Beg dema Xeloyê mirtip dibîne, dibêje:

- Kuro, Xeloyê mirtip! Va heft sal e tu winda yî. Ka zêrên te, jina te, mala te? Xelo jî:
- Xelîl Beg, min keçeke ji bo te xwestiye, dibêje. Xelîl Beg hêrs dibe û dibêje:
- Tu çima ji bo min daxwaziya keçan dikî? Ji xwe ez zewicandî me, jina min zarokên min hene. Ji bo xwe keçan bixwaze. Xelo jî dibêje:
- Ew çax tu wê keçê li ser navê xwe bixwaze, paşê bide min.

Xelîl Beg difikire ku Xelo yekî guneh e, dikeve pêşi û Xelo jî li paşê diçin. Di rê da Xelo dibêje:

- Xelîl Beg, em kincên xwe biguherin, tu keçê bixwaze paşê dema em vegeriyan gund Tîlî Eyşanê bide min.

Xelîl Beg qebûl dike, kincan diguherînin û diçin ji bo keçxwestinê. Ew çax şeveke Tîlî Eyşan di xewa xwe da dibîne ku Xelîl Beg tê û daxwaziya wê dike, ew jî roja din diçe xwe li piştê rê di nav daran da xef dike. Dema Xelîl Beg û Xeloyê mirtip dibîne xewna wê rast dibe, Tîlî Eyşan Xelîl Begê zehf begem dike, liwê vê kilamê dibêje:

Xelîl Begê min suphan gulê bişewite va di dê ra da

Xelîl Begê min kulus xwehr kirye ser pehnika di rimê da

Xweziya ez ê bîma cotek fişek li qirmê ketma li ber piştê da

Xelîl Beg jî dema vê kilamê seh dike ji Xelo dipirse û dibêje:

- Ev kî ye, behsa min dike di kilamê da.

Xelo ji naxwaze bêje Tîlî Eyşan e, çimkî Xelo dizane ku heger Xelîl Beg Tîlî Eyşanê bibîne dê teqez aşiq be û dê ji xwe ra bixwaze. Lewma Xeloyê mirtip wiha bersiv dide:

- Ew mirtipekê ye, ji bo zêran kilaman dibêje. Cara din jî dema ez ji liha derbas bûm dîsa wiha stranan digot. Ezê niha zêreke bidim wê û dê dengê wê qut bibe.

Piçek li ser da derbas dibe û Tîlî Eyşan dîsa kilama xwe didomîne:

- *Xelîl Begê suphan gulê bişewite dara gez e*
Derê mala bavê min keçik bi hezar û heftsed pez e
Tu here li ser kursiya xwazgîniyan rûne lez bi lez e
Tu min ji bavê min bixwaze
Tu xeberê Xeloyê mirtip neke ji dê û bavan pir geweze

Xelîl Beg ji Xelo ra dibêje:

- Ez ê li vê keçê binêrim, behsa min dike.

Lê Xeloyê mirtip disa hincetan dibîne û nahêle ku Xelîl Beg Tîlî Eyşanê bibîne, dibeje:

- Xelîl Beg, ew yekê keçel e, mirtip e. Li ser rêyan disekine û xelkê dişelîne, zêran dixwaze...

Xelîl Beg jê bawer nake û temaşê keçikê dike. Dema ku keçikê dibîne aqilê wî ji serê wî diçe ji sipehîtiya Tîlî Eyşanê. Tîlî Eyşan dîsa kilama xwe dibêje:

- *Xelîl Begê suphan gulê bişewite wa bihîne*
Tu serê pehniya rima¹⁵⁶ xwe da laçika li ser serê min keçikê bihêlîne
Welleh ez yekê keçel nîn im
Pora li ser serê min keçikê çil û çar kezî ne

Dibe şev Xelîl Beg û Xeloyê mirtip diçin li mala bavê Tîlî Eyşanê û Xelîl Beg Tîlî Eyşanê ji xwe ra dixwaze. Tîlî Eyşanê didin Xelîl Begê.

Beriya heft salan di navbera Xelîl Beg û mamê wî Mehmûd Beg da şereke diqewime û ji hev dienirin. Heft sal bi hev ra xeber nadin. Ji ber ku Xelîl Beg keçê ji Xelo ra naxwaze Xeloyê mirtip hêrs dibe û radibe diçe li mala Mehmûd Begê. Ji Mehmûd Beg ra dibêje:

- Mehmûd Beg, Mehmûd Beg! Xelîl Beg li ser navê te keçeke ji xwe ra xwestiye.

Mehmûd beg zaf aciz dibe û dibêje:

¹⁵⁶ Rim: pêlav, sol

- Ev heft sal e em ji hev enirîne, bi hev ra naaxivin. Çawa Xelîl Beg diçe li ser navê min keçan dixwaze? Xeloyê mirtip jî dibêje:
- Mehmûd Beg were em biçin daweta Xelîl Beg, dema bibe şev em ê jina wî birevînin û bikujin.

Mehmûd Beg jî dibêje temam û ligel çil xulamên xwe dikevin rê û diçin deweta Xelîl Beg. Xelîl Beg dema mamê xwe dibîne pir kêfxweş dibe û dibêje mamê min ligel çil xulamên xwe hatiye deweta min. Dewet heya nîvê şevê devam dike, dikenin dileyîzin. Derengê şevê birayê Xelîl Beg Ehmed Beg ji zava ra dibêje:

- Birayê min, şev bû dereng, tu zavayê teze yî, here ji xwe ra razê ezê dîwana mamê me da bisekinim heya ku xewa mamê bê, paşê em ê bi hev ra razên. Xelîl Beg jî dibêje:
- Na kekê min, tu birayê mezin î, tu here razê îşev ezê di dîwana mamê me da bisekinim, paşê sibe tu heya dereng diwana mamê me da bisekine. Ehmed Beg qebûl dike û diçe ji bo razanê.

Mehmûd Beg çaw dike Xeloyê mirtip û xulamên xwe ku Xelîl Beg rakin ji bo govendê. Haja Xelîl Begê ji tu tiştê tune. Xelîl Beg radibe govendê çerxek du çerx dizivirin di çerxa sisêyan da milê Xelîl Beg bi sitûna çirayê ve bi girê didin. Li her du aliyên Xelîl Beg kêreke û mumeke didanin. Mehmûd Beg dibêje:

- Herin Tîlî Eyşanê bînin, li ber çavê Xelîl Begê maç bikin û paşê ji bo kuştinê wê bibin.

Xeloyê mirtip diçe li ba Tîlî Eyşanê û jê ra dibêje:

- Mêrê te Xelîl Beg gazî li te dike, dibêje bila Tîlî Eyşan bê û diwana mamê me da piçek rûne. Ji ber ku dê mamê me biçe û dixwaze bûkê bibîne.

Tîlî Eyşan difikire û dibêje xwe bixwe çawa Xelîl Beg gazî li min dike, ezê çawa biçim di nav dîwana mêran da rûnim û axir naçe. Xeloyê mirtip jî vedigere li ba Mehmûd Beg û dibêje ku Tîlî Eyşan nehat. Mehmûd Beg vê carî zêreke dide Xeloyê mirtip û dibêje:

- Here vê bide Tîlî Eyşanê û bêje Xelîl Beg û Mehmûd Beg li benda te ne, bila teqez bê.

Tîlî Eyşan bê dil, bi mecbûrî dikeve li pê Xeloyê mirtip û diçe dîwana wan. Dema deriyê wan tê vekirin Tîlî Eyşan dibîne ku milê Xelîl Beg bi sûtûnan ve hatiye

girêdan û li ser her du milên wî jî mum hene, ew mum jî bi bayê dihejin. Li wir Tîlî Eyşan dibêje:

- *Xelîl Begê suphan gulê bişewite wiha bihîne*
Berikê vê sibê bayê pencerê lê dide mumê milê Xelîl Begê min dibe û tîne
Kesekî Xwedanê xêran tune cabeke ji Ehmedê bira ra begêhîne

Xelîl Begê suphan gulê bişewite dûvê pirê
Dar cixara Xelîl Begê minê dar gilyasa ecem girê mirê
Berikê vê sibê palê Xelîl Begê min dane sitûna çirê
Kesekî Xwedanê xêran tune cabeke bide Ehmedê birê

Bejna Xelîl Begê min zirav e dimîne berxa nêran
Hêşin dike merdiwana şewitî aliyê dêran
Êdî piştî Xelîl Begê xwe serê xwe dananim li ser cî û baliyê tu camêran

Xelîl beg jî bersiv dide:

- *Bejna Tîlî Eyşana min zirav e mîna kulîlka ketê*
Ez ê piştî Tîlî Eyşana xwe serê dananim li ser cî û baliyê ti hermetê

Mehmûd Beg ji Xeloyê mirtip ra dibêje:

- Hindik ma ku bibe sibe, heger Ehmed Beg li me bihese dê me hemûyan bişewitîne, em rabin û bi hespên xwe birevin û biçin. Lê tu li ber deriyê hewşê bisekine emê lib û lib hespan ji hewşê derxînin ku deng dernekeve û Ehmed Beg hişyar nebe.

Di vê navberê da Xeloyê mirtip haja xwe namîne û bûk ji destê wî direve û diçe xwe ji banê diavêje li erdê. Heya ew hespên xwe amade dikin ku birevin seh dikin ku mela banga sibê dide. Mehmûd Beg, Xeloyê mirtip û xulam direvin û diçin. Dibe sibe û Ehmed Beg hişyar dibe. Dema ji odê derdikeve diçe cihê dîwanê dibîne ku mumên li ser milê Xelîl Beg yek ji wan vemiriye ya din jî hindik maye û Xelîl Beg miriye. Ehmed Beg derdikeve derve û mela jê dipirse:

- Ehmed Beg, va bûkeke xwe ji serê banê avêtiye erdê û miriye, ka lê binêr jinbiraya te ye an na?

Ehmed Beg dema diçe dibîne ku jinbiraya wî ye, ji mela ra dibêje:

- Mela, tu serê birayê min bişû bila hin jin jî serê jinbirayê min bişûn. Desteke cilê zavabûne bixin li ber birayê min destekî cilên bûkaniyê bixin li ber jinbiraya min, wan bidin li ba hev. Ezê biçim ewda xwe bikim û bêm.

Ehmed Beg şûra xwe dihingire, sarê hespa xwe dibe û bi kurterê diçe û derdikeve pêşiya Mehmûd Beg û xulamên wî. Li pêşi Xeloyê mirtip heye, paşê Mehmûd Beg û paşê jî xulam hene. Ehmed Beg lib û lib serê wan jê dike. Ya dawî Mehmûd Beg dimîne û Ehmed Beg jê ra dibêje:

- Mamo, tu şûna bavê me da bî, tu hatibû daweta birayê min, te çima wiha li me kir?

Ehmed Beg liwê her du destên mamê xwe dibire û wî jî dikuje û vedigere li ba birayê xwe. Liwê bira û jinbiraya xwe dixin di nava gorî da.

Çîroka me çû diyaran, rehmet li dê û bavê guhdaran.

Emine Kaplan

64 salî

Xwendina wê tune

Ji jinxala xwe hînî bûye

Bermalî

Kelhok

Çîroka Marê

Wextekî xwişk û birayekî hebû. Bavê wan çûye li ber rehma Xwedê û tenê diya wan maye. Diya wan deweta kurê xwe dike û bûka wan jî ligel wan dijî. Dema diya wan jî rehmet dibe dimînin xwişk, bira û jinbira. Bûk ji xwe yeke xirab bûye, piştî ku xesûya wê miriye xirabtir bûye û nexwestiye ku keçik bi wan ra bijî. Jinbira her tim bêbextiyan li keçikê dike û di derheqê keçikê da tiştên nebaş ji mêrê xwe ra dibêje ku mêrê wê xwişka xwe bikuje.

Rojeke jinbira mareke piçûk dixê di nav sewîlê da û keçik ji wê avê vedixwe û mar jî diçe di nava zikê keçikê da. Roj bi roj zikê keçikê mezin dibe û jinbira ji mêrê xwe ra dibêje:

- Va xwişka te xwe rezîl kirye, ji yekî avis maye, wê bikuşîne û namûsa me paqij bike.

Destê birayê naçe ku xwişka xwe bikuşîne û bêçare dimîne. Ji jina xwe ra dibêje:

- Jinik destê min naçe ku ez xwişka xwe bikujînim. Tu ji me ra hinek kade çêbike emê wan hingirin û biçin.

Jin jî radibe hinek kadên birûn, xweş û hinek jî bêtam, şor çêdike û ji mêrê xwe ra dibêje:

- Ev kadeyên birûn ji te ra yên din jî ji xwişka te ra.

Xwişk û bira rê dikevin û diçin. Diçin diçin heya ciheke dûr li wir xwişk têhn dibe. Ji birayê xwe ra dibêje:

- Tu liha bisekine ez ê biçim hinek av vexwûm û vegerim.

Dema keçik diçe ji bo avê birayê wê çakêta xwe dide liwê û dizivire diçe mala xwe. Keçik dema diçe li ser kehniyê liwê dibîne ku di nava avê da marekî heye. Mara di nava zikê keçikê da gazî li mara din dike û mara di nav avê da dibêje keçikê:

- Devê xwe veke.

Dema keçik devê xwe vedike, mara di nava zikê keçikê jê derdikeve û zikê keçikê valadibe. Ew çax mara di nav avê da ji keçikê ra dibêje:

- Devê xwe bi vê giyayê sê caran bişû û dê devê te paqij be.

Keçik jî wisa dike, avê vedixwe û vedigere li ba birayê xwe. Keçik dema ji avxwarinê vedigere dibîne ku kes liwê tune. Tenê çakêta birayê xwe dibîne û li xwe dike. Keçik li derdora xwe dinihêre û dibîne ku qûtekê darê liwê heye û keçik diçe nava vê qûtê da xwe xef dike.

Dibe sibe û kurê paşê tê li ba wê darê. Dibîne ku tajiyê wî li derdora wê darê diçe û tê. Kurê paşê dibêje teqez liha tiştêkî heye, dema temaşê di nava darê dike dibîne ku keçekê ewqas spehî, ewqas şirîn liwêye. Wê keçikê dihingire dibe mala xwe û pê ra dizewice. Le belê keçikê sond xwariye ku ligel ti kesî neaxive.

Sal derbas dibin û du heb zarokên wan çêdibe. Xweziya kurê paşê ew e ku tenê yek car seh bike ku jina wê xeber dide. Rojekê jinik piçek mast û dims dide li berê

zarokên xwe ku bixwin, zarok şer dikin li ser xwarinê, jinik jî ji wan ra qîrîn dike û mêrê wê seh dike. Ew çax kurê paşê dizane ku jina wî diaxive. Kurê paşê ji jina xwe dipirse:

- Te çima heya niha xeber nedida? Jinik jî dibêje:
- Min ehd kirbû ku rikê bira û jinbiraya xwe ez xeber nadim û jinik meseleya xwe, tiştên ku hatine serê wê ji mêrê xwe ra dibêje.

Kurê paşê, jina xwe û zarokên xwe li ser hespê siwar dike û diçin mala birayê jinikê. Bira û jinbiraya wê dizanin ku ew miriye ji ber ku ti tişt seh nekirne di derheqê wê da. Diçin mala birayê jinikê, liwê jinbira wê nas nake lê bira xwişka xwe nas dike. Liwê kurê paşê dibêje:

- Wextekî min seh kirbû keçikek hebû, diya wê rehmet bibû, jinbiraya wê jê ra xirab bû, tiştên xirab anîn li ser serê wê, birayê wê xwişka xwe bir cihekî dût û li wir hişt... Hûn nizanin ew kê ye?

Wê demê birayê jinikê digirî û dibêje:

- Ew xwişka min e. Kurê paşê jê dipirse:
- Heger tu niha xwişka xwe bibînî tu yê wê nas bikî an na? Bira jî:
- Ez nas dikim û xwişka min ev e, dibêje û xwişka xwe himbêz dike.

Safiye Akhan

44 salî

Xwenda nîn e

Ji diya xwe guhdar kiriye

Bermalî

Nûh/ Nih

Çîroka Mîrza Miheme

Hebû tunebû, rehmet li dê û bavê hazirguhbaran bû. Wextekî jinekê hebû. Mêrê jinikê rehmet bibû û sê heb kurên jinikê hebûn. Navê wan Miheme, Ehmed û Mîrza Miheme bûye. Ev malbat xweyî dareke sevê bûne lê her sal wextê komkirina sêvân

dibînin ku yek sêv li ser darê nemaye. Her sê bira rojekê diçin li ba diya xwe û ji diya xwe ra dibêjin:

- Dadê, em ê biçin û li ber dara sêvê nobet bigirin gelo ew çî kes e her sal sêvên me kom dibe û dibe? Diya zarokan ji vê fikrê aciz dibe û naxwaze zarokên wê biçin. Dê ditirse ku tiştêkî bê li serê kurên wê, ji wan ra dibêje:
- Kurên min, neçin. Dinya ye, belkî liwê yekî we bikuje. Em nizanin dibe ku karwan sêvên me dixwin. Ji bo sêvekê neçin û xwe nexin di nav talûkê da. Zarokan israr kirin û gotin:
- Naa dadê, em ê biçin. Her yekî ji me dê şevêkê nobet bigire û emê hînî bibin ku kê sêvên me dişelîne her sal.

Bira çûn li ser dara sêvê enzêlekê¹⁵⁷ çêkirin û birayê piçûk got:

- Îşev ezê nobet bigirim. Birayê mezin qebûl nekir:
- Tu birayê piçûk î, çawa di serî da tu yê nobet bigirî? Pêşî ezê bigirim şeva sisêyan paşê dora te ye.

Birayên din qebûl kirin û şeva pêşî birayê mezin li ser dara sêvê nobet girt. Birayê mezin li ser enzêlê sekiniyê, di destê wî da tîrkevana wî, bi vî avayî nobet digire. Dema bû berê sibehê birayê mezin dît ku deşt hemû bû toz û dûman û dêweke heftserî dilezîne. Dema birayê mezin dêwê dibîne ditirse û diçe mala xwe. Ji jina xwe ra dibêje:

- Dêweka heftserî hat, qesta sêvê dikir lê heger min dîtîya dê teqez min jî xwariya. Vê bûyerê ji kesî ra qise neke haa.

Birayê mezin ji kesî ra tiştêkî nabêje û roja din dema diçin dibînin ku nîva sêvan hatiye xwarin. Birayê piçûk ji birayê mezin dipirse:

- Birê min, tu şêvê nobetdar bû, te tu kesî nedît? Birayê mezin:
- Naa birê min. Ez heya sibê liwê mam lê tu kes nehat. Dibe ku sihr dîkin ji sêvan ra û lewma sêv xilas dibin?

¹⁵⁷ Enzêl: enzelok, çardax

Şeva din birayê navîn diçe nobetê. Ew jî li ser enzelê rûdine, di destê wî da tîrkevana wî, disekine. Berê sibehê ra dibîne ku dêwa heftserî ji dûr ve tê û dêw dilezîne. Birayê navîn jî ditirse û diçe mala xwe ku dêw wî nexwe. Ji jina xwe ra dibêje:

- Ji kesî ra nebêje, dêweke heftserî hat ku sêwan bixwe û ez jî jê tirsiyam, hatim. Teqez birayê min Miheme jî dêwê dîtiye û jê revîye. Qise neke, heger gel seh bike dê ser me bikene.

Roja din bû dora birayê piçûk yanî Mîrza Miheme. Mîrza Miheme ji diya xwe ra got:

- Dadê îşev dora min e, ezê biçim nobet bigirim bila serguha¹⁵⁸ te li ser min be. Mîrza Miheme diçe li ba jina xwe, ji jina xwe ra dibêje:
- Xanim, deriyê ji tu kesî ra veneke heya ez vegerim.

Mîrza Miheme diçe li ser enzelê rûdine û heya sibê tu kes nayê. Çavên wî dimîne rê û dibêje, birayên min rast gotine, tu kes nayê. Teqez yekî sihr dike û sêvê me dibe. Berê sibêdibe û Mîrza Miheme dibîne ku toz û dûman di nav deştê da radibe. Mîrza Miheme radibe tîrkevana xwe amade dike ku wî kesî bikuşîne. Dema dêwa heftserî nêzik dibe Mîrza Miheme dibîne ku dêwekê hatiye û li bin dara sêvê sekiniye hewl dide ku rabe serê darê. Mîrza Miheme ji jor ve tîrkevanek berdide dêwê û dêw dikeve li erdê. Dêw ji Mîrza Miheme ra dibêje:

- Mîrza Miheme yeke din jî biavêje.
- Naa! Mala me mala yekderbê ye. Em du derbe li tu kesî nadin.

Şefeq ronî dibe, Mîrza Miheme diçe ji gundiyan ra dibêje:

- Min dêwa heftserî kuşt, werin alîkarî bidin min ku em dêwê veşêrin û bila dêw bêhn nede.

Gundî hatin û hemûyan bi hev ra serê dêwa heftserî jê kirin. Piştî serjêkirina dêwê dîtî ku çil mifteh di nav serê dêwê da ye. Her sê birayan wan miftehan girtin û ketin dewsa dêwê. Çûn çûn nêzikê şikeftê bûn. Deriyê şikeftê vekirin û ketin hindirr. Dema ew ketin hindir deriyê şikeftê bi xwe hat girtin. Birayan kir nekir nekarîn deriyê şikeftê

¹⁵⁸ Serguh: guh û çav lê bûn, lê miqate bûn

vekin. Di nav şikeftê da çil derî hebûye. Deriyekî vekirine dîtine ku hemû laşê insanan, deriyekî vekirine dîtine ku hemû laşê heywanan, deriyekî vekirine dîtine ku mirovên destbizmarkirî, deriyekî vedikin hemû zêr, deriyekî vedikin hemû zîv... Çil mifteh û çil derî... Di her odê da tiştêkî cuda... Birayan gotin, emê çî bikin çî nekin; em li vir man asê. Dinihêrin ku di şikeftê da kulekeke piçûk heye û ji wê derê ronahî tê. Hin tişt miştan didin ser hev, bilind dikin û diçin ser wan tiştan ku ji kulekê derkevin, biçin. Birayê mezin Miheme çû li ser wan tiştan û ji kulekê derket, xwe xilas kir. Birayê navîn Ehmed jî xwe xilas kir. Dema dor hate Mirza Miheme ew tiştên ku dabûn ser hev dikevin û Mîrza Miheme nikare derkeve. Mîrza Miheme dinav şikeftê da dimîne asê.

Liwê Mîrza Miheme eynikekê dibîne. Wê eynikê dide li ber tavê û şewqa tavê li eynikê dikeve. Di nav wê eynikê da Mîrza Miheme dibîne ku hewzeke avê heye û di nav avê da sê heb beran hene, ji Mîrza Miheme ra tê gotin:

- Xwe biavêje li ser wan beranan. Heger tu kevî li ser piştta berana spî tu yê ji vê derê xilas bî û derkevî li ser dinê lê heger tu bikevî li ser piştta berana reş tu yê heft tebeq axa reş da biçî.

Mîrza Miheme dibêje, heyhat! Ev tiştêkî îza e, ezê çî bikim. Mîrza Miheme naçar xwe diavêje li ser beranan û dikeve li ser piştta berana reş. Dema dikeve li ser piştta berana reş heft tebeq dikeve di bin axa reş da. Mîrza Miheme diçe binê dinê, liwê bajarekî cuda heye û dikeve rê. Diçe diçe rastî mala pîrekê tê. Mîrza Miheme deriyê pîrê dide û ji pîrê ra dibêje:

- Pîrê ji min ra deriyê veke. Ez rêwiyekî me. Tu mêvana xweyî dikî?
- Mêvan mêvanên Xwedê ne kurê min.

Pîrê ji Mîrza Miheme ra derî vedike û Mîrza Miheme dikeve di nav mala pîrê da.

Bajarê ku Mîrza Miheme çûye li wî bajarî pirsgirêkeke mezin hebûye. Mareke ziha her hefte diçe xwe dide li ber kaniya avê, nahêle tu kes av bibe û bajar dimîne bê av. Heya insanekê nedin û ziha wê insanê nexwe ew ziha ji wê derê naçe. Xelk bi mecbûrî her hefte yekê didin zihayê ku ji ber ava wan biçe. Ew roja ku Mîrza Miheme çûye dora keça paşê bûye. Mîrza Miheme dema ji pîrê av dixwaze pîrê dibêje hal û mesele wiha, îro jî dora keça paşê ye. Mîrza Miheme ji pîrê şûrekê dixwaze û pîrê ra dibêje:

- Dema wexta birina keça paşê hat ji min ra bêje.

Pîrê dema wexta birina keça paşê tê ji Mîrza Miheme ra dibêje:

- Mîrza Miheme! Va keça paşê diben ku bidin zihayê.

Mîrza Miheme şûrê dihingire û diçe li ber kaniya avê. Liwê bi sedan kes kom bûne û kes kesî nas nake. Mîrza Miheme lingê keça paşê dixwe di nav avê da û derdixîne; dixwaze ku ziha derkeve ji nav avê û ji bo xwarina keçê serê xwe ji avê derxîne. Dema lingê keça paşê dikeve di nav avê da mara ziha serê xwe radike ku keçikê bixwe. Çawa ziha serê xwe derdixîne Mîrza Miheme şûra di destê xwe da stuyê marê dide. Dema xwîn ji stuyê marê tê keça paşê tiliyê xwe li wê xwîna dide û tiliya bixwîn jî li çakêta Mîrza Miheme dide ku winda nebe.

Mîrza Miheme zihayê kuşt, xelk belav bû, Mîrza Miheme jî zivirî çû mala pîrê.

Paşê zaf şah dibe ji ber ku keça wî ji destê zihayê filitiye. Paşê di qesra xwe da dawetek didane û ferman dike dibêje, di vî bajarî da kê hebe dê ew bê daweta min, ezê hînîbibim gelo kê keça min xilas kir ji zihayê. Gelek kesan gotin, min keça te xilas kir filan lê paşê qebûl nekir û got keça min wî kesî nas dike.

Pîrê û Mîrza Miheme naçin dawetê. Xulam lê dinihêrin ku agirê pîrê digirtê û dibêjin teqez mêvanê pîrê heye. Dema xulam diçin li mala pîrê dibînin ku xurtekî qeşeng li mala pîrê ye. Ji Mîrza Miheme ra dibêjin:

- Heval tu kî yî?
- Ez mêvanê pîrê me.
- Paşê gazî li te dike, divê tu jî bê dawetê.
- Çi şuxlê paşê bi min ra heye? Ez rêwiyekî me. Ezê ji van deran biçim.
- Naa, tu mecbûr î. Heger tu israr bikî emê stuyê te jê bikin.

Mîrza Miheme bi mecbûrî ligel wan diçe qesrê. Dema paşê Mîrza Miheme dibîne ji keça xwe dipirse:

- Keça min, ew kesê ku te xilas kir ji zihayê e an?

Keça paşê dema li çakê Mîrza Miheme dinihêre dibîne ku şûna xwîna destê wê liwêye. Keça paşê ji bavê xwe ra dibêje, ev kes bû min xilas kir. Ew çax paşê ji Mîrza Miheme ra dibêje:

- De ka bêje, mirazê te çi ye li vê binê dinê da. Tu çi bixwazî ezê ji bo te çêbikim.
- Ez tenê dixwazim ku hûn min derxînin li ser rûyê dinê, lê kifş e ku ew jî ji destê we nayê.

Mîrza Miheme ji qesrê derdikeve û diçe li mala pîrê. Çend roj li ser vê bûyerê derbas dibe rojekê Mîrza Miheme diçe di nav zeviyekê da û liwê radizê. Dema radibe dibîne ku hêlîna teyrekê li ser darê ye. Dibîne ku marekê xwe daye qurmê darê û diçe ku wan ferxikan bixwe. Mîrza Miheme bi şûra xwe stûyê marê jê dike, goştê marê parçe parçe dike û dide wan ferxikan. Dema teyr ji jor ve tê Mîrza Miheme dibîne û dibêje:

- Ev çend sal e tu ferxikên min dixwî. Ez ê jî te bikujim. Çawa teyr êrişê Mîrza Miheme dike ferxik ew çax ji diya xwe ra dibêjin:
- Mîrza Miheme me ji destê marê xilaskir. Heger ew nebûya dê marê me hemûyan bixwariya. Mîrza Miheme nehêşt.

Teyr li ser Mîrza Miheme disekine, perên xwe vedike û wek sîwanekê jê ra sî çêdike. Teyr ji Mîrza Miheme ra dibêje:

- Mîrza Miheme mirazê te çi be ezê hasil bikim. Te ferxikên min ji destê marê xilas kir û te nehêşt mar wan bixwe.
- Diya min, jina min, mane li ser rûyê dinê. Ez nizanî gelo ew dijîn an mirine. Wan meraq dikim. Va heft sal e ez di binê dinê da me.
- Mîrza Miheme here heft firûn nan, heft meşk av, heft dûvê beranan ji min ra bîne; ezê te bibim li ba malbata te, li ser rûyê dinê.

Mîrza Miheme difikire dibêje ezê çi bikim, tu tiştê min tune. Gotinên paşê tê bîra wî û diçe li ba paşê. Paşê ji Mîrza Miheme ra dibêje:

- Mîrza Miheme bêje te çi divê? Heger tu bixwazî ezê keça xwe bidim te, tu bixwazî ezê te bikim paşê.
- Min wan navê, tenê dixwazim ku tu heft firûn nan, heft meşk av, heft dûvê beranan bidî min.

Paşe dibêje ezê xwestinên te bidim teû tiştên ku Mîrza Miheme dixwaze amade dikin û ji bo wî heya binê dara ku teyr liwêye diben. Teyr wan hemû tiştan pişt dîke û ji Mîrza Miheme ra dibêje:

- Mîrza Miheme dema min berê xwe zivirand firûnek nan, meşkekê av, dûvekî beranan biajêve li nav devê min. Emê bi vîavayî heya welatê te biçin.

Mîrza Miheme dibêje tamam û rê dikevin. Çi wextê teyr berê xwe dizivirîne Mîrza Mihemefirûnek nan, meşkekê av û dûvekê beranan diavêje devê teyrê. Dawiya rê dûvekî beranan ji destê Mîrza Miheme dikeve û Mîrza Miheme şûna dûvê beranê bi şûra xwe ji ranê xwe parçekî vedike û diavêje devê teyrê. Teyr pê dihesê û wê goştê naxwe. Dema diçin li ser rûyê dinê ji hev xatir dixwazin û Mîrza Miheme diçe. Teyr ji rêveçûna Mîrza Miheme dizane ku ew goştê ranê wî ye. Teyr ji devê xwe wê goştê derdixîne u dide li ser ranê Mîrza Miheme û ew goşt pê ve digiri.

Mîrza Miheme ber bi mala xwe ve diçe û digihîşe mala xwe. Dibîne ku fîncana jehriyê di destê jina wî da ye û nahêle tu kes nêzikê wê bibe. Birayên Mîrza Miheme jî ji xwe ra qesran çêkirine û têkilê diya xwe nebîne. Diya wan pîr bûye. Birayên Mîrza Miheme ji jinbiraya xwe ra dibêjin an tu yê mêr bikî an jî emê te mehr bikin. Jinikê jî fîncana jehrê girtiye destê xwe û dibêje kê deriyê oda min veke ezê jehrê bixwim û xwe bikujim.

Mîrza Miheme diçe li ba diya xwe lê diya wî Mîrza Miheme nas nake. Mîrza Miheme bi diya ra diaxive û diya wîji bûka xwe ra dibêje:

- Keça min, derî veke. Mîrza Miheme hatiye.

Jina Mîrza Miheme jê bawer nake û dibêje:

- Bila Mîrza Miheme bê li ber kulekê, ez wî bibînim. Paşê ezê derî jê ra vekim.

Mîrza Miheme diçe li ber kulekê pêşî jina wî Mîrza Miheme nas nake paşê jê bawer dîke.

Ew liwêdigehin mirazê xwe, em jî liha...

Necla Yaraşlı

46 salî

Xwenda nîn e

Ji dapîra xwe Zümre hînî bûye

Xanimtiya malê

Qursinç

Çîroka Senem Xanim û Hiseyn

Wextekî Mendul Axa hebûye. Axayê gundekî bûye û kurekî wî jî hebûye. Qehreman Axa destebirayê Mendul Axa bûye û heft lib kurên wî hebûne. Qehreman Axa jî axayê gundekî bûye.

Kurê Mendul Axa mezin dibe, tê li ber dawetê û bavê wî diçe jê ra Senem Xanimê dixwaze. Mendul Axa ji bo kurê xwe Hiseyn heft şev heft roj dawet didane, şahî dike.

Ji ser daweta Hiseyn û Senem Xanim heft sal derbas dibe lê Hiseyn ji jina xwe ra mêranî nake, nemêr e. Hiseyn ji Senem Xanim ra dibêje:

- Senem Xanim, ji tu kesî ra qise neke!
- Hiseynê min, heger tu qise nekî, gazind ji min nekî ez tu car gazindan ji te nakim.

Ji ser daweta wan heft sal derbas dibe lê haja dê û bavê Hiseyn ji tu tiştî tune. Rojekê zarok marok di nav baxçeya Mendul Axa da dileyizin, Mendul Axa jî diçe li ba zarokan û ligel wan dileyîze. Senem Xanim kêr daran ji mal derdikeve. Ew roj Senem Xanim jî diçe baxçê li ba xwezûrê xwe û li ba zarokan xwezûrê wê ji bûka xwe ra dibêje:

- Senem Xanim, bûka min! Diya van zarokan bi te ra bûne jin. Senem xanim serê xwe qorr dike û dibêje:
- Bavo, gazinda xwe ji min neke, gazinda xwe ji Hiseynê xwe bike.

Hiseyn di berî da ji Senem Xanim ra gotibû, çi rojê tu dê û bavê min ji rewşa me pê bidî hesandin êdî çavên te li min nakeve. Bavê Hiseyn diçe li ba kurê xwe û ji kurê xwe re dibêje:

- Bavo heyran, îsal heft sal e tu ketiyî vê deriyê tengsiyê da te çima ti car qise nekir? Xwedê derd dane lê derman jî dane.
- Bavo kê ji te ra got? Senem Xanim got ne wisa? Baş e bavo, xatirê we...

Hiseyn saza xwe diavêje li ser milê xwe, rê dikeve û diçe. Heft salê Hiseyn li derî û kolanên xelkê da derbas dibe, Senem Xanim jî him mîna kurê malê him mîna keça malê dixebite û li benda Hiseyn dimîne.

Huseyn xwe nade nasîn û ji gundiyan dipirse:

- Wextekî kurê Mendul Axa hebû, navê wî Huseyn bû, ew kur çûbû xurbetiyê. Nizanim jina wî Senem Xanim çû mala bavê xwe an li mala xwezûrê xwe da ye? Gundî jî dibêjin:
- Naa, jina Huseyn li mala xwezûrê xwe rûniştiye, karên wan diqedîne, xwesû-xwezûrên xwe xweyî dike û li tu derê ve neçûye.

Huseyn difikire û paşê biryar dide dibêje, ez ê ji Senem Xanim ra nameyek bişînim û bibêjim “Huseynê te heya niha sax bû lê Huseynê te çûye rehma Xwedê”belkî Senem Xanim piştî van gotinan biçe mala bavê xwe.

Huseyn nameyê dinivîse û dişîne. Name digihêşe destê Mendul Axa û Mendul Axa dibêje:

- Di nameyê da hatiye nivîsandin ku “Huseyn heya niha sax bûye û li ba yekî xebitiye. Lê êdî sax nîn e û rehmet bûye.”

Dê û bavê Huseyn diqehirin, xwe li erdê didin; Senem Xanim ji bo Huseyn digirî... Diya Huseyn ji kerba kurê xwe nexweş dibe û dimire. Bavê wî jî kal bûye, li ser gopalan diçe derve û tê.

Rojekê Qehreman Axa diçe serdana Mendul Axa û jê ra dibêje:

- Mendul Axa va heft sal e Huseyn çûye, me digot belkî rojekê bizivire lê me seh kir ku rehmet bûye. Tenê yek lib kurê te hebû ew jî rehmet bû. Ez ê bûka te ji kurê xwe ra bixwazim, emê daweta wan bikin paşê ez ê kurê xwe û Senem Xanim bînim bila ligel te bijîn. Bila kurê min bibe kurê te.

Mendul Axa naçar qebûl dike. Roja dîn xêl tê ku Senem Xanim bibe.

Rojekê xizir derdikeve pêşiya Hiseyn û ji Hiseyn re dibêje:

- Kurê min! Here Çiyayê Dêrika Mazî, liwê kaniyek heye, xwe bixe di nav wê avê da û dê tu bibî mêr.

Hiseyn gotina xizir bi cih tîne û dibe mêr. Hiseyn dibêje, ezê vegerim û biçim gundê xwe; gelo dê û bavê min mirî ne an sax in, jina min Senem Xanim çûye an na.

Hiseyn rê dikeve ku biçe gundê xwe, xêla Senem Xanim jî rê ketiye kubiçin mala Qehreman Axa. Hiseyn ji dût ve xêlê dawetê dibîne û ji du merivên beriya xêlê pirs dike:

- Gelo ev daweta kê ye?
- Daweta kurê Qehreman Axa ye, Mendul Axa dê Senem Xanimê li ser kurê Qehreman Axa mehr bike paşê kurê Qehreman Axa dê li ser malê Mendul Axa bisekine.
- Here bêje wê xêlê bila Senem Xanim bişeynin li mala Mendul Axa, wekî din ez ê biçim wan hemûyan bikujim.
- Xêr e birayê min, tu çi kes î? Dawa te çi ye? Tu pere dixwazî?
- Nexêr! Herin zû ji Qehreman Axa ra bêjin bila bûka Mendul Axa bibe mala wî.

Hiseyn saza xwe lê dide û Senem Xanim dengê sazê seh dike. Senem Xanim dema dengê sazê seh dike dibêje ew teqez Hiseynê min e û xwe li ser piştê hespê diavêje li erdê. Ji Senem Xanim ra dibêjin:

- Huseynê çi, Hiseynê te mirî ye. Senem Xanim dibêje:
- Naa! Dinya bêje nebêje ew Hiseynê min e, dengê saza Hiseynê ye.

Ew herdu meriv diçin li ba Qehreman Axa û jê ra dibêjin:

- Qehreman Axa, li ser wî çiyayî zilamekî heye, saza xwe lê dide û dibêje “Heger hûn wê bûkê nezivirînin ez ê we hemûyan bikujim.”

Senem Xanim xemla xwe diavêje û xêl ber bi gundê Mendul Axa ve diçe. Hiseyn jî kurterê diçe li ba dê û bavê xwe. Hiseyn diçe li ber deriyê mala xwe dibîne ku bavê wî li ba kehniyê rûniştîye. Hiseyn saza xwe lê dide û dibêje gelo dê bavê min dengê saza min nas bike an? Hiseyn lê dinihêre ku bavekî ketî, kal, ji rewşa xwe ra digirî... Mendul Axa ji Hiseyn ra dibêje:

- Xortê qeç! Tu çi kes î hatiyî li mala min. Mala min xirab bûye, jina min miriye, kurê min miriye, îro Qehreman Axa bûka min biriye. Wê sazê li derê mala min lê nede, cîgera min neşewitîne. Dê te çi ye, bêje û here.
- Bavo! Ez kurê te Hiseyn im, ez hatim ji xurbetiyê, vamin bûka te Senem Xanim zivirand.
- Naa! Tu çi kes î, ji ber çavên min here.
- Bavo, diya min ji te ra negotibû li ser milê Hiseyn nîşanekê heye? Tu çawa min nas nakî?

- Belê diya te gotibû wekî findeqekî nîşanekê li ser milê Hiseyn heye.

Dema Mendûl Axa lê dinihêre dibîne ku nîşanekî li ser milê wî heye. Jê ra dibêje:

- Heger tu Hiseyn bî te çima nameyek şand û got Hiseyn miriye? Û Mendul Axa dewam dike

Mala min xirab bûye wê dê xirab bibe

Hema hema bûka min Senem Xanim bi kurê destebirayê min Qehreman ra wê peya be

Wêyla miriyên heft salan razê êdî ranabe

Ma dora ku tu bêjî ez lawê te Hiseyn im ez hatime

Qîza xelkê li mala mirov bê mêr tamîş¹⁵⁹ nabe

Piştî van gotinan dibînin ku Senem Xanim dizivire û tê. Senem Xanim û Hiseyn digehin hev. Ew liwê digehin mirazê em jî liha...

Emine Kaplan

64 salî

Xwenda nîn e

Kelhok

¹⁵⁹ Tamîş: idarekirin